

Knyazê Îbrahîm

ZİMANÊ KURDÎ



2-5

Almatı-2006

*Em vê k'itebê dîyarî
kulîlkê K'urdistanê -zarokên
k'urd dîkin...*

Knyazê Îbrahîm

ZIMANÊ K'URDÎ

(Zaravê kurmancî)

Bona dersxanê II-V

Ji alîyê Wezîreta Komara Qazaxistanêye xwendin
û ulmda hatye lênihêrandin û t'estîqkirinê.

Neşra yekê

«Sozdik-Slovar»
Almati 2006

ББК 81.2 Кур я 72
М 63

**Қазақстан Республикасы Мәдениет және ақпарат
министрлігінің бағдарламасы бойынша шығарылды**

**Қазақстан Республикасы Білім және ғылым министрлігі
тарапынан ұсынылып мақұлданған**

Мирзоев К.И.

М 63 Zimanê kurdî.-Алматы: издательство “Сөздік-Словарь”, 2006.-168 с.

ISBN 9965-409-94-3

Учебник II-V классов адресован учащимся общеобразовательных школ с курдским языком обучения, а также всем желающим самостоятельно или на базе воскресных школ овладеть курдским языком. При его составлении учитывались национальная стратегия образования Республики Казахстан и Государственная программа развития языков.

Учебник включает все материалы для самостоятельной работы, которые могут быть использованы на дополнительных занятиях и на уроках по внеклассному чтению.

м 4306020300
402-05-06

ББК 81.2 Кур я 72

ISBN 9965-409-94-3

© Мирзоев К.И. 2006
© “Сөздік-Словарь” 2006

*Min ev nivîsî ji bo sahibrewacan,
belkiji bo biçûkên k'urmancan.
Eh'medê Xanî (XVII)*

Pêşgotin

Ziman, e'debîyat û çanda k'urda wek dîroka gelê xwe kevnar û dewle- mende. Ew dur' û cewahirê net'ewa me ji k'ûranîya qurna tên, ji elek û bêjîn- ga sal û zemanaye giranra derbaz bûne, ji zara derbazî zara bûne, gihîştine r'ojen meye îroyîn. Şedetîya vê yekê usa jî bi dehan berhem û nivîsên dîrokzan.r'êwî û filosofê çîhanêye sedsalêd beriya îsada jiyankirî di xebatê xweye granbahada didin.Ew cavkanîye Çînê, Babilîstanê,Yûnanistanê, e'reb, faris û yên R'ojhilatêye mayînin. Hele hê qurnên navînda helbestvan û r'onakbirên k'urdaye navdar E'lîê Herîrî, Meleyê Cizirî, FeqîyêTeyran, Me- leyê Batê, E'h'medê Xanî û gelekêd mayîn derheqa hînbûn û giringîya zi- manê k'urdîda fikrê p'ir qîmet mer'a hiştine. Seydayê mezin Eh'medê Xanî dîroka canda k'urdada ne ku t'enê helbestvan, hozan û filosofekî mezine, ew usa jî zimanzan û mamosteyê nemirîyê. Sala 1695-a ew destana (poêma) xweye "Mem û Zin" da derheqa hînbûna zimanê k'urdîda dinîvise, ew usa jî nava dîrok, çand û zanista k'urdada çawa ku zimanzanekî e'yan tê naski- rin. Ew sala 1685-a cara yekemîn ferh'enga xweye e'rebî-k'urdî ("Nûbara biçûkan") dinîvise û medresa xweye şexsîda dersê dide zarokên k'urda. Lema jî seydayê mezin gotîye: **"Min ev nivîsîji bo sahibrewacan, belkiji bo biçûkên kurmancan"**.

Ew gotinên hozan û zanyarê k'urdî nemirî h'etanî îro jî k'emala xweye ulm û filosofîyê hinda nekirine, çawa ku, t'emî û r'ênîşa hînbûna zimanê dê bîra medaye. R'aste, K'urdistan di zemanêd cuda-cudada jî alîyê zeftk'arêd der û hundurda hatîye p'arçekirinê, pirsra hînbûna zimanê dê jî pêş gelek astengîêd girane xedar sekinîye. Hebûn-tunebûna netewa k'urd hatîye înk'arkirinê, cîna jî axavtina bi zimanê k'urdî hatîye' qedexeki- rinê. K'urdistan her dem bûye pêşe'nîya de'w û doza miletîyê azadarîyê. Ji ber van sîtemên pêşgotî bi h'ezaran k'urd asîmle bûn, zimanê dê bîr kirin, bûn "ewladê" dêmar'îya. Çawa kû kal û bavê me wextêda gotine: "Cavê derîya, xulî serîya". Ew gotina kal-bavê meye bi çîh, îro jî boy gelê me k'emala xwe unda nekirîye. Neniherî van astengîya sedsalîyê dawîda li welatên cûda-cûdada k'itêbên zimanê k'urdî bi tîpên e'rebî, latinî, kirîlî û ermenî r'onahî dîtine.

Bi alîk'arîya wan h'etanî r'oja îro zarokên me, gelê me, ziman,dîrok, e'rf-e'det û çanda xwe bîr nekirine. Ji bo wê yekê em k'eda wan mamoste û zanyarên gelê xweye hêja û pîroz bîr nakin.

Sala 1921-e II Ermenîstanê nivîsk'ar û pedagogê ermenîyayî navdar Hagop Kazaryan (Hagop Lazo) bi tîpên ermenî k'itêba dersêye «Şems» (ji bo dibistanêd k'urdî) neşir kir, lê belê bi van tîpan tenê k'itebek hate çapkirinê. Paşê sala 1929-a bi tîpên latinî nivîsk'arê k'urd E'reb Şamîlov û îshak Morogûlovê asûrî-sûryanî, alfabêya zimanê k'urdî hazir kirin.

Lazime ku em bîr nekin, bona xwendina zimanê k'urdî, li welatê Sovê- ta berêda bi tîpên latinî k'itêb ze'f hindik hatine çap'k'irinê, k'îjan ku wî wextî bona xwendin û hînbûna zimanê dê gelekî ferzbûn. Paşê derbazî tîpên kirilî (sala 1945-a) bûne, ku h'eta îro jî, zarên me li ser wî e'sasî xwendin û hînbûna zimanê dê, li dibistananda berdewam dikin. Eva ne qelsî û kêmasîyeke, e'yane ku wexta şertê xweda ew elfabêya k'irilî gelekî kêhatî û k'ardar bûye. Lê em binhêrin ku r'oja îroyînda eva yeka têrê nake, çima ku p'areke alem û netewên başqe-başqe, îlahî jî p'iranîna gelê me xwendin û nivîsarên xwe derbazî tîpên latinî kirine. Gelê k'urd jî zûva tîpên k'urdîye latinî şuxulandîye û wexta em dinya k'urdayetîyê dinhêrin, vê derecêda k'eda mamosteyê mezin Celadet Bedirxan begê bi şêkirandin bîr tînin.

P'êwîste gotinê ku, bona me k'urdên ku li welatê Sovêtêye berê (Qazaxistan, Rûsîya, Girgizistan, Ermenistan, Gürcistan, Azerbaycan, Turkmenistan) dijîn, derbazbûna tîpên latinî bona xwendin û hînbûnê, laz- imîyeke ze'f mezine. Îlahî, di dereca helaqetîed navbera meye netewîyê, dîrok, e'debîyet û çandêda. Bi vê k'itêba "Zimanê k'urdî" me armanc girt ku, vê valatîya derheqa xwendin û hînbûna zimanê dê bi tîpên latinî, nolî destpêkekêve jî, karibin derbazkin û bi alîk'arîya fikir û nêrînêd zanyar, nivîsk'ar, zimanzan û mamosteyên k'urd, feyde û zanînekê nuh bidine gelê xwe, ku hêjayê vê yekêye.

Wextê hazirkirina vê k'itêbê me guhdarîya mezin da ser curê axavtinê (Îlahî cem k'urdên Sovêta berê) lema jî gelek cîya me prînsîpên elfabêya k'irilî ya k'urdi xayîkirin. Bi t'aybetî me li vira tîpên h'îşk û nerm bi niqtkava dane cudakirinê, k'îjan elfabêya k'urdîya k'irilî da ji hatibûn qebûlkirinê. Ew tipana evin: **k-k', c-c', e-e', h-h', p-p', t-t', r-r'.**

Wexta nivîsar û hazirkirina vê k'itêbê ji alîyê giramatîka zimanê k'urdîda, me rêç û rêbaza mamoste û zanyarên mezin Celadet Bedirxan, Qanatê K'urdo, Wezîrê Nadirî, Awa Balî, H'ecîyê Cindî, Bavê Nazê û yêd mayin ji ber ce'vara derbas kirin û feydekî mezin ji şewir û fikrê wane zanistî stendin.

Dema nivîsandin û hazirkirina vê k'itêbê, me ji gelek çe'vkanîya qinyat hildanê. Ewana ne ku tenê k'itêb û p'irtûkêd bi zimanê k'urdîne, usa ji yên bi zimanê başqe-başqe nivîsîne; (qazaxî, ûrisî, t'irkî, azerî, ermenî, farsî, e'rebî, înglîzî û yêd din), k'îjan derheqa hînbûna zimananda dewlemendin.

Vê xebata meye diwarda alîk'arîya mezin da me k'itêbên folklor, e'debîyat û diroka k'urdaye dewlemende p'ir janir. Usa jî gelek saytê (sîte) k'urdaye întêrnê.

Me di vê k'itêba hînbûna zimanê k'urdîda, mêtoda xwendin, serwext- bûn û cawdayîna mesele, metelok, têderxistinok, zûgotinok, gilîyên kal- bava, meselên cimae'tê, çîrok, p'arçeyên xwendina e'debiyata klasîk û nûjen e'sas girt. Li vira cî girtine, usa jî berhemên e'debîyata cîhanêye zargotî û klasîk, wekî zarokê me bikaribin bi zimanê dê nasîya xwe bidine wan.

Em gelekî şane, ku îro zarokên me, wê bikarbin dersên zimanê dê dibistananda bixunin û xweyî li dîrok, e'debîyat û zargotina xweye dewle- mend derk'evin û di nava cimae'tên dinda pê serbilind bin.

Çawa k'u helbestvanê k'urdî nemirî Cegerxwîn t'emî dike û dibêje:

Bixûne zimanan gelek k'ûr û dûr, Zimanê te xweş tûj dibe r'engê şûr.

Ji vê k'itêbê ne ku t'enê zarok, lê usa jî ew k'esên ku dixazin zimanê k'urdî hînbîn dikarin feydekî baş bistînin. K'itêbê tê navkirinê «Zimanê k'urdî»(bona dersxanê II-V). Ev despêke bona hînbûna zimanê dê. K'itêba duda bona dersxanê VI-IX hatîye nivisarê.k'îjanêda pirsra hînbûn, zanebûna ziman, e'debîyat,dîrok û çanda k'urda bi heralî û k'urayî hatîye cî-war kirinê.

Hazirkirin, çapkirina vê k'itêbêda bi fikir û nêrînê xweye giranbahava alîk'arîke mezin dane me mamoste û zanyarên meye hêja akademîk Nadîrê K'erem, mamosteyê navdar E'zîzê Beyler, profesör Huseynê H'emîd.helbestvan û mamosteyên k'urd H'esenê H'ecîsilêman,H'elîma E'mo, BarîyêBala, H'esenê E'vdoyê E'lî,Nejmedînê Eh'med, Meh'medê Silêmîn û yêd din.

Tiştêkî eşkereye ku wexta k'ar destpêdive û tê kirinê, bê kêmasî nave. Her me ce'dandîye, wekî qusûrî û kemasî kêmbin, lê ji wana jî meriv nikare t'am dûrk'eve.

Emê pêşda spasîya xwe bidine wan mamosteyên qed i rbilind, p'êşekzan û xandevanên e'zîz, yêd ku wê bi fikir, nêrîn, p'eşdanîn û r'exnê xweye cîda alîk'arîyeke mezin bidine neşra vê k'itêbêye paşwextîyê.

**Knyazê Îbrahîm
Çille,2006
Qazaxistan, Almati**

Предисловие

Учебник «Курдский язык» впервые издается в Казахстане. Он состоит из двух частей и адресован учащимся общеобразовательных школ с курдским языком обучения, а также всем желающим самостоятельно или на базе воскресных школ овладеть курдским языком. При его составлении учитывались национальная стратегия образования Республики Казахстан и Государственная программа развития языков.

Первая книга рассчитана на учащихся вторых-пятых классов. Ее цель - вооружить их базовыми умениями и навыками, достаточными для общения в сферах и ситуациях, актуальных и социально значимых для обучающихся.

Выдвижение данной цели согласуется с господствующим в современном образовании деятельностным подходом, который в процессе обучения языкам реализуется в виде коммуникативнофункциональной технологии обучения, призванной развить у учащихся способность осуществлять успешное общение в пределах заданного учебником уровня с перспективой его дальнейшего самостоятельного совершенствования.

Исходная цель, соответствующая ей педагогическая технология, а также достижения лингвистики и психолингвистики диктуют объем и структуру языкового материала в первой части учебника. Для формирования у учащихся коммуникативной компетенции первого уровня, а именно элементарных умений и навыков речевой деятельности вводятся сведения по фонетике (в том числе графике, орфоэпии), лексике и синтаксису. Знакомство со звуковым строем дополняется знакомством с графикой. Обучающиеся усваивают курдский алфавит, его написание, значения букв, орфоэпические особенности произношения звуков.

Лексика и синтаксис введены в учебник на основе принципа функциональности, то есть с учетом их взаимодействия в речи, чтобы обеспечить более эффективное усвоение курдского языка с начальных этапов его изучения.

В синтаксисе представлены основные типы предложений, которые отличаются высокой степенью употребительности, лексика же отобрана с учетом ее коммуникативной, познавательной и воспитательной ценности, способности наполнять модели предложений. Ядро лексического минимума первой части учебника составляют слова из лексической базы, к примеру, курдские названия дней недели, месяцев, времен года народных и государственных праздников и т.п.

Функциональное единство синтаксиса, лексики и их звукового

оформления в речи демонстрирует дидактический материал первой части, представленный в диалогах, охватывающих разные сферы и ситуации устного общения и затрагивающих актуальные для учащихся темы.

Мотивированность обучения курдскому языку повышает, наряду с коммуникативной направленностью, включение этнокультурно-ведческого компонента, позволяющего изучать язык, познавая отраженную в нем культуру, историю, быт, национальный менталитет курдского народа.

Этот компонент представляют тексты и иллюстративный материал, которые знакомят с богатыми традициями курдского народа, с его устным народным творчеством и художественной литературой. Учет возрастных особенностей учащихся обусловил привлечение курдских народных сказок, пословиц, поговорок, загадок, песен, рассказов о животных.

Учебник содержит информацию и о культуре, которая складывается в многонациональном суверенном Казахстане, готовя учащихся к общению в условиях межкультурной коммуникации. Даются тексты, посвященные разным регионам, городам Казахстана, рассказывающие о межнациональном согласии.

Цель, которая ставится во второй книге, - формирование языковой и более углубленной коммуникативной компетенции, воспитание национального самосознания и чувства государственной самоидентификации.

Языковые знания учащихся развиваются на основе дидактических принципов преемственности, принципа перехода от простого к сложному, системности и функциональности. Успешность изучения языка обеспечивается таким построением языкового материала, чтобы отразить роль синтаксиса, организующего речь. Он дан с дополнением и углублением по сравнению с соответствующим разделом первой книги.

Вторая часть учебника продолжает знакомить с лексикой, которая выстроена по тематическому принципу. Выбор тем для лексики и представляющих ее упражнений и текстов определяется целью отразить картину мира в курдском языке. При этом делаются два акцента. Во-первых, углубляются представления учащихся об истории и культуре курдского народа, его национальных традициях и праздниках. Они знакомятся также с национальными героями, известными общественными деятелями, учеными курдского народа и др. Во-вторых, тематика и лексика текстов отражают историю суверенного Казахстана и историю республики до периода

суверенизации. Учащиеся могут узнать о культуре межнационального Казахстана, его уникальной природе, традициях и обычаях народов, населяющих страну.

Дидактические материалы позволяют продолжить развитие умений и навыков устной речи. Они распределены по тематическому принципу: знакомство, семья, транспорт, аэропорт, школа, магазин, рынок, поликлиника и др. Выбор лексических тем мотивирует процесс изучения курдского языка и обеспечивает эффективность обогащения словарного запаса.

Учебник снабжен двуязычным курдско-русским словарем с разработанным для учебных целей лексикографическим аппаратом, который облегчает словарную работу учащихся как на этапе развития коммуникативно-речевых компетенций, так и на этапе их контроля.

Обучающий аппарат обогащен за счет привлечения разных типов упражнений с соблюдением равного соотношения упражнений, развивающих разные виды речевой деятельности (письма, чтения и аудирования) и две ее формы (устную и письменную). Среди них особое место занимают упражнения, нацеленные на вооружение навыками перевода.

Вторая часть учебника включает также материалы для самостоятельной работы, которые могут быть использованы на дополнительных занятиях и на уроках по внеклассному чтению.

Описание курдского языка не только как языковой системы, но и как отражения картины мира, а также органичное соединение процесса обучения и воспитания позволяют надеяться, что учебник поднимет обучение курдскому языку на уровень современных требований, определяемых языковой политикой государства, с одной стороны, теорией и практикой преподавания языков - с другой. Учебник, несомненно, повысит интерес к изучению курдского языка и литературы, поможет воспитанию интеллектуальной личности.

Автор выражает благодарность тем ученым, педагогам и методистам, чьи советы и рекомендации оказались полезными при подготовке к изданию этого учебника - академику НАН РК Н.К.Надинову, отличнику народного образования СССР и Казахстана А.Б.Надырову, поэтам-педагогам Варне Бала, Гасане Хаджисулейману, профессору У.А. Садыкову, доцентам-курдологам Халима Амо, Гасане Авдое Али, Нажмадине Ахмеду, Махмеде Сулейману и др.

Автор заранее благодарен всем, кто своими критическими замечаниями и пожеланиями окажет помощь в работе над последующими изданиями учебника, в его научно-методическом совершенствовании.

Князе Ибрагим
Январь, 2006 г.
г. Алматы



Ғимна Комара Qazaxistanêye Dewletê

ҚАЗАҚ.СТАН РЕСПУБЛИКАСЫ МЕМЛЕКЕТТІК ӘНҰРАНЫ

**Сөзін жазғандар Жұмекен
Нәжімеденов, Нұрсұлтан
Назарбаев.**

*Алтын кун аспаны, Алтын дән
даласы Ерліктің дастаны, Еліме
қарашы! Ежелден ер деген,
Даңқымыз шықты ғой. Намысын
бермеген, Қазағым мыклы ғой!*

Қайырмасы:
*Менің елім, менің елім, Гүлің
болып егілемін, Жырың болып
төгілемін, елім! Туған жерім
менің- Қазақстаным!*

**Музыкасын
жазған Шәмші**

*Үрпакка жол ашқан, Кең байтақ
жерім бар, Бірлігі жарасқан,
Тәуелсіз елім бар.
Кдрсы алған уақытты, Мәңгілік
досындай.
Біздің ел бакытты, Біздің ел
осындай!*

Қдйырмасы:
*Менің елім, менің елім, Гүлің
болып егілемін, Жырың болып
төгілемін, елім! Туған жерім
менің- Қазақстаным!*

QAZAXÎSTAN WELATÊ MEYE



Welatê me şên û bedews



Em welatê xwe h'ez_dikin

*Xwendin ûzanîn z'bnahiye, ne
xwendin û ne zanîn r'eş û tarfye...*

Go [in a cimae'té

ELFABA K'URDI

Elfaba çîye?

Tîp (h'êrf) ji dangan çêdibin. Deng p'irin. Dengê tebîyetê, heywanet, texnîkêyê û yê din. Tîp t'enê ji axavtina meriva têne çekirinê.

Ev dengên xebirdanê, nivîsarêda bi tîpan têne nîşankirinê. Di zimanê k'urdîda 31 tîp(h'êrf) hene. Ji h'emû tîpên ku dû hev têne r'ezkirinê **Elfaba** çêdibe.

Lazime em rêza tîpan ku li dû hev têne nivîsarê hîn bibin û ezber zanibin. Çimkî nivîsandinêda tîpan gora rêza xwe elfabayêda cîh digirin.

Niha jî em tîpên zimanê k'urdî hîn bibin.

Nivîsandina tîpên gir

ABCÇDEÊFGH ÎĪJKLMNOPQRSŞ TUÛVWXYZ

Nivîsandina tîpên hûr

abcçdeêfghiîjklmnopqrsştu û V w X y z

Destnivîsara tîpên gir

I ÎJTtLMWOTQ^SŞ TV'ÛVWX'YZ

Destnivîsara tîpên hûr

a b cçde êfg fi i îj ÇJm nopqrsştuûvwxyz

S partin:







Van tîpan li deftera xweda binvîsin û bi sire ezber bikin.









Destnivîsara tîpan paqij binvîsin û hînbîn.

NIVÎSANDINA TÎPAN



Tîpên jêrîn bixûnin û navê şikla
di defterê xweda binîvsin.





EVŞİKLÊN HANÊÇÎNE?

Wan nava bi tipên destnivîsar deftera xweda binvîsin



Hirc



Qaz



Sêr



Mîşk (beleban) Çêlek(mange)




Hesp



Cûcîk



Sîvorî



Fîl



Se(kûçîk)



Meymûn



Xezal

Em dinivîsin û dixûnin

&

A - Agir nişana Newrozêye. **Ava** kanîyên K'urdistanê sar û zelalin.



B - Beran nava pêzdaye. **Berf** dibare. **Berx** dik'ale. **Berzan** şêrê k'urdane.



C - Cemîle doxtire. **Canê** diçe dibistanê.



Ç - Çiyayê Alataûê gelekî bilinde.



D - Dibistan nezîkî mala meye. **Dar** şîne.



E - Esmer cem dayika xweye. **Esker** şaire.



Ê - Êrîş lawê k'urdane. **Êl** maka merivane.



F - Fîl xwedîyê pozê dirêje. **Ferzende** li hespê sîyar bûye.



G - Gizêr şîrîne. **Gulnaz** xûşka birane.



H - H'irç heywaneke ze'f mezine. **Hesp** hogirê meriyane.



Î - Bi vê tîpê zaravê meda gilî dest pê nabin. Ew tîp hertim di nav û dawîya xeberada tê. Civîka bedew.



î - îro sala t'ezeye. **îslam** li hespê siwar (sîyar) bûye.



J - Jûjî ji mara (me'ra) h'ez nake.



K - Kevçî û çengel li rex hevin. **Kûçik** dicemide.



L - lemp'e malê r'onik dike. **Leylê** kulîlka K'urdistanêye.



M - Mişk pêñîr duxe.



N - **Name** ji birayê min hat. **Nan** li ser sêlêye.



O - **Otobüs** diçe. **Oda** me mezine.



P - **P'isîk** dijminê mişkane. **Payîz** hat.



Q - **Quling** sekinîye. **Qelem** ji bo nivîsarêye.



R - **R'ûvîyê** fêlbaz. **R'engîn** keça k'urdane.



S - **Sêvê** Almatê gelekî bi te'min. **Sol** lingê min dêşîne.



Ş - **Şêr** h'ak'imê daristanêye. **Şemê** dayika Filîte.

T - T'êlêvîzor nîşan nake. **Tendûr** t'ijî nane.



Û - Ûtî germe. Li **Ûrdûnê** deve ze'fin. **Ûrfa** bajerekî p'ir kevnare.




U - Ulumdar û helbestvanê k'urda r'onahîya gelin.



V - Apê Vefî h'ekîme. **Vizik** deste min daye.



W - Wek'il ji xewê r'abû. **Werdek** di nav golêdane.



X -Xezal h'eywaneke p'ir bedewe.




Y - Keçê yûnan k'incê de'wetê xukirine. **Yasîn** xwendek'are.




Z - Zebeşên Kap'çêgayê gelekî mezin û şîrînin. **Zozanê** me p'ir bedewin.


Şiklên hanê kêrî çî tîn, li çîyê vala binîvîsin



Tavir (*bivir, tevir*).....



Bizmar.



DENGZANÎ (sewtzanistî, fonêtîka)

^engzanî, zanîsta derheqa hînbûn û çêbûna dengane (seVvt). Ew şirovedike, wekî bi çi cûreyî û bi alîk'arîya K'U^{an en^}amên xeberdanê deng çêdibin.

Endamên (organên) xeberdanê

Endamên xeberdanê evin: **dev, lêv, diran, birî, ziman, poz,** ^{XICHK} **û qirik (gewrî).** Em bi alîk'arîya devê xwe dikarin ^{xeber bidî}h. Hewa ku em bi devê xwe distînin û didin gewrîyê, û têlê ^{xe^}erdanê dik'evin û bi wî cûreyî deng ji devê merîyan dertên. ^{Ev} dengê ku dertên em bi alîk'arîya dev, lêv, diran, birî, ziman, ^{xid\} û qirika xwe derdixin. Lerna wexta ku em hewa didin devra ^{u d^}**vê** xwe vedikin û digirin deng (sewt) çêdibin.

Mesele: Wexta em dibêjin **çav** sê deng ji devê me dertên. Ev ^{her^}ê deng evin: **ç, a, v.**

^{Li} Mesela jorînda sê deng ji deve me derk'etin. Ji wana du liv ^{der>}gdarin (bêdeng) weke **ç, v,** yek jî dengdêre (bideng) weke **a.** ~ ^{We}кта em dibêjin av du deng ji devê me dertên. Dengê pêşî ^{der^}gdêre (bideng) weke **a,** dengê din jî dengdare (bêdeng) ^{we}ke **V.**

[^]exta em dibêjin **mamoste** h'eft deng ji devê me deften- Ji ^{war>}a çar liv dengdarin (bêdeng) weke **m, m, s, t,** sisê jî ^{der>}gdêrin (bideng) weke **a, o, e.**

^{Ler}ha jî cawa kû gelek zimanê cîhanêda, usa jî zimanê meda ^{der*g} (sewt) p'aravedibin serdu k'oman:

1' **^engdêr (bideng, sewtên denqanî).**

2' **^engdar (bêdeng, sewtên bêdengani).**

Spartin

P.^{e'} **Welat, aşîî, Qazaxistan, K'urdistan.** Van pêyvanda denga b'jmirin.

K'oma sewtan*

Elfaba k'urdîda 31 tip hene. Ji wana 8 dengdêrin, 23 jî dengdarin. Tîpên dengdêr bi serê xwe (xu berê) ji devê me dertên. Alîk'arîya dengên din ji wanra ne lazime.

Sewtên dengdêr evin: **a, e, ê, î, î, o, u, û.**

Ev deng jî nava xweda bi awayê dirêj û kurt vediqetine ser du k'oman: Mesele: **a, ê, î, o, û** - denge dirêjin. **e, i, u** - denge kurtin.

Xeberên jêrin bixûnin, binê dengdêra xêz bikin.

Artêş, aş, agir, al, alav, adar, aqil, ar, avrêj, ez, elek, e'nî, evîn, Esmer, enîşk, Narê, êl, em, îro, îşev, îcar, îskan, ûtî, werîs, Dihok, Urmîye, ode, ol, Almati.

Lazime em bizanibin: Zimanê meda du dengdêrê e'ynî (nolîhev) nayên bal hev. Weke **saat**.

Awayê r'astnivîsandinê ahaye: **Sae't** (hine zaravada **sie't, see't**).

*Guhdarî ji bo mamoste, zanyar û xwendevanê me!

Zimanê k'urdîda, bi taybetî zaravê k'urmancîda em r'astî tîpên hişk û nerm tên. Ewana him h'îşk, him jî nerm ji devê me dertên û tenê xandinê. Wi çaxî me'na gilîya (xeberan) jî tê guhestinê, îlahî wan gilîyada, k'îjan ku ji zimanê e'rebî, farsî û yên din derbazî zimanê me bûne. R'ola wan dengên cêwî di zimanê k'urdîda gelek girîngin. Bona ku wan ji hev derxin em niqîtkê (apastrofê) datînine ser tîpên h'îşk. Ev prînsîp (qanûn) tîpên k'urdîye kriliyêda jî hatibûn qebûlkinê. Ew tîpana evin: **k-k', e-e', ç-ç', h-h', p-p', t-t', r-r'**.

Mînak (mesele)'

Bê niqîtk

B' nic'ᵛtk

Kal (bapîr, pîr, kalik) ^{K'al <zeveᵛ negihlᵛ xanᵛ xam>}

Kar (kara bizinê, karik, kadik) ^{K'ar (xebat- ᵛuxul' 4ezen?>}

Ker (merivê ku nabihîze, merivê ^{K'ar <he> TM an' 9uhdire)j} ker)

Kêr (yek şuxulekî xêrê dike, ^{K'®r} (kêra desta, k'êra tûj) kêra kirî, kêrî tişteki tê)

Bê niqitk

Egît, Emer, Hesên, Ezim, Elî, heft

Vir (li vir, li vira)

Par (sala çûyî, sala buhurî)

Çal (k'ortik)

Çar (çarik, leçek, star, guman)

Çira (lempe, r'onahî)

Pîr (depîr, ixtîyar)

Ta (benik, t'êl)

Ger (ku, eger)

Gur (gurê dev bi xwîn)

Bi niqitk

E'gît, E'merH'esên, E'zim, E'lî, h'eft

Vir' (derew.ne r'ast)

P'ar (p'arek, heqek)

Çal (belek, hespê çal)

Ç'ar (4, Qralê Rûs),

Ç'ir'a-? (pîrs),

P'îr - (oçax, dîndar, p'îranî),

T'a (nexweşî, riçaf, lertzete)

Ger' (gerr, çûn û hatin, ger'andin)

G'ur' (k'esên biçûk gur'a mezinan dikin, cemê gur')

Evana ne yekin, ne dudune, bi sedan gotinên wiha hene. Di vê mijarêda zimanê k'urdî gelek dewlemende.

Gerek em bizanibin ku dengê cêwî ne yekin. Her yek cêwî ji hev veqetandiye û dengêkî cuda dide. Bi r'astî ev firq di tîpa «X» yê da jî heye, lê em wê ewqasî jî girîng nabînin.

Bi fikra me ev nivîsara tîpan, wekî neyêne lekolînkirinê, r'astkirinê, wexta xandin û nivîsarê wê astengîya pêjda bînin. Fikr, peşnîyarê meye jorîn van çetinaya û astengîyan ji ortê hildide. Pêwîste zanyar û zimanzanên me paşwaxtîyê guhdarîyê bidin ser vê pîrsgirêkê û wê çareser bikin. T'exmîna me elfaba k'urdî wa bê qebûlîkirinê we r'astbe. Bi vî hewayî elfaba k'urdî dibe 38 tîpa (h'erfa), tîpên h'işk û nerm.

Em vê k'itêbêda wan 7 tîpên jork'ivşkirî didin xebatê, k'îjan r'astnivîsandin û xwendina xeberan hêsa û zelal dike. Elfaba tîpên k'urdîye kirîlîda jî ev qanûn hatibû qebûlîkirinê. Bi fikra me, ji bo vê yekê jî elfabaya k'urdî h'ewcî lênihêrandineke fomerîye.

Bi fıkra me ELFABA K'URDÎ aha bê nivîsarê û
qebûlîkirinê çêtire.

Nivîsandina tîpên gir (girdek)

**ABCÇÇ' DEE'ÊFGHH' ÎÎJKK'L
MNOPP'QRR'SŞ T T U Û V W X Y Z**

Nivîsandina tîpên hûr (hûrdek)

**abcçç'dee'êfghh'iîjkk'lmno
pp'qrr'sştt'uûvwxyz**

Destnivîsara tîpên gir

**AQCÇÇ'VKE'ÊTGM
(P'QJt^SŞT TV VV'WXTZ**

'K'GMWotP

Destnivîsara tîpên hûr

**a6cçç'dee êfghfiiîj^ fmnopp'qr r'sş
t1'uûvwJty z**

Mînak (mesele):

1. Çîmanê dora gundê me t'imê hêşîne.
2. E'gît do çû mala apê E'lî.
3. H'elebçe wek bajarêd Xîrosîma û Nakasak'î yê k'etîye nava dîrokê.
4. Apê K'eleş duh ji welêt vegeriya.
5. "R'ya T'eze" r'ojnama k'urdane.
6. T'êmirt'enê çû bajêr.
7. P'aşla t'ebîyetê her wext xweşe.
8. Ç"ivîkê hêlîn çêkir.

Di elfaba k'urdîye latinîda tîpên ç', e', h', k', p', r', t' t'unenin. Lema jî wexta xandin û nivîsandinêda çetinahî pêşda tên. Vê çetina yê em dikarin bi himberhevkerinêd elfabaya k'urdîye latinî û kirîlîva daha zelal bidine k'ivşê:

Bi elfaba latinî	Bi kirilî ev xeberana bê niqîtk wusa têne xwendinê (çewte)	Elfaba kirilîda (raste)	Tîpên latinîda bi niqîtik (raste)	Mînak
Çerm	Чәрм	Ч'эрм	Ç'erm	Ç'ermê ga
Çar (guman)	Чар	Ч'ар	Ç'ar	Tu ç'ara minî
Çîk	Чик	Ч'ик	Ç'ik	Ç'ika ç'eva
Elok	Элок	Э'лок	E'lok	E'lok dir'eva
Edet	Эдэт	Э'дэт	E'det	E'detê kal û bava
Elî	Эли	Э'ли	E'lî	ETî hat
Heram	Һерам	Һ'эрам	H'eram	Ev diravê h'eramin
Hal	Нал	Н'ал	H'al	H'alê te çawane?
Hub	Һоб	Һ'об	H'ub	H'ub-h'izkirin
Kar	Кар	К'ар	K'ar	K'arê min heye
Kal	Кал	К'ал	K'al	K'al-zebeş
Kes k	Кэск	К'эск	K'esk	R'engê k'esk
Par	Пар	П'ар	P'ar	P'ara min
Pire	Пърэ	П'ърэ	P'ire	P'ira mezin
Perî	Пари	П'эри	P'erî	P'erî dir'eva
Rûn	Рун	Рун	R'ûn	R'ûnê h'elandî
Ruh	Рөһ	Р'өһ	R'uh	R'uhê min
Text	Тэхт	Т'эхт	Text	T'extê nîn
Tore	Тора	Т'орэ	T'ore	T'orê zarokan
Tac	Тац	Т'ац	T'ac	T'acê serê min

K'oma sewtên dengdar (bêdeng)

Sewtên dengdar (bêdeng) xuberê ji devê meriva dernayên, ew bi alîk'arîya dengekî dinê ji devê me dertên. Çawa tê k'ivşê ev cûre bêdengin. Lema jî di van tîpanda dengê dirêj û kurt tûnenin.

Tîpên dengdar evin:

bcçdfghjkqlmnprrsştvwxyz

Bi alîk'arîya dengekî mayîn ji devê me awa dertên:

**bê cê çê dê fê gê hê jê kê qê lê mê nê pê rê sê şê tê vê
wê xê yê zê**

Di zimanê k'urdîda ji bo her dengekî tîpek (h'erfek) heye. Zimanê k'urdî, da tenê dengekî taybetî heye ku bi du tîpan derdik'eve û bi k'urdîjêr'a pevdeng û ewropîjî diftong dibêjin. Ewji tîpên "x w"ne. Dengê tîpa "x" bilind û xurte û ya "w" jî nizim û zeyîfe. Carnan dengê "w" weha kurt û zeyîfe ku mirov nabihîse û bi tenê dengê "x" dibihîse. Lema jî di nivîsandina k'urdîda herî bêtir çewtî di vî dengîda tê kirin. **Mînak:**

Xwe, xweş, xwişk, xwelî, xwê, xwarin, vexwarin, serxwebûn, xwîn, Cegerxwîn, xweş, nexweş, nexweşxane, xweşmer....

Ev dengê k'urdî ku ji du tîpan derdik'eve di zaravayê k'urdîda ne wek heve. Di zaravê kurmancîda jî li gor herêman tê guhartin. Soran, dimilî û li hinek deverên kurmancî jî bi tenê tîpa "x" k'ar tînin. Lê, di rastnivîsa kurmancîda pêwîste ku mirov "x w" binivîse.

Spartin

Tîpên dengdar deftera xweda binvîsin û yeko-yeko biwek'ilînin k'a ewana ji devê we çawa dertên.

BANG (k'irde, hêca)

Zimanê meda xeber p'aravedibine ser banga. Xeber ji bangan ava dibin. Carna bangek bi serê xwe me'nekê dide y dibe xeber (peyv, k'elîme), carna jî çend bang tèn bal hev paşê me'nek jê dertê û dibine xeber.

Mînak:

K'ur-dis-tan, dem-baş, di-bis-tan, ma-mos-te, p'ir-tûk, def-ter, mi-rîşk, wer-dek, rû-vî, ke-vir, xa-nî, he-wa, k'urd, şev, r'oj.

Em navê xwe p'areveyî ser banga bikin û binivîsin:

Na-rî-fe	Narîfe	E'-lî	E'lî
Şa-mîl	Şamîl	Ba-rî	Barî
El-vî-na	Elvîna	Me-dî-ne	Medîne
Me-cîd	Mecîd	Şe-vîn	Şevîn
Si-lê-man	Silêman	Re-fîk	Refîk
T'ê-mir	T'êmir	H'e-sen	H'esen
Or-dî-xan	Ordîxan	Fi-lît	Filît

Zimanê k'urdîda ji yekê h'eta pêncan bang hene.

Xebera yekbang: av, ew, ez, tu, em, xwe, şev, al, ser, çol, bar.....

Xebera dubang: a-dar, çi-le, ka-lik, nî-san, gu-lan, î-lon, mij-dar...

Xebera sêbang: ber-fen-bar,ra-ki-rin, ser-kev-tin, r'oj-na-me

Xebera çarbang: te-ma-şe-van, p'ir-tûk-geh-î, der-ge-va-nî

Xebera pêncbang: r'oj-na-me-van-î, ne-te-we-p'a-rêz, we-lat-p'a-rêz-î...

Spartin

Van xeberên hanê bi awayê bangan bixûnin:

Şîrîn, şev, Zozan, Almati, Bîşkêk , çîya, Sîp'an, şerbik, kal, Cambûl.

Derbdayîn (Teqil)

Zimanê k'urdîda xeber payê pir binderbin. Derbdayîn me'na (wate) xebera teqîl dike, cama jî duguhêre.

Mesele:

Nan, av, tirî, ç'ira, toxavk, hîvêron, me'rgîsk, r'ojî, avdan, sibat, belek, banokî, birûkî, k'ulfik, t'êr, t'ijî û yên dinê.

Di zimanê meda em r'astî xeberên usa jî tèn, k'îjan rêza xeberada bêderbin:

Mesele:

Li, ji, di, bi û hinekên din yên ku r'eqema wana ne ewqas mezine û bi xeysetê (taybentmendî) xweva, hîmlî xweyî k'emala giramatîkêne. Cama hine xeberê yekbang zêdetirda derb dik'eve ser banga paşîn. **Mesele:**

H'esas, h'idût, h'ewas, k'ewser, H'emîd, seranser, k'ulfik û yên dinê.

Ew xeberên ku zimanê îroyînda têne xabatê derb dik'eve ser banga wane paşîn. Cama jî li zargotina cimae'têda dilqê xweyî kevinda têne xebatê: Wanda derb dik'eve ser banga pêşîn.

Em himberî hev bikin, binhêrin, çika derb dik'eve ser k'îjan h'erfê: **Mesele:**

Zimanêîroyî

Baba, H'emze
E'lî, î'sa, E'nter

Zimanê cimae'tê

Baba, H'emze
E'lî, î'sa, E'nter

a) Xebera du bangda, derb dik'eve ser banga pêşîn.

Mesele:

Îro, îşev, îsal, îni, şemî, îcar, şima, sinî, tima, hela, berê, zûva, nema, berda û yên dinê.


Me'na bin derbîya banga pêşîn, p'ir'anîya xeberên wanda ewe, ku ewana ser h'îmê xeberên giramatîkî yanê jî, ser hîmê hevbendê xebera hatine çêkirinê û xudantîyê li derba e'sasî dikin. Mesele:

îni (ev) sal û îsal, îni (ev) şev û îşev, hingê, berê û berê binda û binda.

b) Eger xeber çarbange, derbdayîn dik'eve ser banga sisya: serdewatî, melomestî, xênedîtî, xiloxarî, çavqelişî, şevereşî û yên dinê.

R'ojên h'eftê bi k'urdî

1	Duşem	Du-şem
2	Sêşem	Sê-şem
3	Çarşem	Çar-şem
4	Pêncşem	Pênc-şem
5	În	în
6	Şemî	Şe-mî
7	Yekşem	Yek-şem



R'ojên buhurî

.... Duh (do), pêr,
betirpêr...

îro
Niha
Vê demê
Vê gavê
Vê sae'tê

R'ojên hatî

Sivê (sibê), dusiva
(dusiba), sêsiva (sêsiba),
r'oja hatî...

Mesele: îro r'oja baharêyê e'wlîne.

Duh ez çûme dibistanê.

Sibê emê herne Cambûlê.

Pêr tu ji Astanê hatî? Ezê pêncşemê bême mal.

Betirpêr ez li mal bûm. Ez duşemê çûme Çîmk'endê.

R'oja hatî dora mine.

Navên meha

Salekêda 12 meh hene. Hinek meh 30, hinek jî 31 r'ojin. Le meha sibatê 28 r'oje, çar sala carekê jî dibe 29 r'oj.

1-Çi-le	1	Çile
2- Si-bat	2	Sibat
3- A-dar	3	Adar
4- Nî-san	4	Nîsan
5- Gu-lan	5	Gulan
6- H'e-zî-ran	6	H'ezîran
7- Tîr-meh	7	Tîrmeh
8- T'e-bax	8	T'ebax
9- î-lon	9	îlon
10- Cot-meh	10	Cotmeh
11- Mij-dar	11	Mijdar
12- Ber-fen-bar	12	Berfenbar



Pirs, Spartin

- 1 - Newroz di k'îjan mehêdaye?
- 2 - Naha em di k'îjan demsalê û mehêdane?
- 3 - K'îjan meh 30, k'îjan 31 r'ojin deftera xweda binivîsin.
- 4 - Navên meha p'arevekin ser banga, deftera xweda binivîsin û ezber bikin.
- 5 - Payîzê emê herne dibistanê

ROZGARÊN (HEYAM,_DEMSAL)_SALÊ

Salekêda 12 meh, 4 rozgar (*heyam, demsal*), 52 h'efte, 365, carna jî 366 r'oj hene.

Her r'ozgarekêda jî sê meh hene. R'ozgarên salê evin:

1	Bahar
2	Havîn
3	Payîz
4	Zivistan




BER (QULBE) BI ZÎMANÊ DÊ

Qulbên hîmî(e'sas) evin:

Bak'ûr
Başûr
R'ojava
R'ojhilat

Qulbên navîn evin:

Bak'ûrê r'ojava
Bak'ûrê r'ojhilat
Başûrê r'ojhilat
Başûrê r'ojava



Em Der-dorê Xwe Nas Bikin


Paş-pêş

Jor-jêr

R'ast-çep

Ser

Bin P'er' Tenişt
(k'êlek)



Spartin

1-Berê xwe bidine r'ojhilatê (cîyê ku r'oj dertê) destên xwe vekin başûr-bak'ûr, r'ojhilat-r'ojava û paş-pêş, jêr-jor bidine k'ivşê.

2- Li ser îstolê çep-r'ast, jorîn-jêrîn, ser-bin, tenişt (k'elek)



DERSDARÊ MIN

Dersdarê min, zanyarê min,
Sermîyan û r'êberê min, Te ez
dame xwendinêda, Bigrim
r'îya r'ast dinêda.

Mijûl bûyî, minra bi dil, Te
daye min, hiş û aqil, Te'lfm,
t'ore, t'erbîye kirim, Berbi
civaka r'ast birim.

Wê r'êyêda min gul veda, R'oj
bi r'oj ez çûme pêşda, Tê da
minda, zar û ziman, Bûyî
minra h'ekîm - loxman.


Bi h'urmetî, bi sîyanetî, Bi nav-
dengî, me'rîfetî, Dê û bav te
dibin amin, Zarokanr'a dibî
zamin.

Emekê te, ez bîr nakim, Her
tim ezê dil te şakim, Sujde
dikim, ez li pêş te, Ku bilindkim
nav-dengê te!

H'esenê H'ecîsilêman

FİS ..

Şaîr vê helbestêda emekê dersdarê xwe çawa qîmet dike? Bi
gilîyê xweva şirovekin.



K'urdên Girgizistanê

Girgizistan welatekî Asîya navînî kevnê. Ew orta çiyada cî-war bûye. Gola Îssîk-Kûlê bedewîke cûda dide we. Girgizistan sala 1991-ê bûye dewleteke serbixwe. Serbajarê wê Bîşkêke. K'urd vî welatîda ji sala 1937-a jîyan dikin. K'îjan ji alîyê rêjîma Stalînda ji Erîmenîstanê, Gurcistanê û Azerbaycanê hatine sirgûnkirinê. Îro bist h'ezara zedetir k'urd tevî gelên girgiz, ûris, qazax, ûzbêk, tirk, ûyxûr, azerî û yêd mayînan jîyan dikin.

Gelek k'urdê me vê komarêda (dewletêda) xwendina bilind dest anîne: dersdar, doxtir, mühendis (çêkirçî), r'ojnamevan, extîyarzan û yêd mayin.

Li Girgizistanê Navenda Çanda K'urda «Mîdîya» heye. Bi zimanê k'urdî weşanên radîyoê tên dayîne. Cîyê k'urd pir dijîn, bona zarokê wan dersê zimanê dê derbaz dibin. Ew jî tevî k'urdê Qazaxistanê û Sovêta berê ji k'itêb û p'irtûkê zimanê k'urdî hîndibin. Zarave wan k'urmancîye. K'urdê Girgizistanê h'etanî îro jî ziman, e'rf, e'det, r'abûn-r'ûniştandina xweyê mîletîyê xayî kirine..

Spartin

- 1 .Derhega Girgizistanêda zanebûnê xwe qisekin.
- 2 .J1 nivîsara jorîn pênc cumla bijbêrin û derbdayîne daynin ser.

MORFOLOGÎYA (FORMZANÎN)

Morfologîya, zanîsta hînbûn û hînkirina cûrên xeberane (k'elîme, pêyv). Ew şirove dike û tîne ber çawan çi t'eherî cûrên xeberan çêdibin. Dide k'ivşê, çawan paşkoka xeberan li hevtên, çi teherî û bi alîk'arîya çî xeber çêdibin.

ÇÊKÎRINA XEBERAN

Xeber bi çar cûra tene çêkirinê. Ewana evin:

1- Hinek xeber bi alîk'arîya k'oka fêlan çêdibin. K'oka fêlê : **avîtin, birin, gotin, kuştin, r'êtin, stendin...** Dik'evine axirîya xeberê.

Mesele (mînak):

Agiravêj, r'êbir, dengbêj, gurkuj, çîroknivîs, avrêj, avdêr...

2- Carna ji yekê zêdetir xeber tên berhev û xebereke nû çêdibe: **bin, ser, kur, dest, bar, mêr...**

Mesele:

Bin-dest, ser-dest, kur-ap, deste-birak, dest-dirêj...

3- Bi alîk'arîya r'engdêrê (sifet) xeber çêdibin: **sor, zer, xas, r'eş, bilind, dirêj, xwar, kej, kin, qîç, leq...**

Mesele:

Gulsor, p'orzer, mêrxas, bejinbilind, guhdirêj, devxwar, enîkej, bejinkin, devqîç, devleq, simêlbaq, simêlr'eş, bargiran...

4- Bi dubarekirina heman xeberê, gilîyê nû çêdibin:

Mesele:

T'eqe-t'eq, r'eqe-r'eq, p'iste-p'ist, kûze-kûz, şîqe-şîq, şinge-şing, dinge-ding, r'inge-r'ing, qîrçe-qîrç...

Spartin

Li xeberên jorîn binhêrin, xeberên nolî wan bijbêrîn û nava hevokada bidin xebatê.

Pêşpirtikên çêkirina xeberan (pirêfîks)

PEŞPIRTİK

Qertafên (pirtik) ku têne pêşîya xeberan pêşpirtikin (pêşgir). Xeber bi alîk'arîya van pêşpirtikan aha pêk tîn û me'neke nû didin. Pêşpirtikê sereke evin: **bê, nav, ne, ber, bin, ser. ..**

Mesele: Bêxweyî, navber, nedîtî, berdêl, berpal, bingeh, bindest serdest...

Paşpirtikên çêkirina xeberan (sûffîks)

PAŞPIRTİK

Qertafên (pirtik) ku têne paşîya xeberan wanara paşpirtik (paşgir dibêjin. Paşpirtikên sereke evin: **anî, ar, baz, bend, dar, ger, ok, kar stan, war, mend, bar, van, î, tî, ayî, ek, xan, saz, wî, um**

Xeber bi alîk'arîya van paşpirtikan aha pêk tîn.

Mesele: p'iranî, nivîsar, gilîbaz, hevalbend, şevger, ger'ok xwandek'ar, Uzbekistan, berwar, aqilmend (aqilbend)...

Günde me

Can gundê me, gundê me, T'une t'ayê gundê me,
Nava h'ezar gundada, Dîsa t'enê gundê me.
Kaniya zelal ortêda, Mêşe-çayîr r'ex wêda,
Hermalekê, hergava, K'en û k'ilame ser lêva. Can
gundê me, gundê me, T'une t'ayê gundê me,
Qalçîcek ku r'adibe, Wexta t'eze vedibe, Ew jî
xwezila xwe tîne, Xeml û r'ewşa gundê me.

Simoyê Şemo

Spartin

Helbesta jorîn ezber hînbin.

Derheqa gundê xweda nivîsekê binivîsin.

R'ENG BÎZÎMANÊ DÊ

Sipî Reş Şîn K'esk Zer Qemer Sor Gewr

R'eng pirsîn

Gulê:

- Ev k'îjan r'enge?
- Ew r'eng **k'eske**.
- R'engê daran çawanin?
- R'engê daran **hêşînin?**
- Medine, ev r'eng çîye?
- Ew r'eng **reşe**.
- Hesp'a we çî r'engîye?
- R'engê hesp'a me **qemere**.
- E'zman çî r'engîye?
- E'zman **şîne**.
- K'a bi r'engê **sor**, tiştêkî bêje.
- Xûna meriva **sore**.
- R'engê tavê çane?
- R'engê tavê **zere**.
- E'ferim ji wer'a.

- Bavê min ji minr'a şaleke **sipî** k'iri.
- K'ume biraye min ji p'erçê **r'eşe**.
- Çêre dûrva **şîn** dike.
- Ala k'urda **k'esk', sor, zer û sipîye**.
- Birayê min xortekî dem **qemere**.



Pistî vekirin û sistbûna baranê, li rûyê asîman (e'zmîn) nîvgilovereke r'engîn dertê.

Bi k'urdî ji vêra *k'esk'esor* dibêjin. Ew tîrêjên tavêne.

T'îrejên tavê ji 7 r'engan pêk tîne. Dema t'îrejên tavê li hewa, di nav dilopên avêra derbaz dibin, dişkên. Wi çaxî her 7 r'eng jî tîne dîtinê.

Hûn dikarin prîzmayekê jî bidin bertavê û 7 r'engan bibînin.

R'engên *k'esk'esorê* û ala k'urdan gelekî nêzikî hevdune. Ew ji bo k'urda wek "ala t'ebîetê" tê h'ebandinê...

Wexta *k'eskesor* derdik'eve zar'ok bi hevra distirên:

Were, were k'esk'esor,

K'eskesorê bibînim,

Bilindve e'zmanê jor

Mişk û mar'a nebînim...

Spartin, pirs

1. Çend hevoka deftera xweda binvîsin û navê r'engan bidin k'ivşê.
2. Hûn *k'eskesorê* çî wextî dikarin bibinin?

K'îlamê zarokan

*Zarok destê hev digirin û
bî hevra distîrên:*

Ha Gulê...

De werin, em gula biçînin,
Ha gulê, ha gulê, gula min,
Xweş bîhnê jê hilînin,
Şengê, şoxê, r'uh'ê min.

Cot zerî avê tînin,
Ha gulê, ha gulê, gula min,
Agirê dila direşînin,
Ha gulê, ha gulê, gula min.

Lo dilo...

Emê îşev li k'ubîn,
Lo dilo, dilo, lo dilo,
Emê îşev li k'ubîn,
Sêfîlo dilo, sorgulo?

Ha li ser p'ira Qersêbin
Lo dilo, dilo, lo dilo, Ha
li ser p'ira Qersêbin
Sêfîlo dilo, sorgulo.



Gilîyên xweşik:

Q - *H'elalî û dilê paqij, balgîyê
herî r'ih 'ete.*

9 - *Ê zane k'arê xwe dike, ê ku
nizane qelfa dike.*

9 - *Çaxê p'isîk diçe, mişk dibe
ax'ê kulînê.*

9 - *Belengazî, k'asivîa'r nine,
t'embelî, şermê tîne.*

Sala T'eze

Namet naze,
Fincan k'ase,
Wê hat, wê hat,
Sala t'eze.

Xemil nexşe,
Şabûn xweşe,
Wê hat, wê hat,
Sala t'eze.

Miraz xweşe,
Bi h'ub r'eze,
Wê hat, wê hat,
Sala t'eze.

Ew bi leze, Tê
dibeze,
Bimbarekin, Sala
t'eze!

Çerkezê R'eş

NAVDÊR (îsim)

Navdêr çîye?

Xeberên ku nîşana tiştên r'uh'ber û ner'uh'ber dikin û cawa pirsên **K'î? Çi? K'î der?** didin, wan xeberanra **navdêr** dibêjin.

Di t'ebîetêda her hebûnek bi navekî tê nas kirinê.

Mesele:

R'emezan çu mal. **K'î?** - R'emezan.

K'iteb hogirê merivane. **Çi?** - k'iteb.

Almati ji Tarazê mestire. **K'î der?** - Almati.

Zimanê k'urdîda, alîyê me'nêva sê beşên navdêran hene.

a) Navdêren r'uh'ber, b) Navdêren ner'uh'ber v) Navdêren abstrakt (ne e'yan)

NAVDÊRÊN R'UH'BER

Navdêrên r'uh'ber navê hebûna zindîne, k'îjan bînê dikşînin û jîyan dikin.

Mînak:însan,bende, xûşk', bira, bav, dê, h'eywan, pez, rûvî, gur, hesp...

NAVDÊRÊN NER'UH'BER

Navdêrên ner'uh'ber tiştê ne zindîne û jîyan nakin.

Mînak: kevir, hesin, derî, k'itêb, defter, dibistan, bajar, gund, şev, tirî, hurmê, baran, ba, bager, sol, gore, k'inc, şûşe...

NAVDÊRÊN ABSTRAKT (ne e'yan)

Tiştê ku hebûna wan bi pênc organen seh'kirinê (**bihîstin, dîtin, te'mkirin, dest dayîn û bînkirin**) nayan k'ivşê, lê bi hebûna wan tê bawerkirinê, wanra dibejin navdêrên abstrakt.

Mînak: gune, bawarî, qencî, xîravî, mêranî, dostî, biratî, xewn, xem, xîyal, jîyan, k'eser, fikir, evîn, camêrî, hîvî, tirs...

LAZÎME EM BÎZANBÎN

Navên bajarên welatan, navçeyan (qeza-neh'îye), şexsan, çîyan, beh'ran, okîyanan, materîkan, golan, çeman û deştan bi tîpên mezin tene nivîsarê.

Mînak:

Serbajarê Qazaxistanê Astanaye. P'arlamena K'urdistanê li Hewlêrêye. Çîyayê Alataûyê bilinde. Gola Balxaşê li Qazaxistanêye.

Çemê Mûradê ji herêma Amedê derbaz dibe. K'urdistan welatê k'urdaye.

Moskva serbajarê R'ûsyaêye. Ez li bajarê Çîmkendê dijîm.

LÎ DERSA ZĪMANĒ K'URDĪ

Dersdar: Dembaş!

Xwendek'ar: Dembaş, mamoste!

Dersdar: Çawanin, zarokno?

Xwendek'ar: Zorspas, em başin.

Dersdar: R'ûnên, em desîbi dersê bikin. K'ê dikare bêje, dersa meya buhurî k'ijanbû?

Xwendek'ar: Dersa meye buhurî "Navdêr" bû.

Dersdar: E'li, derê ber t'extê nivîsarê û dersa xwe şirove bike.

Xwendek'ar: Navdêrevin: mal, kevir, K'emal, gund, pez, zebeş, sêv, dar û yêd mayîn.

Dersdar: Tu dikarî çend navdêrê rûh'ber û ne r'uh'ber bînî ziman?

Xwendek'ar: Belê, mamoste. Qîz, bûk, xort, Zînê navderê r'uh'berin. Çiya, p'irtûk, kevir, dar navderê ne r'uh'berin.

Dersdar: E'ferim, lawê min, keremke r'unê. Îdî k'î dikarê dersê şiroveke. Dildar, Huseyn, Sozdarê, Nazê û yêd din destê xwe bilind kirin.

Dibistana me

**Dibistan p'irxweşike,
Bi hogir û hevalan.
Bi nivîs û mamoste,
Bi çîrokê kal-bavan.**

F3

**Em h'emû jê h'ez dikin,
Ji bo zanîn kaniye.
Têda kenîn, leyîstok,
Dibistan xweş xaniye.**

Spartin

Derheqa dibistana xweda nivîsekê binîvsin.



S partin

Hevokê jêrînda navdêrê r'uh'ber bijbêrin, bins wan xêzkin (xetkin).

E'ysê k'eçeke p'orzere. Gulê keçeke bejinbilinde.

Destê E'yşêda qelem hene. Artûr diçe dibistanê.

Eylaz kurê Huseyne.

Hevokê jêrînda navdêrê ne r'uh'ber k'îjanin, binê wan xêzkin.

Ez îro çûme p'arkê.

P'arkê

Destê teda çend sêv hene?

sêv

Tu li parkê hêlek'anê sîyar dibî?

defter

H'evt liv defterê min hene.

Hêlek'an

Çîyaye Sîpanê bi dûmane.

Sîpanê

Çeto û Gulê

Çeto : R'ojbaş!

Gulê : R'ojbaş!

Çeto : Navê min Çetoye, navê te çîye?

Gulê : Navê min jî Gulêye.

Çeto : Gulê tu ji çi h'ez dikî?

Gulê : Lîstika aftoyan h'ez dikim.

Çeto : Ez jî ze'f h'ez dikim.

Ewana aftoyên minin, em herin.

Güle : Em qasekî bilfzin, paşê herin mal.

Çeto : Ze'f baş.



Pirs, Spartin

1. **K'itêb, qelem, defter** navdêrên ne r'uh'berin. Lê em çawa bizanibin ku ne r'uh'berin?

2. Çend navdêrên r'uh'ber deftera xweda binivîsin.



Fatê û T'êmir

- T'êmir:** R'ojbaş Fatê!
Fatê: R'ojbaş T'êmir!
T'êmir: Tu zanî, ez îro dik'evim şanzdeh salîya xwe.
Fatê: Çima îro, rojbûyîna teye?
T'êmir: Belê, ez gelekî mijûlim, hazîrîya xwe divînim.
 Emê êvarê pîrozkin, ez dixwazim tu jî bêy.
Fatê: Gelek şame, dayika xwera bêjim, paşê ezê bêm.
T'êmir: Tu e'se were, ha...
Fatê: Ezê bice'dînim...
T'êmir: Tu ku neyê ezê bixeydim.
Fatê: Nexeyde, ezê bêm.
T'êmir: Hivya teme, xatirê te.
Fatê: Oxirbe!

Desgirtiyaxortan

*Nalînek tê guhên mm, Lê
winda û nihane.*

*Agir berda dilê min, Tev bû
pêt û dixane.*

*Barek da ser milê min, Lê
barekl girane.*

*Dane ser hev kûlê min, H'emî
derd û belane.*

*Dengê k'êye dinalî?
Nale-nala walate.*

*Dikî gazi, dik'alî, R'abin çaxê
xebate.*

*Kurmanc, zaza, celalî T'ev de
çêkin tifaqê.*

*K'es xwe medin vî all îro roja
welate.*

Cegerxwîn



Li baxçê kulîlka


Navê min Êvêlnayê. Ez kulîlkan p'ir h'ez dikim. Îro ez ji xewê zû r'abûm. Ça ku dayika min gotibû, sibê zû r'abe, emê kulîlkan av bidin, lema jî ez sibê zû r'abûm û min taştê kir. Paşê ez tevî dayika xwe derk'etim nav baxçê ber malê û me t'evhev kulîlk avdan.

Dayika min yeko-yeko axa ber kulîlkan t'eze kir. Piştî ku kulîlkan av xarin r'engê wan hêşînbûn, vebûn, em şabûn. Kulîlk ji mera dik'enyan. Dayika min dibêje, eva baxçê Êvêlnayêye. Qîzika min jî weke van gulan bedewe. Ez jî çarna diçim gula baq dikim, ji dayika xwera tînim. Dayika min dibêje: «Tu kulîlka nava baxçe, rûnê bal min, tu dîr neçe»...

Spartin

Cawa van pirsê jêrîn bidin û binvîsin.

- | | |
|--|---------------------------------|
| 1- Êvêlna çi p'ir h'ez dike? | Êvêlna kulîlkan p'ir h'ez dike. |
| 2- Êvêlna çima zû r'abû? | |
| 3- Dayika Êvêlnayê êvarê çi gotibûyê? | |
| 4- Êvêlna sibê zû r'abû çi kir? | |
| 5- Êvêlna t'evî dayika xwe derk'ete k'êderê? | |
| 6- Piştî avdanê, kulîlk çawa bûn? | |



Li ber t'elêvîzonê

- E'vdile: - Qîza min, r'abe t'elêvîzonê bitemrîne, derenge.
- E'yşê: - Bavo, bira şano xilasbe, ezê bitemrînim.
- E'vdile: - Qîza min, şano h'etanî sae'tekê jî xilas nabe.
- Gulê: - E'yşokê, k'a te dersê xwe xandine?
- E'yşê: - Dayê, e'cele nîne, ezê paşê bixûnim.
- A'rif: - De hişbin, em şanoyê t'emaşe dikin, ji dengê we min qet tiştekan fêm nekir.
- E'vdile: - Kurê min, A'rif, ne wexta r azana te hatîye. Ev çi h'ale, h'etanî nîvê şevê şanoyê t'emaşe dikî.
- A'rif: - Ça bikim bavo, xewa min nayê.
- Guiê: - Lê çima, wexta dersê dixûnî xewa te zû tê?
- E'vdile: - Zûka. t'elêvîzonê bitemrîne! Qîza min r'abe dersa xwe bixûne, A'rif, tû jî r'ast here t'ek'êve cîyê xwe.
- E'yşê: - Lê bavo, ev şanoyeke p'ir xweşe...
- E'vdile: - Qîza min, ev ne sae'ta şanoyêye, lazime tu niha li ser dersê xwe bî, birayê te jî nav cîda be, ez çî dibêm, wî bikini A'rif, ca dîya xwera bêje şevbaş!
- A'rif : - Şevbaş, dayê!
- Gulê: - Şevbaş, kurê!
- E'yşê: - Şevbaş!
- E'vdile: - Şevbaş, qîzam, dersê xwe baş bixune.

Cinsê (Zayenda) Navdêran

Zimanê k'urdîda cinsê (zayenda) her navî heye. Hinek nav mêne; hinek jî nêrin. Em ji navên /nê-ra dibêjin mêzayîn û ji navên nêr-r'a jî dibên nêrzayîn. Zimanê k'urdî wekî organîzmake zindîye, lema her tişt cinsêva tê k'ivşê. Nava gelda ne maqûlîve jî, çawa ku «**lolo**», «**lêlê**» têne cudakirinê «**lolo**» (nêrzayîn), «**lêlê**», (mêzayîn). **Navên nêrzayîne** sereke evin:

(Navê merivan)

Mêr, kur, xort, bav, bira, xal, ap, kurxal, kurap, zava, bûra, xwarzî, birazî, pismam û yên din.

Mêrê qenc, kurê p'ak, bavê E'îlî, birayê hevalbend....

(Navê heywanan)

Beran, bûm, nêrî, dîk, piling, şêr, ða, gur, k'er, hasp, hîrç, k'uvî, çêiek... Beranê malê, bûmê ser darê, nêrîyê yeksale, dîkê zer, gayê goştî, gurê har, gurê çila, hespê boz, hirça sipî, şêrê şêra...

Navên mêzayîn:

(Navê merivan)

Jin, keç, dê, bûk, jinap, Jinxal, met', xatî, xûşk, kevanî, pîrik, dayîk, dotmam...

Jina bedew, keça r'ind, bûka xemilî, jinapa min, met'a Nûrê, pirka te, dayika min...

(Navê heywanan)

Nogin, çêlek, mî, bizin, dêlegur, r'ûvî, mirîşk, me'în, berdîr, k'uvî...

Çêleka bî şîr, bizina k'ol, dêlegura dirantûj, mirîşka hêka, me'îna k'umeyt, xam berdîr, k'uvîya bilincîya...

LAZÎME EM BÎZANBÎN

Navdêrên nêrzayîn qertafa (p'irtik) (**ê, o,**) navdêrên mêzayîn qertafa (p'irtik) (a) digirin. Ev yek dema di hevokêda tê şixulandinê dîyar dibe.

Hine navdêr jî him qertava mêza û him jî qertava nêrza digirin:

Heval, mamoste, nivîsk'ar, doxt'or, zanyar...

Hevalê qenc. Hevala qenc. Mamosteyê zane. Mamosteya zane.

Nivîsk'arê e'yan. Nivîsk'ara hezkiri. Doxt'orê baş. Doxtora zaroka...

Mesele:


E'h'medê H'ecî (nêrzayîn)

Narîna Silêman (mêzayîn)



Dara xurmê (mêzayîn)

Çîyaê bilind (nêrzayîn)



Heywanên jêrîn k'îjan mêzayînin (dizên) k'ivş bikin.




	Nêrî
X	Çêlek
	Hesp Hespê nêr (fe'l)
	Mirîşk
	Dîk
	Beran
	Beraz (xinzîr)
	Me'în



Heywanên jêrîn k'îjan nêrzayînin (nazên) k'ivş bikin.



	Golik
	Mî
X	Gur
	Hirç
	Ga
	Dêlegur



Navê heywanên nêrzayînin û mêzayînin hînbîn, û deftera xweda binivîsin.

Di ve nivîsara jêrînda navên nêrzayîna k'ivş bikin:

P'ir-hindik li nav beyaran meşî,
Rastî wî hat birakê r'ûvî.
Li h'alê wî nihêrî û berda k'eser,
Got: Vê sala xerab k'ûda herî k'er.
Li wî p'ir zor hat, wexta jêr'a got k'er,
Got k'erê kurtanzer, sinîk ceh li ber.

Hinek din meşîn gelî û kendal,
Beran û dîk jî wanra bûn heval.
Hinek din meşîn bintara çîya,
K'ewrîşkê bejî wanra gîya.
Teva xwe kir yek bi soz û gilî,
Dîk û k'ewrîşk, beran û r'ûvî.

Li jêrîn k'îjan nav mêzayînin k'ivş bikin

Hebû p'îrek bejinkin,
Diran ferş bû nola cin.
K'ofi li ser serê wê,
Pêşmala nan li ber wê.
Hevîr tevda kir girêk,
Gilover kir mîna hêk.

R'ast kir li binê teştê,
Êzing anîn ji deştê. Avêt
hundirê tendûr, Agir lê
nebû ilûr.
Çûkê beytik firî hat, Li wê
pîre mabû mat.

Cegerxwîn

ZIMANÊ K'URDÎ

Bi xemil, r'ewşe,
Şîrîn û xweşe,
Zimanê k'urdî.

Qezel, helbeste,
Şemdana destê,
Zimanê k'urdî.

Bi nexş awaze,
Letîf û naze,
Zimanê k'urdî.

Beyta Feqîye,
Sewta Xanîye,
Zimanê k'urdî.

Gewgewê çîyaye,
K'ubara teyraye,
Zimanê k'urdî.

Şikoyê H'esen

Spartin

Helbesta «Zimanê k'urdî» deftera xweda binivîsin û ezberkin.

Formên h'alê navan

Di zimanê k'urdîda şeş h'alê formê navên hêyînî hene:

- 1- H'alê r'ast (nomînatîf),
- 2- H'alê gazîkirinê (bankirinê),
- 3- H'alên tewandî (tewangî yan jî h'ale civane),
- 4- H'alê hevra,
- 5- H'alê bi t'evayî,
- 6- H'alê cî-war.

Du cûre guhestina navan di zimanê meda hene.

- 1- Cûrektê h'esabkirinê guhestina navên li sere'slê mê (jin).
- 2- Cûrek jî tê h'esabkirinê guhestina navên ser e'slê nêr (mêr).

Mesele:

- a) qîzka delal, keça k'urda, xûşka e'zîz, dayka p'orsipî...
- b) xortê bejnbilind, merxasê K'urdistanê, biraye dilovan, xalê baş...

H'alê r'ast

Ji wî h'alîra dibêjin h'alê r'ast, yê ku nehatîye guhestinê, cûrê wî, forma wî çawa heye usa jî r'ast maye. H'alê r'ast cawa (bersiva) van pirsan dide: K'î? Çi?

Mesele: Min k'î dît? Min xort dît; K'î k'itêbê dixûnê? Keçik k'itêbê dixûne; K'î k'inca dişo? Jinik k'inca dişo; Çi k'et? Kevir k'et, berf k'etîye; K'î hat? Sertîv hat.

H'alê gazîkirinê (bangkirinê)

Ji wî halê navra dibêjin h'alê gazîkirinê, yê ku forma wî nîşan dike, ku merivek gazî merivekî dike, yan jî bi tiştekirî xeber dide; bona halê gazîkirinê p'irtika ê, zêdeyî ser dawîya xeberê, ser e'slê jin dibe. Lê pirtika o zêdeyî ser xeberên e'slê mêr (nêr) dibe.

Mesele:

- a) Keçikê, were vira. Xûşkê, tu dengê min nabihîzî? Male tu xirabbî. Dayê, tu k'uda diçî?
- c) Xorto, navê te çîye? Welato, tu şênbî! Bavo, tu ji k'ê derê têy? Şivano, tu xweş şivanî! Kono, tu konê k'êyî? Lolo, tu çî dikî?

H'alê_tewandî_(tewangî-civane)

Ji wî h'alê navara dibêjin h'alê tewandî (tewangî-civane), yê ku forma h'alê wî r'ast hatîye guhestinê, tewîyaye, hatîye civandinê, yanî r'engê xweyî r'ast guhestîye.

H'alê tewandî cawa (bersiva) van pirsan dide: **K'ê kir? Çi dikî? Ya k'êye? Yê k'êye? Li k'î derê? Ji k'ê derê?**

Mesele: **K'ê xebat kir?** Caw: Keçikê xebat kir; **K'ê xwend?** Caw: Xort xwend; **Tu çi dikî?** Caw: Ez k'itêbê dixûnim; **K'itêba k'ê bidim te?** Caw: K'itêba mamoste bide min; **Tu li k'ê derê rûniştîyî?** Caw: Ez li odê rûniştîme; Tu diçî k'ê derê? Caw: Ez diçime bajêr.

H'alê hevra

Ji wî h'alîra dibêjin h'alê hevra, yê ku di xebirdanêda kirina bihevra nîşan dike. Yan jî verêkirinê û cî-warê kirine nîşan dike. H'alê hevra bi alîk'arîya paşkoka **r'a** tê çêkirinê. Li pêşîya navê bi forma h'alê bihevra bernavênû, **bi** têne xebitandinê ku fikra h'alê bihevra safî û zelal dike. Ji k'êr'a? bi k'êr'a, ji k'ê derêr'a, li nav çir'a, li ser çir'a û yêd din.

Mesele:

Te k'itêb ji k'êr'a kirîye? -Min k'itêb ji birê xwera k'irîyê; Ewî gilî ji k'êra got? -Ewî gilî ji Semendr'a gotin; Hesp li k'ê derêr'a çu? Hesp li ber derîr'a çû; Zarok bi kêr'a çûn? Zarok bi Almasêra çûn; Esker k'êderêr'a hat? Esker li nav daristanêr'a hat; Ew bi k'êra dixebitin? Ew bi hevra dixebitin.

H'alê t'evayî

Ji wî h'alîra dibêjin h'alê t'evayî, kirina (bûyîna) t'evayî k'ivş dike, cîyê kirinê û qewmandinê nîşan dide, ew cawa van pirsan dide: K'êva? Bi k'êva? Çiva? Bi çiva? K'îderêva?

Mesele:

P'işik ç'iva hilk'işîya? - P'işik darêva hilk'işîya. Hûn k'êva Almatê diman? - Em bi malbetêva Almatê diman. Belg ç'iva zeliqî? - Belg tex'teva zeliqî. Ewî hesp k'êdereva girêda? - Ewî hesp stûnêva girêda. Tu bi k'êra çûyî mal? - Ez Leylêr'a çûme mal. Qîr k'êva zeliqî? - Qîrteva zeliqî. Tu k'îderêva derk'etî? -Ez newalêva derk'etim.

H'alê cî-war (lokatîf)

Ji wî h'alîra dibêjin h'alê cî-war, yê ku bi alîk'arîya paşkokada tê çêkirinê û nîşan dide cî-warê kirinê; Ew bersiva van pîrsan dide: Li (di) çida? Li (di) k'êda? Li k'ê derê? Li k'îjanda?

Mesele:

Av li çida heye? -Av li cêrda heye; Tu li k'ê derê bûyî? -Ez li bajarê Wanê bûme; Em di bajêrda dixebitîn; Wan dirava di navhevdarîyê p'aravekin; Li Almanyanêda k'urd gelek dijîn. K'itêb û kovarê k'urdada tiştên baş tene nivîsandinê, wan bixunin; Tuyê serwext bibî, çima zimanê k'urdî şîrîne.

H'al	Jimara yekanî	Jimara p'iranî
1- H'alê r'ast	K'itêb jin	K'itêb jin
2- H'alê gazîkirinê	K'itêb jinê	K'itêbno jinno
3- H'alê t'ewangî	K'itêbê jinê	K'itêban jinan
4- H'alê bihevra	K'itêbêra jinêra	K'itêbanra jinanra
5- H'alê bi t'evayî	K'itêbêva jinêva	K'itêbanva jinanva
6- H'alê cî-war	K'itêbêda jinêda	K'itêbanda jinanda

H'al	Jimara yekanî	Jimara p'iranî
1- H'alê r'ast	mêr gund	mêr gund
2- H'alê gazîkirinê	mêro gundo	mêrno gundno
3- H'alê t'ewangî	mêr gund	mêran gundan
4- H'alê bihevra	mêrr'a gundra	mêranra gundanra
5- H'alê bi tevayî	mêrva gundva	mêranva gundanva
6- H'alê cî-war	mêrda gundda	mêranda gundanda



Mal beta me

Malbeta me mezine. Bavê min, dayika min, du bira û xûşkeke min hene. Kali κ û pîrika min jî mera dijîn. Apê min, xalê min, meta min û xatîya min zû-zû têne mala me mêvanî.

Îro malbeta meda şaiye. R'objûyîna birê minî Meh'mûde. Em gişk şa dibin. Kalikê min xeber dide. Gişk guhdarîyê wî dikin. Dûr'a kalikê min ji xûşka min pirsî:

-Kubar, tu li k'êderê dixebitî?

Xûşka min bersiv da:

-Mek't'ebêda, dersdara zimanê k'urdîme. Şagirtên min r'ind dixûnin. Îsal ji dersxana min şeş zar qebûlî xandina bilind bûne.

Kalikê min got:

-Dibistana weda xêncî zarokên k'urda, îdî zarokê k'îjan miletan dixûnin?

K'ubarê got:

-Zarokê qazaxa, ûrisa, almana, korêya, t'irka, azerîya, ermenîya û yêd din.

-Kalikê min pirsî:

Hûn hevra bi k'îjan zimanî diaxivin?

-Bavo, em t'ew jî zimanê qazaxî zanin.

Pirs û spartin

Cawa van pirsan bidin.

- 1 - Malbeta we çend neferin?
- 2 - K'î hatibûne, mala we mêvanî?
- 3 - Ji bo çi, qewmê we hatibûne mal?
- 4 - K'ubar li k'û dixebite?
- 5 - Dibistana weda zarokê k'îjan milleta dixûnin?

Ji nivîsara jorîn çend xebera bibijêrin, bi awayê banga deftera xweda binivîsin.

Ez xwendek'arim

Navê min Alane. Malbeta me gelek mezine. Bavê min, dîya min, birayên min û xûşkên min hene. Bavê min k'arsaze. Cîyê xebata wî ze'f mezine. Dayika min doxtire. Xûşka mj_{ne} mezin dersdare. Birayê minî mezin diçe ûnîvêrsîtêtê. Ew dixwaze bibe r'ojhilatzan. Dîrok û çanda k'urd û K'urdistanêva mijQibe. Ez jî diçim dibistanê. Ez di k'oma sisêyanda dixûnim. Mamosteyê min, ji min gelekî h'ez dike. Ji minra dibêje tu gelekî aqjlf

Dibistana me nêzîkî mala meye. Dor-berê dibjstana me darin, hêşînayîye. Li k'êleka dibistana me parka zarokan heye. Wexta ku ders xilaz dibin, ez t'evî hevalê xwe tême m\$|

Ev birayê minî mezine. Navê wî E'slane. Di ûnîvêrsîtêtêda dixûne. Ûnîvêrsîtêta wî li alfyê bajarê Almatêyî r'astêye. Ezê jî mezin bibim, dersê xwe baş bixûnim, bik'evim ûnîvêrsîtêtê, wekî bibim doxtir.

Hevalê min

Hevalekî minî ze'f baş heye. Navê wî Huseyne. Ew hê yanzdeh salîye. Li bajarê Çîmkentê dijî. Havînê rnêvanî tê Almatê, mala me. Cama minra nama dişîne. Ez jî cavva namen wî didim. Mala wane li Çîmkentê gelekî mezine. Dor-berê mala wan baxçeye. Wekî di nama xweda dibêje, ew ji кщтiкaп p'ir h'ez dike. Ez jî kulîlkan ze'f h'ez dikim.

Min duh jêr'a namek şand. Di namêda min jê xwest ku ew minra navê kulîlkên wî bajarî hene binvîse û bişîne.

Ewê ji minra navê kulîlka bişîne, ezê jî wîra şiklê kulîlkên baxçê me bik'işînim û bişînim.

Ez niha li hîvîya nama wî me.

Spartin, Pirs

Derheqa malbeta xwe û hevalê xweda hûr-gilî gisekin.

Hûn jî hevalê xwera nama dişînin? Pê întêrnêtê bj hevdura diaxivin?

Malikên jêrînda k'îjan yekjimarî k'ivş bikin.



()	()	()	()
Neferên malê	Jinên k'urd	Zaroka aqil	Qîzika delal

Malikên jêrînda k'îjan pirjimarî k'ivş bikin.



()	()	()	()
Helbestvanekî navdar	Doxtir û zarok	Zarokên bedew	Qîzikên r'eqasvan

Spartin

H'alê yekjimar û p'irjimar deftera xweda binîvsin û nava hevokada bidine k'ivşê.

Xidirnevî

(cejna k'urdaye kevnar)

Bi gotina gotîya carekê Xizir (Xidir) t'evî Eylaz (navê p'êxemberane) ji çîyayê Qaf derbaz dibin, çol û bestar'a diçin digihîjine cîkî xilî-xalî. Avê digerin, ava jîyanê (nemirînê) - ava k'ewserê... Diçin digihîjin beravakê, nanê xwe derdixin, sivrika xwe r'adixin û hedî-hedî duxun. Nava tûrikê wanda masîyê k'elandî jî hebûn. Hevalek t'asa xwe dixê avê, dixaze avê vexwe, dilope av dipişike ser masîyê pijiyayî. Masî sax dibe, r'uh tê ber, ew xwe davêje çem û diçe. Xizir jî, Eylaz jî met'el dimînin çavê hev dinherin û paşê tê derdixin kû ew ava ku lê digerin, ava nemirine eve. Ewane her yek t'asek ji we avê veduxun. Anagorî legendayê (efsanê) Xizir (Xidir) jî Eylaz jî h'eta r'oja îro jîyan dikan. Yek ji wan ser e'rdê, yê dine ji ser avê jîyan dike. Salê carekê, wê r'oja kû r'astî hev hatibûn, ava k'ewserê vexaribûn tèn cem hev, xêr-dua xwe li t'ebîyetê û merivayî dikan. Ew r'ast hatin û yekiya wan herdu p'êxembera bûya sembola, jîyan û hişyarbûnê. K'îjan di nava gelda h'eta îro jî çawa ku cejna Xidirnevî te' derbazkirinê.

Cejna Xidirnevî her sal dawîya zivistanê, destpêbûna biharê, dawîya meha sibatêda tê pîrozkirinê. Wê r'oja pîroz her k'es mala xweda şayê derbaz dike, şirînayê cuda-cuda çêdikin, kulora, k'ada dipêjin, qilênka diqilînin, zarok hêka sor dikan, hevdû dixin, ji hevdû dibin û şa dibin... Qewm - lêzim, der - cinar, keç û xort p'êşkêşa didine ji hevra. K'esên ji hev xeyîdî tèn cem hev. T'ebîyet jî wê r'ojêda hişyar dibe, cebre (germayî) dik'eve e'rdê, germayî usa jî dik'eve r'uh'e însanan. Hulm- gulma baharê dik'eve e'rdê. T'ebîyet r'ojbi - r'oj bedew dibe. Benî - însan lema jî xwe h'esab dike ewledê Adem û Xizir (yanê bûyîn û jîyanê)...

Tiştonek

Ser şeye,
Dûv meqese:
Bêje k'a ew çîye?



Gotinên hemtîp (omonîm)

Xeberên ku nivîsar û gotina wana yeke, lê me'na wana cudaye, wan xeberanra dibêjin xeberên hemtîp.

Mesele: t'op; (t'opa lîstike, t'op -çek, t'op -t'opa dinê) û yêd din.

Çav; (çavê xênî, çavê merîya, çavê kanîyê). K'ar; (eze k'ar bikim.

Min ji ve bazare tu k'ar hilneda).

Ser; (serê merîya, serê kanîyê, serê gund, serê çîya, serê dîwêr).

Zar; (ez ji zar-ziman k'etim. Zar'a min nexweşe, ezê bibime doxtir. Zar-zara nerdîyê).

Ber; (Berê dayikê, berîyê merîya /pêşî/. Berê darê. Zarokê berê dayika xwe mêt. Min berê xwe da r'ojhilat. Îsal berê darê p'ir girtîye. Berîyê wî mêrne başbûne).

Gotinên wekhev (sînonîm)

Xeberên nivîsara wana cudaye, lê me'na wana nêzîkî heve, vanra dibêjin xeberê wekhev.

Mînak:

rind, p'ak baş

Ew keçekî r'inde. Apê E'lî merîkî gelekî baş û p'ake. Deynê her k'esîye ku p'ak'îyê bike.

E'gît, mêrxas, e'fat û qeh'reman;

E'gît **mêrxasê** k'urdane; Bek'ir Mustefayevê k'urd Mêrxasê Tifaqa Sovyetêye.

Apê K'eleş ji boy azadiya K'urdistanê **e'fatî** kirîye. Her k'es nikare **e'gîtîyê** bike.

Merîxapandî, vir'ek, derewîn;

E'h'med merîkî **derewîne**. Heyder merîkî **vir'eke**. Ji zimanê H'eso gilîkî r'ast dernayê, tim **vir'a** dike.

E'gîtî hewşa mêrane.

Dibistan, zanîngeh, xwendegeh.

Dibistan weke mala meye. **Zanîngeh** gelekî şîrîne. **Xwendegeh** cîyê hînbûnêye. **Dibistan** ji bo me r'onahîye.

Spartin

МЯНВНИИВИВВЯИВ

Çend xeberên omonîmî û sînonîmî bêjin û nava hevokada bidine xebatê.

Gotinên dijrabber (antonîm)

Wan xeberanra dibêjin xeberên dijrabber, yê ku bi me'nêva muqabilî hevîn û fikrek, fikra dinêra berovajîye.

Mesele:

pakî-xirabî, şev-r'oj, seri-binî, te'l-şirin, Jor-jêr, germ-sar, qewat-sist, qelew-jar, pir-hindik, îro-sibê, bedew-nerind, sipî-r'eş, erzan-biha, zirav-qalim, zû-hêdî û yê mayîn.

P'akî-xirabîya merîya e'melê wanda tê k'ivşê. Silêman eşyayên xwe berav kir û got: «**îro-sibê** ezê r'êk'evim». Ez p'ir acizbûm, îro ezê herime bazarê **erzan-biha** çêlekekê xwera bik'irim. Mala meda ava **germ-sar** heye. **Şîn-şayî** birê hevîn. **Mezîn - çûkê** gund qedirê apê Zîyoê Bedirxan digrin.

Ba de'wete, hêsrâ e'wra jî baran, Her şayê şînek heye, her usan. Tim p'êşê însane, h'ub û h'izkirin Şin û şayî jî hev naên kirin.

Wezîrê Nadiri

Xort û kalê

Carekê xortek gayê xwe bar dike, dik'eve r'ê û berbi gund diçe. R'êda r'astî kalekî tê û ji wî dipirse:

-Apo, tu nizanî ezê k'îngê bigihîjime mal? Ez ji gundê Qeşge - bûlaxême.

Kalê divêje:

-Kurê min, wekî tu hêdî bajoy, tê zû bigihîjî gund. Wekî tu bilezînî, tê dereng bigihîjî mal.

Xort hew zanibû ku kalê laqirtîyê xwe pê dike. Guh neda xebera wî gayê xwe da ber şiva zû - zû ajot, jê derbazbû. Lezand ku bigihîje mal. R'eda gayê wî westîya û mexel hat. Kalê gihîşte xort, dît ku gayê wî mexel hatîye.

Kalê h'alê xort dît û got:

-Ne min got nelezîne, wek usane de cefê xwe bik'îşîne.

Xort got:

-Kalê, lema te digot zû - zû bajoy tê dereng bigihîjî mal? Apo, gilîyê te r'aste.

Bavê, min jî time digot: «Lez nek'evî, hêdî herî, tê zû bigihîjî, bilezînî, bi leza tu nagihîjî miraza...»

S partin

Helbesta jorînda dijpêyva bijbêrin û binê wan xez kin. Van xeberan di nava hevokêda bidine xebatê û deftera xweda binvîsin. **Bilind-nizim, şîrîn-te'l, şev-r'oj, germ-sar, zû-hêdî, qalim-zirav.**

Van xeberan cîh bikin

Her hevokêda cîyek valaye, ji nava malikada bersivên r'ast bijbêrin û dî nava hevokêda cî-war bikin.

1. Lazime em qedrêbizanbin.	gelek
2. Welatê meriva merivane.	xwarinên
3. E'h'medê Xanî..... k'urdane.	bajarê
4. Ez t'emaşekirina..... p'ir hez dikim.	gelên
5. Apê Silêman.....dewletîye.	hatime
6. Li çîyayê Alataûê.....heye.	r'ûspîyê
7. Berf zivistanêdibare.	p'ir
8. Lazime însan ji h'ez bike.	şaîrekî
9. Meriv zimanê k'urdî hîn bibe.	ala
10. Dayika minxweş çêdike.	dibistan
11. Astana..... Qazaxistanêye.	k'edî
12. Li K'urdistanêcuda zehfin.	baş
13. EzliAlmatê dinê.	hêlîna
14. Yê ku gotinên pêşîyan gotine berêne	pêncî
15. K'ilamêngelekkweşin.	herim
16. K'esk, sor û zer k'urdaye.	heywanan
17. Pişik heywanekeye.	dikare
18. Bavê minxwendîye.	berf
19. Em mamosteyê xwe..... guhdarî dikin.	t'êlêvîzyonê
20. Dibistana meda xwendek'ar hene.	mezinan

CÎNAV (PRONAV)

Ji wan xeberanra dibêjin cînav, yên ku li şûna navên merîyan û tiştan têne xebitandinê. Di zimanê k'urdîda deh cûrê cînava hene:

- 1- Cînavên k'esan.
- 2- Cînavên nîşankirinê.
- 3- Cînavên serxwe.
- 4- Cînavên hevduditiyê.
- 5- Cînavên pirsan.
- 6- Cînavên hevbendiyê.
- 7- Cînavên meriv û tiştên nebîne (ne ber cavan).
- 8- Cînavên meriv û tiştên bîne ber cavan.
- 9- Cînavên çendî-çiqasîyê.
- 10- Cînavên kevn.

Cînavên k'esan

Cînavên k'esan wan cînavanra dibêjin ku, yên li şûna navê k'esekî, tişteki têne xebitandinê. Di zimanê k'urdîda du k'omên cînavê k'esan hene:

- 1-Cînavên k'esanî yên yekemîn h'alê r'ast.
 - 2-Cînavên k'esanî yên duyemîn h'alê tewandî.
- Herd k'om li hejmaraya yekanî û p'iranîda ji hev têne cuda kirinê.***

Cînavên k'esanîye h'alê rast evin.

		P'iranî
I	Yekanî Ez	Em
II.	Tu	Hûn
III.	Ew	Ew, ewana
Cînavên k'esanîye		h'alê tewandî

	Yekanî	P'iranî
I.	Min	Me
II.	Te	We
III.	Ewî, wî, ewê, wê	Wan, ewana

Lazime_em_bizanbin.

- Cînavê k'esaniye k'oma t'ewandî **ewi, wi** li şûna navên nêrzayîn û mêrzayînda didine xebitandinê. **Ewi** (wi) merivî got; **ewê (wê)** jinê nivîsi, **wî** sîyarî êvarda xew nekir. **Wê** keçê p'orê xwe şekir.
- **Guhestina cinavên k'esan vî cureyî têne çêkirinê:** Cînavên h'alê r'ast (**ez, tu, ew, em, hûn, ew, wan**) û cînavên h'alê tewandî ji nav têne cuda kirinê bi wê formê, ku pêşpirtikên **r'a, va** û **da** dik'evine axirîya cînavên tewandî (**min, te, wî/ewî, ewê/, me, wê, wan/wana, ewan/y.**

Minr'a, ter'a, ewîra, ewêra;


Mer'a, wer'a, wanra;

Minva, teva, ewîva, ewêva;

Minda, teda, ewîda, ewêda (wîda, wêda)

Dûmeqesk

Dûmeqesk cînara me,
Wê hergav bê mala me,
Em çi bikin, çi nekin,
Emê jêr'a hêlînê çêkin,
Wê bik'eve baxçê me,
Wê bik'eve cegerê me,
Û nahêle p'ara me.



Berxvano



Berxvano, berxa bîne,
Tu cîyê xwe biçêrîne,
Dayika te qurbana te,
To bide ser nanê te.
Berxvanê me delale,
Desteka wî kara çale.
Êvarê bîne malê, Ez
qurbana bejn-balê!

Hevokên jêrînda cînavên k'esan yên h'alê r'ast k'îjanin bidin k'ivşê.

Mesele: *Tu* ji xwe gelek h'ez dikî.

1- *Ez îro diçim mala mamoste H'esen.*

2- *Hûn li k'îjan alî r'ûdinên?*

3- *Ew k'îngê diçin bajarê Astanê?*

4- *Em îro naçin dibistanê.*

5- *Tu gilîyên dayika xwe guhdarî dikî?*

6- *Ew çima jî te p'ir h'ez dike? _____*

Van hevokên jêrînda cînavên k'esan, yên h'alê tewandî k'îjanin bidin k'ivşê.

Mesele: Wan r'oja xwe bi k'êf û e'sq derbaz kir.

1- *Were mala me, sêva bixwe.*

2- *Min duh xwahn bir mala cînara.*

3- *Te k'îngê E'h'med dit?*

4- *Wê çend k'îlamê k'urdîye xweş stiran.*

5- *We dengbêj K'azo guhdarî kirîye?*

6- *Wî destê dê û bavê xwe paç kir.*

Spartin

Cînavên h'alê r'ast û tewandî deftera xweda binvîsin û pê hevoka avakin.

Van hevokên jêrînda k'îjan cînavên eleqetîyêne, bijbêrin û binê wan xêzkin.

Mesele: Ev defter ya mine. Mesele: Ev çem ye meye.

1- *Ev t'izbî ya mine.*

2- *Ev k'itêb ya teye.*

3- *Ew mal ya wêye.*

4- *Ew dikan ya wîye.*

5- *Ev mal ya meye.*

6- *Ew p'irtûk ya weye.*

7- *Ev xwarin ya wane.*

1- *Ev şal yê mine.*

2- *Ev hesp yê teye.*

3- *E w dik yê wêye.*

4- *E w da yê wîye.*

5- *Ev çiya yê meye.*

6- *Ew kûçik yê weye.*

7- *Ev beran yê wane.*



Du heval

(*Ji zargotina cimae'tê*)

Hebû, t'unekû du hevalê nêzîk hebûn. Navê yekî H'eso bû, navê yê din Keso. R'ojekê ewana diçine daristanê, wekî karîya beravkin. Diçerîn, karîya xwer'a berav dikin, dixazin veqerî mal, nişkêva hirçek ji nava k'ola derdik'eve peşîya wan. H'eso hevalê xwe dihêle, ji tirsê zû hildik'işe ser darê. Keso nizane çî bike. Hirç îda nezîk dibe, dixaze lepê xwe bavêje wî, le Keso natirse, xwe davêje e'rdê, vedileze û xwe mirî davêje. Hirç tê, wî dinhêre, bîn dike, guh dide ser bîna wî, bawar dike ku ew r'astî jî mirîye û dihêle diçe. H'eso dinh'ere, ku hirç çu, lez xwe ji ser darê davêje e'rdê û ji Keso dipirse: «Hirçê tu bînkirî, dora te çû-hat, guhê teda çî got?»

Keso: «Hirçê got, carke din jî hevalê usayê xiravr'a hevaltîyê neke, ît'bara xwe pê neyne, pêra neçe daristanê...»

Kal û bava gotîye:

Şûşa dil ku şkest nacebire.

Şîna t'evî hevalan şayîye.

Dostê çê di r'ojên tengasîyêda kêrî mirovan tê (xwe dide naskirinê).

Du dost bi hevra r'astbin, yê sisyan xwedêye.

Hevaltî bi r'astî.

Hevalê xirab, kulla p'arxanêye.

Dostê xêr ji brayê bêxêr çêtire.

Hevokên jêrînda cînavkên sade hene, ya destpêkê binê wê xêzkişîye, hûn jî yê mayîn xêz bikin.

Gulîzera piçûke h'eft salîye. Ew li Almatê ji dîya xwe bûye. Bavê wê sibê zû diçe k'ar, dayika wê li mal dimîne û k'arê malê dike. Gulîzer diçe k'oma yekê. K'êfa wê ji dibistanê'a ze'f tê. Ew ji mamosteya xwe p'ir h'ez dike, her gav ew gîmetê baş distîne. Gulîzer qîzeke ze'f aqile, sê zimana zane. Qazaxî, ûrisî û k'urdî. Ew dertê devra hevalê xwera dilîze û wanra bi qazaxî xeber dide.

Hevokên jêrînda cînavkên tewandî bijbêrin û binê wana xêz bikin.

Ev Qasoye, eva jî xûşka wî Meryeme. Îro ji bajêr hatine, wekî ku li nav baxçê gundda k'êf û e'şqa derbazkin. E'zîz apê wane. Mala wî li gunde. Ew ji Qaso û Meryemê gelekî h'ez dike. Carna wan tîne gund, ku bi wan şa bibe. Wexta Qaso û Meryem tîne gund, p'ir şa dibin û ji xwera dilîzin. Carna jî diçîne bax'çê nava gund.

*****4*****L^Vr^Wwif

Adrês pirsîn

- Bibexşînin!
- K'eremkin!
- Stansîya aftobûsan k'êderêye?
- Tu dixazî herî k'êderê?
- Ez dixazim herim Bîşkêkê.
- Wê wextê divê tu herî gola Seyranê. Stansîya atobûsa li wire.
- Ez çawa dikarim herime gola Seyranê?
- Li vê r'awestgehê hîvya aftoya bisekine, aftoyên hejmara 503 tîn, lê sîyarbe, wê te bibe wira, wekî din jî h'ejmarên 402 û 333 jî diçin wira.
- Zor sipas!
- Sipasxweşbî!



Hevokê jêrînda cînavkê sade hatine derxistinê, hûn t'emam bikin

- | | |
|------------------------------|---------------------------------|
| 1- <i>Tu çend salîyî?</i> | <i><u>Ez</u> h'eyşt salîme.</i> |
| 2- <i>K'î hevalê mine?</i> | <i>.... hevalê <u>mini</u>.</i> |
| 3- <i>K'ê li vira bû?</i> | <i>.... li vira bû.</i> |
| 4- <i>K'ê bi avtoyê hat?</i> | <i>.... bi avtoyê hatin.</i> |
| 5- <i>K'î r'ûniştîye ?</i> | <i>.... r'ûniştîye.</i> |
| 6- <i>K'î ji mal h at?</i> | <i>.... Ji mal h at.</i> |

Hevokê jêrînda cînavkê tewandî hatine derxistinê, hûn t'emam bikin.

- | | |
|------------------------------------|-----------------------------------|
| 1- <i>Ev qelema k'êye?</i> | <i>Ew qelema <u>mine</u>.</i> |
| 2- <i>K'ê defter ji te sitend?</i> | <i>.... defter ji min sitend.</i> |
| 3- <i>K'ê tendûrêda nan pe't?</i> | <i>.... tendûrêda nan pe't.</i> |
| 4- <i>K'ê pamîdor k'irîn?</i> | <i>.... pamîdor k'irîn.</i> |
| 5- <i>K'ê sêvên bax'çe anîn?</i> | <i>.... sêvên bax'çe anîn.</i> |
| 6- <i>K'ê xwarin çêkirîye?</i> | <i>.... xarin çêkirîye.</i> |
| 7- <i>K'ê zarok civandine?</i> | <i>.... zarok civandine.</i> |

Têderxistinok

Tiştêkî min heye tiştonek,
Dinya h'emû têdaye.

Ew çîye?

huG

Ew çîye ku, mehê carekê kal dibe,
Dimire û paşê sax dibe?
Ew çîye?

Xware, ne dare,
Dik'ale, ne kare,
Dixuşe ne mare.
Ew çîye?

meÇ

Vî alî dîwar, wî alî dîwar,
Têda girêdaye seyêkî har.
Ew çîye?

vîH

namiZ

Apê minî lingekî,
Çû ber gar'ana gundekî,
Ew çîye?

tuk'êM

Li avê dixim dişkê,
Kevir dixim naşikê,
Ew çîye?

zixaK'



Zivistan

(şîreta doxtir)

R'ojên zivistanê sarin. Berf dibare, mij-dûmane û carna jî h'îşkî dik'eve. Usa dibe, ku merî nikare derk'eve devra. Zivistanên Almatê gelekî sarin, berf p'ir lê dike. Çîya û banî berfeva dixemilin.

R'ojên zivistanêda meriv cilên qalim xwe neke, wê nexweş bik'eve. Lema ji lazime, ku meriv xwe ji sermê biparêze. Lazime zivistanê em cil û berkanê qalim li xwe bikin. Di r'ojên berfêda sîwanê (zontîkê) bi xwera bigerînin. R'ojên bagerêda lazime em dernekevin devra.

Wexta em têne mal, lazime cilê xune germ ji ser xwe bikin. Wexta ku nexweşî çêbû xwe jê bip'arêzin û herin ser doxtir. Çi tiştê ku doxtir wer'a dibêje, pêk binin û dermanên xwe wextêda bixun. Xwe ji nexweşîyên arsim (grîpe), kuxikê dûr bigirin.

Firaqên xwarinê t'imê paqij bikin, avirîya hev nexun, xwe germ xayîkin.

Tiştên zirarê didin bedena we bi k'ar neynin. R'ojên berfêda k'um û lepikên xwe bîr nekin.

Heger em vana pêk binin, r'ojên zivistana meyê xweş û bînexweşî derbaz bibin. Saxlemî ji her tiştî ferztire, şîrîntire, e'zîrtire. Xayîkirina wê dest weye.

Spartin

Derheqa zivistana herêma xwe çî zanin qisekin.



Dilê dayîkê

(zargotina cimae'tê)

Hebû-t'unekû, jinîkek û kurekî wêyî h'esretî hebû. Kurik mezin dibe, dibe xort. Wexta zewaca wî tê, ew dibe aşiqê qîzika cînar. Ewana ji hevdu p'ir h'ez dikin. Ji bo h'uba qîzê xort şev û r'oj xew nake. Xort dewa zewacê dike. Qîzik qayîl nabe. Nazî-tûzîya dike. Dixwaze xort bicerbîne. K'a r'astî ji ew jê h'ez dike, yane na.

- Ê, qerez, xulase qîzik şertekî dide pêşîya wî û dibêje:
- Baş, ez r'azîme, em hev bistînin. Tu gerek şertê min biqedînî. Her'e, dilê dayika xwe derxe û ji minra germî - germî bîne. Wî çaxî ezê bizanbim, ku tu rastî jî ji min h'ez dikî.

Xortê cahilî, bêaqil diçe mal, k'êrê hildide, berbi dayika xwe diçe û dibêje: - Dayê, ez hatime dilê te derxim, ji h'ezkirîya xwera bibim. Paşê emê bizewicin.

Dayîk qet beşera xwe naguhêre û dibêje:

- Bibe lawo, bira qurbana tebe.

Xort zûtirkê dilê dayika xwe derdixe, nava p'înekîda dipêçe û berbi h'ezkirîya xwe direve. R'êda lingê wî kevrekî dik'eve, dilê dayîkê divê ax! Ew devehîya dik'eve, dilê dayîkê nav boxçeda dibêje:

- Of kurê, cavê dayika te birije, tu neêşîyayî, qurbana te me.

Xort ecêvmayî dimîne, seweke giran dik'eve ser wî. Ew bi h'alekî r'adibe û diçe cem qîzîkê û dilê dayika xwe dide wê. Qîzik t'ûyî rûyê wî dike û dibêje: - Her'e, h'eramo, be aqilo! Te îro ji boy gilîyê min çû dilê dayika xwe derxist ji minra anî, tê sibê jî ji boy gilîyê yeke din dile min derxî ji wera bibî...

Spartin

H'ub û h'ezkirina dayîkê û bê aqilîya kurê we bi gilîyê xweva qisekin.

K'ïlamên govendê

LO DÎLO

Allegretto

Lo di - lo, di - lo, lo di - lo,
 Lo di - lo, di - lo, Lo di - lo, di - lo,
 lo di - lo, Sê - fî - lo di - lo, sor - gu - lo.

Emê îşev li k'u bin, Lo
 dilo, dilo, lo dilo, Emê
 îşev li k'u bin, Sêfîlo dilo,
 sorgulo?

Xweş tê dengê bilûrê,
 Lo dilo, dilo, lo dilo,
 Xweş tê dengê bilûrê,
 Sêfîlo dilo, sorgulo.

Ha li ser p'îra Qersê hin,
 Lo dilo, dilo, lo dilo, Ha li
 ser p'îra Qersê bin, Sêfîlo
 dilo, sorgulo.

Emê îro li k'u bin, Lo
 dilo, dilo, lo dilo, Emê
 sivê li k'u bin, Sêfîlo
 dilo, sorgulo.

LÛRKE, LÛRKE, XATÛNÊ, LÛRKE

ft M P W Γ h - u . M J

Lûr.ke. lûr.ke. lûr.ke. lûr.ke. xa tû nê lûr ke.

<p>r' . ' "</p> <p>Lûr.ke, lûr.ke, f B'</p>	<p>lûr.ke, lûr.ke, ϕ</p>	<p>* - P P</p> <p>Dîl - be . rê,</p>	<p>lûr _ ke, H I я</p>
<p>* *</p> <p>ϕ</p>	<p>E'l _ îyê Me _ t'ê,</p>	<p>z P - - - - -</p> <p>xa . tû . nê</p>	<p>* ■ - ■ ■</p> <p>lûr _ ke,</p>
<p>АЦ. _____ У И ' Г'</p>			<p>... I</p>

Hatime mala E'l _ îyê Me _ t'ê, Dîl . be . rê, lûr . ke.

Lûrke, lûrke, lûrke, lûrke, xatûnê, lûrke, Lûrke, lûrke, lûrke,
 lûrke, Dîlberê, lûrke, Çûme mala ETiyê Met'ê, xatûnê, lûrke,
 Hatime mala E'îyê Met'ê, Dîlberê, lûrke

Danî ber min goştê betê, xatûnê lûrke, Danî ber min goştê betê,
 Dîlberê, lûrke, Min h'eram be vê dewatê, xatûnê, lûrke, Min
 h'eram be vê dewatê, Dîlberê, lûrke...



Tu jî h'eqî...

(Ji zargotina cimae'tê)

Melle carna qazîtî jî dikir. Carekê yek tê bal melle şikyatê xwe pê dike, wekî çinar hesp'ê wî dizîye û nade. Lazime ew bê ceza kirinê. Melle guh didê û axirîyêda dibêje:

-Tu h'eqî!

Dû wîra yê ku li ser şikyat hebû, tê bal melle zêrekî nişanî wî dide û xwe dip'arêze: «Ew r'ast navêje, derewa dike, min gunek'ar dike». Melle çev zêr dik'ewe, guh dide wî difikire û dibêje:

-Tu h'eqî!

Pîreka melle bi e'melê mêrêxuva e'cêvmayî dimîne û dibêje:

-Mêrik, ev çî e'melin tu dikî, qet tiştek nek'ete serê min? Çawa dibe, dewak'ar jî heqe, gunek'ar jî? Qet şuxulê ha dibe?

Melle qet beşera xwe naguhêre, pîreka xwe dinhêre û dibêje: -

Bermalîya min, r'astîyê bêjî, **tu jî heqî!..**

Pirs

Nivîsara jorînda h'eqî û neh'eqîya melle û aqilbendîya jîna wî hûn çawa qîmet dikin?



Cixare merivan dukuje

(*Şîreta doxtir*)

Sebebê k'ansêra (bak) kezev, p'işik, qirik, lev û mêjûyê meriva k'işandina cixarêye. Yê ku cixare dikişinin, gora yê ku nakişinin ji sedî 15 kê m oksîgênê distînin.

Yê ku cixare dik'şinin, gora yê nakişinin zêdetir tiştan bîr dikin. Sebebê k'ansêra ku dest, ling û tilîyanda dertê k'işandina cixarêye. Bê guman dilê mirov qurbana cixare k'işandinêye.

Li ser r'ûyê e'rdê mîlyonan meriv cixarê dikişinin û lema nexweş dik'evin. K'irîna cix'arê rih'ete, lê dest jê berdan gelek çetine. Zanyar ku ser saxlemîya mirovan lêkolîn dikin û didine e'yankirinê, ku cixare dijminê merivane. Zerera ku cixare dide benda, tu tişt nadê .

Di nav cixarêda nîkotîn heye. Ev made (je'r) dihêle, herikîna xûnê bilind dike, nefes sitandin, dayîn çetin dibe û me'dê merivan tê girtinê. Lema jî oksîgen kê m dibe, şûna wê mecbûr k'arbondîoksît tê sitandinê. Axirîyê tamarên dilda kollesterol zêde dibe, tamar teng dibin. Di dev û qirikêda dihêle ku r'izandin çêbe. Cixare dibe sebeb ku gelek cûrê k'anserê çêbibin. Kezev û p'işika însîn dixitimîne. Yê ku cixare dik'şinin gelek dik'uxun.

Lema lazime însan qet cixarê nekişîne, yê ku dik'şinin jî zû dest jê berdin. Yê ku dest ji cixarê berdidin dibêjin «jîyan çi xweşe». Bona ku em jîyana xwe xweşik bikin, lazime cixarê nek'şinin. Cixare, îlahî ji bo zaroka mirine. Ew «mijûlîke» p'ir xirave, ziyank'are û mal xirave. Zarokê delal, hûn jî berbi cixarekişandinê him malda, him jî derva şerk'arîye bikin.

Spartin

Der-dorê xwera, li derva, li dibistanê, derheqa vê je'ra bê dermanda gilîkin.

2- Cînavkên nîşanî

Ji wan cînavkanr'a dibêjin cînavkên nîşanî, yên ku li şûna navên merivan û tiştan têne xebitandinê. Ew li şûna navên meriva û tiştên dûr û nêzîk têne gotinê. Cînavkên nîşanî p'arevedibin ser du k'oman.

1 .Cînavkên nîşanî, yên sade: **Ev, ew, evana, ewana.**

2 .Cînavkên nîşanî, yên tewandî: **Vî, wî, vê, wê, van, wan.**

Mînak (Mesele):

Ev yê minin.

Van geleman bik'ire.

Ew birayên tene.

W// hevalî cînar nas nakin.

Vî xortî jî bi xwera bibe.

Wê qîzîkê jî dersa xwe penc stand.

Vê zarokê ez şa kirim. Wan xortan ez dîtîm.

Gora dûrbûn û nêzîkbûnê, yekjimar û pirjimarîyê cînavkê nîşanî ahane:

Ev	Ji bo nêzîk û yekjimar-(bê cins)
Ew	Ji bo dûr û yekjimar-(bê cins)
Vî	Ji bo nêzîk û nêrza-yekjimar
Vê	Ji bo nêzîk û mêza-yekjimar
Van	Ji bo nêzîk û p'irjimar-herdu cins
Wî	Ji bo dûr û nêrza-yekjimar
Wê	Ji bo dûr û mêza-yekjimar
Wan	Ji bo dûr û p'irjimar-herdu cins

Yek û yek

Yek û yek,

Şekir û şima,

Çûçîka belek.

Li ber çema.

Gul û bilbil,

Çem miçiqî,

Dermanê dil.

Av tê nema...

Van hevokên jêrînda cînavkê nîşanî yê sade k'îjanin bidine k'ivşê û binê wan xêz bikin.

Mesele: Ev jî birayê meyî Şerîfe.

- 1- *Ew duh li mala me bû.*
- 2- *Ev kur'xalê mine.*
- 3- *Dibistana me ewe?*
- 4- *Zilamê ku mamostetîyê dike ewe.*
- 5- *Pismamê te ewe?*
- 6- *Ew bi ray ê teye?*



Van hevokên jêrînda cînavkê nîşanî yê tewandî k'îjanin bidine k'ivşê û binê wan xêz bikin.

Mesele: *Wê berê ez naznekirim.*

- 1- *Wê jî bi xwera bibine şanoyê(têatrê).*
- 2- *Minê find bigota wê nehişt.*
- 3- *K'a tu jî wê hilde milê xwe.*
- 4- *Wê berîya gişka dersê xwe hazir kir.*
- 5- *Wan nehiştin ku bavê min xeberde?*
- 6- *Vana wextêda ze'falîk'arî dane me.*



Kuro, kuro...

Kuro, kuro, kuranî,
Kevir avêt kewkanî,
Çavê kewê deranî,
Xwera kire mêranî.

Kara bizna beleke.

Kara bizna beleke Hoy
karê, hoy lê karê. Kara
bizna beleke, Hoy la
gura tu xarê.

Spartin

Cînavkên nîşanî yê sade û tewandî bidine k'ivşê, deftera xweda çend hevoka binvîsin.



Ardû çî mer'ane?

Gundekîda kalek û qîza wî diman, havînê gundîya ji xwera ardû berev dikir, debra zivistanê dikirin. R'ojekê qîzik bavê xwer'a dibêje:

- Bavo, em jî xwer'a ardû berevkin.

Bav dibêje:

- Lao, h'eta zivistan bê ezê bimirim, berev dikî her'e ji xwer'a beravke, berav nakî, tu zanî.

Qîzik dibêje:

- H'eta zivistan bê ezê jî mêrkim, îda ardû çî mer'ane?

Wa dimînin, zivistan tê, ne kalê dimire ne jî qîza wî mêr dike. Dawîyêda herdu jî xaniyê sikî-sarda dimînin, sermêda diğersin.

Zozanê me


Me zozanê bilind danî,
Ji kanîya ava sar anî,
Emê bixun mastê tîr,
R'ûn hildin ji mastê şîr.

Vî zinarî

Vî zinarî şeqe-şeqe,
Ezê gîha herinim, Tu
sosina têke baqe,
Evîntîya min û te ser,
Cote gore, kite saqe.

Gotinên kal-bava

Îro sur û sermaye, sibê def û zurneye.
Mirov bixwaze, wê çîya dayne ser çîya.
Îro dora weye, sibê dora meye.
Aqilê sivik, barê giran.
K'ê havine dixebite, zivistanê p'ir rih'ete.



Name



Birayê minî hêja, T'êmir!

Ez niha li malim û tera namê dinivîsim. Nama ku te şandibû gihîşte destê min. Min xwend, gelekî şa bûm.

Li devra hewa ze'f germe. Ev çend r'ojin nava r'ojê em ji germê nikarin derk'evin devra. Başe ku li bax'çê meda gola avê (h'ewz) heye, ez carna dik'evimê û hênik dibim. Oda min jî germe. Dê û bavê min jî niha li malin. Wan bihîst ku tera namê dinivîsim, minr'a gotin silavê me jî têxê, dê û bavê hevale xwe jî peş meva silavke . Bavê min ser emenîyê r'ûniştîye û t'elevizyona k'urda temaşe dike, dîya min jî li xwaringehê xarinê çêdike.

Tu dizanî bavê min niha naxebite. Ew 30 salî dersdarê zimanê k'urdî xebitîye. Car-carna xwendek'arên wî tên û wî ziyaret dikin.

Ev çend meh bû ez li hîvîya nama te bûm, dê û bavê min p'ir fi ki ra te dikin. Bavê min hê jî d i bêje: "T'êmir xwendek'arekî başbû", ji te p'ir h'ez dike.

Gelo, tu niha çi dikî? H'alê te çîye? K'ar û xebata te, r'ewşa te çawane?

Silavê me bigihîne dê û bavê xwe. Bila fikra me nekin, em başin, tenê fikra me hûnin. Heval û hogiran jî pêş minva silavke. Hîvya nama teme.

Silav û h'urmet'

Xûşka te, Bêrîvana Meh'mûd

05.07. 2005

3- Cînavkên pirsîyarî

Ji wan cînavkanra dibêjin cînavkên pirsîyarî, yên ku li şûna navan têne xebitandinê. Ji bo navê meriva “Kî?” û ji bo yêd din “Çi?” tê xebitandinê. Ev cînavk ça ku pirs bi xwe, dikarin h'alê sadeda (k'î, çi, çend, k'îjan) û h'alê tewandîda (k'ê, çî, k'îjanî) bêne xebatê.

Mînak:

Cûrê sade

K'î ber derî sekiniye?

Çi tûrikê teda heye?

Çend k'itêbê wî hene?

K'îjan ji we dikare here bajêr?

Cûrê tewandî

K'ê ev nivîsara xwendîye?

Li Tarazê çi şayîbû?

K'îjanî k'itêb ji xwera hildabû?

Ew k'îjanê dixwaze?

Van hevokên jêrînda k'îjan cînavkên pirsîyarîne bidin k'ivşê û binê wan xêz bikin.

Mînak: Tu dibêjî ez k'îjanî ji xwera hildim?

Xêncî E'vdile û H'esen k'îhatibû civînê?

Te k'îjan sol ji xwera k'irî?

Çend kurê apê E'îlî hene?

K'ê rbjbûna xwe pîroz kirîye?

Ev çend hojin, tu li virayî?

Kurê min, çi hatîye serê te?


Bavo, ji van solan tê k'îjanê bidî min?

Ew çi şuxul bû, hate serê we?

Tê çend berxa ji xwera bik'irî?

Ez k'îjana ji xwera bijbêrim?

Îro k'î ji Krasnodarê hatibû?



Vê r'ênîşandokêda çend r'eng hene?

Cûrên pîrsan

- Çend k'itêbê te hene?
- Tu çend salîyî?
- Hûn çend birane?
- Tu çend salîyêda çûyî dibistanê? ^{'Tu Γ k Uan r eng' h ez dikî?}
- Çend sale sportêva mijûl dibî? ^{" Tu k' Jan welatî di Jî?}
- Mala we k'îjane?
- K'îjan ji vana bavê teye?
- Dayika te k'îjane?
- Tu çend k'îloyî?
- Çend qelemên te hene?
- Çend destê te hene?
- Pamîdor bi çend t'engane?
- Tirên sae't çenda tê?
- Çend r'ojên h'evtê hene?
- Newroz dik'eve k'îjan mehê?
- Mehên havînê k'îjanin?
- R'oja h'evtêye e'wilîn k'îjane?
- Tu k'îjan zimanî h'ez dikî?
- K'îjan bajarî mayî?
- Welatê te k'îjane?

Cawa pîrsen jêrîn bidin



- K'oma weda, çend xwendek'ar hene?.....
- Çend mamosteyê we hene?
- Ji xwendek'aran çend qîzin?
- Ji xwendek'aran çend kurin?
- Hûn çend dersan derbaz dibin?
- Hûn sae't çenda dik'evine dersê?
- Hûn sae't çenda ji dersê dertên?.....

4- Cînavkên nebinavkirî (bênav)

Ji wan cînavkanra dibêjin cînavkên nebinavkirî, yên li şûna meriv û tiştên nebinavkirî têne xebitandinê. Cînavkên nebinavkirî evin: **H'emû, her k'es, tu k'es, tişt, tu tişt, k'esek, yek, heryek, filan, bêvan, hin, hinek...**

Mesele:

- Heval h'emû wextêda hatibûn, hinekji nehatibûn.
- = Her k'es li vira hazire, hinek jî nehazirin.
- Filank'es û bêvank'es bira gotinê ha nekin, tiştê qenc bikin.
- Hinek meriv bik'arin, hinek jî bêk'arin.
- Hinek hatin, lê ne merivê nasin.

Her k'es h'elalî tê dinê,
Nolî avê tê xwarinê, Çima
paşê h'eram divin, Mejûê
xweva giran divin.

Hûn delalin zarokê min.
Wek şîrê dê hûn h'elalin.
Qencî, başî r'ewşa weye.
Dinya ronik têda heye.

Bavê Nazîr

Filank'es û bêvank'es

Minra dibêjin tu guhê xwe didî gilfîyên filank'esê û bêvank'esê. Erê, ça ku hinek meriv li bal min be'sa hin tiştan dikin, lazime ez guh bidime wan. Wekî ez bizanibim, her k'es derheqa minda çî difikire, ezê bizanibim k'î merîyê mine, k'î na. Ez zanim her k'es ha nake, lê ez dikim. Alîyê dinda, ez pey gotin û gilfîyên xelkê nak'evim. Filan çû mala filank'esê, nizam, bêvan hate mala bêvank'esê... Ev ne tiştên rindin. Merivên aqil guhdarîke, wekî tu zane bibî, ne ku bibî kûpê gote-gotan, vir'an-vizan. Filank'es, tu guh bide min, t'u k'es nikare te ji re derxe. Mirovê aqil ji wan tiştan dûr dik'eve...

S partin

Nivîsa jorînda çend cînavkên nebinavkirî hene. Ya yeke binî xêz kirîye, hûn jî binê yên mayîn xêz bikin.

Ev k'îne?

Ez	Tu	Ew	Ez	Ezim
			Tu	Tuyî
			Ew	Ewe
Em	Hûn	Ew	Em	Emin
			Hûn	Hûnin
			Ew	Ewin

5- Cînavkên eleqetîyê

Ji wan cînavkanra dibêjin cînavkên eleqetîyê, yên ku eleqetîya meriv û tiştan nîşan dikin û têne xebitandinê. Cînavkên eleqetîyê (aîtbûnê) evin: **ya, yê û yên**

Ev cînavk eleqetîyê didine k'ivşê:

Ev ya mine.	Ev yê mine.	Ev yên minin.
Ew ya teye.	Ew yê teye.	Ew yên tene.
Ew ya wîye.	Ev yê wîye.	Ev yên wîne.
Ev ya wêye.	Ev yê wêye.	Ew yên wêne
Ev ya meye.	Ew yê meye.	Ev yên mene.
Ew ya weye.	Ew yê weye.	Ew yên wene
Ew ya wane.	Ev yê wane.	Ev yên wan in

Berovajîyê (çepê wê) van hevokan deftera xweda binvîsin.

Ew xort kurê Memoye.

Ew xort ne kurê Memoye.

Ew sêvên hanê ne yên mene.

Ew hespê hana yê mene.

Ew çiyayê k'urdane.

Ev k'itêb yên wananin.

Ew guşîlê yê moya

HOKER (ZERF)

Hoker çîye?

Ji wan xeberanra dibêjin hoker (fîlnîş), yên ku cîh, zeman, h'al, bûyîn-nebûyîn û r'egema didine k'ivşê. Hoker bersiva van pirsra dide: **Çima?** **Cir'a?** **Cend?** **Çiqas?** **Çawa?** **Çi wextî?** **K'î dere?** **K'îngê?** **K'ûda?** **K'î alî?** **Li ku?** **Ji k'îderê?** Di zimanê meda gelek hoker hene.


Hok'erê sereke evin: pêş, paş, berjêr, hevraz, ber'oj, devra, hundir, jor, jêr, tenişt, li ber, dûr, nêzik, alî, dor-ber, binî, jêr, jor, êvarê, doh, pêr, sibê, nîvro, şev, îro, par, betirpêr, îsal, gelek, p'ir, ze'f, hindik, zêde....

Mesele :

- *Meriv saya xandinêva pêşda diçin.*
- *K'urdên me berîya sîh salî pir paşda mabûn.*
- *E'îlî hevraz diçû.*
- *Derk'êve devra hewa temîz bistîne.*
- *Mala apê min li r'ex çême.*
- *Jêr'a gundê me daristane.*
- *Êvarê cimae't li mala dicive.*
- *Tu ji k'îderêyî û k'ûda diçî?*
- *Ewî çawa ûnîversîtê xilas kirîye?*
- *Çima, tu h'alê min napirsî?*
- *Wî aftoya xwe lezo-bezo ajot û çû.*

Li jêr her hevokêda hokerek heye, binê wan xêz bikin.

- Çîyayê Agirîê ze'f bilinde?
- Çar-penc k'ark'êran dest ji k'ar berdan?
- Bavê te p'ar hate Qazaxistanê?
- Tu çima sêvên sor naxwî?
- Mala we li k'îderêye?
- Ew çî wextê ji cîyê hat?
- Ûsiv k'îngê ji Hewlêrê hat?
- Çima tu minra helbesta naxûnî?
- Li devra baran dibare?



Almati

Li bajarê Almatêda gelek cîyên bedew hene. Çar alîyê bajêr hêşînayîye. Li jora bajêr çîya û daristan hene. Jêra bajarê Almatê deştê freye mezin hene. Li wan deşta genim, ceh, once û fekî têne çandinê. K'urdên me zûva hatine vira û bi cî-war bûne. Ev çend salin ku h'alê k'urdên me, yên vira baş bûne. Xwera k'ar dikin, h'emû jî ji Qazaxistanê h'ez dikin û wek welatê xweyî duda hesav dikin. Li vî bajarî cimae'ta k'urda p'ire.

Merivên ulimdar (zanyar), nivîsk'ar, doxtor, mühendis (çekiçî), extîyarzan (dadger), şikilk'êş (wênekêş), k'arsaz û k'armend jî ji nava k'urdan derk'etine. T'ew welatp'arêzin. Her k'es ji bo p'êşdaçûyîna çanda k'urda k'arekî dike.

Almatêda Navenda Çanda K'urde Qazaxstanêye «Berbang» heye. Bi zimanê k'urdî k'ovar û hojname, k'itêbên zimanê k'urdî, k'itêbên şair û nivîsk'arê k'urda çap dibin. Gelek k'omên k'ilam û r'eqasêye folklore hene, k'oma «K'urdistan», «Nûr-E'lî», «Memê Alan», «Mîdîya», «Kevokên aşitîyê», «Baxçê gulên» û yen mayin.


Spartin

Nivîsa jorîn bixûnin û binê hokera xêz bikin.

Van hevokên jêrînda yê ku wext didine k'ivşê, binê wan xêz bikin.

Mesele: Êvarda ji wir'a divejim-navêjim, ew guh nade min.

- 1- *Sibê mêvanên me tén.*
- 2- *Wî çaxî ez û Meh'med li Astanê bûn..*
- 3- *Par na, pêrar bavê min çû ser dilovanîya xwe.*
- 4- *Berê k'urdên me li vira kê m bûn.*
- 5- *Baharê ev derana gelekî hêşîn dibin.*
- 6- *Îşev daweta birayê mine.*
- 7- *E'hmed gelekî derengî k'et.*



Şiklê jorîn binhêrin têkstê avakin û hevokanda hokera bidine xevitandin û binê wan xêz bikin.

- 1- ***Jera gundê meda darîstaneke mezin heye.***
- 2- ***Alîyê daristanêyî çepêda hindik dar hene.***
- 3- ***Hundurê daristanê tarîye.***
- 4- ***Alîyê daristanêyî jorînda serê dara digihîje hev.***
- 5- ***Dare fekîyan zû gul vedidin .***
- 6- ***Bin daranda gîha heye.***
- 7- ***Navbera daran ne tenge.***
- 8- ***Hêla hastêda darên bedew bilind dibin.***
- 9- ***Bîneke pîrxweş ji daristanê tê.***

Şêr û mişk

(Çirok)

Lana şêr û qulika mişk li t'evhev bûn. Şêr usa k'ubar-k'ubar diçû-
• lihat, qet ber p'îyê xwe jî nedinihêrî.

R'okê wexta şêr dîsa hat derbazbû, mişk k'ete nava lepê wî, şêr
■ west ku mişk bihincirîne, mişk gotê:

Ya r'ebê min, axê min! Min azake, ezê r'ojekê kêrî te bêm.

Bû p'îqe-p'îqa şêr k'enîya. Ilsa k'enîya weki çok lê sistbûn. Mişk ji
nava lepê wî derk'et r'evî. Çendekî şûnda nêzîkî qulika mişk zarîna şêr
hat. Mişk bi tirs serê xwe derxist û nihêrî. Nihêrî ku şêr p'ir nexweşe. Zare-
zara wîye. Mişk dît ku şêr k'etîye tela nêçîrvan. Ji şêr pirsî:

Şêro, birako, çi bûye?

Şer got:

Ez k'etime t'elê.

Şêr p'osîde-p'osîde caw da.

Qe belengaz nebe - mişk got - ezê te xelaskim.

Mişk kincirê t'elê bi diranê xwe çû, bir'î, şêr ji qezîyayê xelas kir.
Wexta şêr r'astî mişk dihat, digot:

Axxilask'arê min, ruh'darê min!



Du deve



Du deve xûşkê hev bûn. Ew çûne berîyê çêrîyan. Devek diçêrîya, çêrê
<levê xwe dida ya dinê. Deva dinê gotê:

Xûşkê, ezjî diçêrim, tu jî diçêrî. Çima çêrê devê xwe didî min?

Deva dinê gotê:

Xûşkê, ez ji tera h'urmetê dikim. Her k'es gere h'urmetê qazancke. Ez ji
wera vî tehrî qencîyê dikim. Ji destê min t'enê ev tê, wê jî dikim...

Spartin .

Van çîrokan bixûnin û me'na wana şirovekin.

«Qencî r'ûmeta r'ûyane»... Bi vê mijarê nivîsarekê binivîsin.

R'asthatin



- R'ojbaş, xûşka R'ewşan!

-R'ojbaş, xûşka Sozdar! Duh tu li k'êderê bûyî?

-Ez li mal bûm. Mêvanê m hebûn.

Tu jî wan nas dikî. - T'ewrat û Nazîr li mala me bûn.

- Erê, nas dikim. Merivne başin. Hevalan duh ji minra gotin, T'ewrat û Nazîr ne li dibistanê bûn.

- Erê, dersê wan tunebûn, bi mêvanî hatibûne mala me. Me gelek xeberda, xar-vexar, Nazîr ji mera çend k'ilam sitran.

- Ez zanim, dengê wî gelek xweşe.

- Birayê te Barî jî li mal bû?

- Na, ew ne li mal bû. Çûbû xebatê, paşê hate mal, lê wî wextî T'ewrat û Nazîr çûbûn.

- Wekî dinê k'î hebû li mala wê. Bavê te jî li mal bû?

- Destpêkê ne li malê bû, paşê ji gund hat.

- Lê dayika te?

-Erê, wê mera gelek xarinên xweşik çêkirin.

- Xûşka R'ewşan, niha tê herî k'êderê?

- Ezê herim cîyê xebatê. Li wira hinek k'arê min heyê. Lazime zû bigedînim.

-K'eremke, xwedê ox'ire bide te.

-Zor spas.



E'lı û Fatê fêkîyan dik'irin

Sibê zû E'lı û Fatê çûn sûkê (bazarê), seba fekîyan û p'incarê bik'irin. Di r'êda Fatê pirsî:

-E'lı, em pê çî herine sûkê?

E'lı got:

-Em avtobûsê sîyarbin, deh deqa şûnda emê bighîjinê sûkê.

E'lı û Fatê hevra avtobûsê sîyarbûn û çend deqa şûnda li sûkê peya bûn. Nişkêva yekî nas derk'ete pêşîya wan. Silav da wan, lezkir û çû. Lê E'lı û Fatê hêdî-hêdî k'etin nava sûkê. Wan dor-berê xwe nihêrîn û hevra digotin: fekî p'ir bahane.

E'lı:

-Were, em k'îlo se'v, k'îlok jî tîrî bik'irin herin.

Paşê hatine ber p'incaran, E'lı sekinî û ji Fatê pirsî:

-Em çiqas p'incar bik'irin?

Fatê gotê:

-Em tenê t'êra îro bik'irin.

E'lı:

- Vane, bîber, pamîdor (firengî) û xiyarê (xeyal) baş jî hene.

Fatê:

- Ji her yekê k'îlokê bik'ire.

E'lı k'îlo bîber, k'îlo pamîdor, k'îlo xeyal kirîn, beñsed tenge dayê û Fatêra got:

- Îdî derenge, em her'in.

E'lı û Fatê dîsa li avtobûsa xwe sîyarbûn û çûne mal

Spartin

Nivîsara jorînda hokerên h'alê (r'ewş) hene. Hinek ji wan bini xêz kirine, yê mayîn jî hûn binê wan xêz bikin.



Kur'ê bêxîret

Hebû, t'unebû kalekî ixtîyar û kur'ekî wîyî bêxîret hebû. Mêrik kal bûbû, îdî xebat pê nedibû, neyî sax bû, ne jî mirî. Zû-zû nexaş dik'et. Kurê wîjê aciz bibû. R'ojekê xort bavê xwe dike sebetekê û dive datîne serê çîyakî bilind, ku gur bixun.

Wexta kur wî datîne e'rdê, dixwaze ku vegere mal, bav dibêjê: -Lawo, te ez anîme, ew şuxlê teye, destê xwedê li ser te be. Lê sebeta xwe hilde bibe mal, wê r'okê jî lazimî tebe.

Kur dibêje:

-Bavo, sebetê çî lazimî min be? - Ezê çî bikime sebetê?

Kal dibêje:

- Lawo, wexta tu jî kalbî, kurê teyê jî te t'êxe vê sebetê bîne vira. Kur bi ser xweva tê, digre sebetê davêje, bavê xwe hildigire pişta xwe tîne mal, şev û r'oj jê'r'a qulix dike.

Spartin

- 1 .“Dê û bav t'acê serê merivane”. Ser vê mijarê nivisarekê binivîsin.
- 2 .Nivîsara jorînda binê hokeran xêz bikin.

Têderxistinok

Tiştêkî min heye,
Canê wî goşte,
K'incê wî derzî. Ew
çî ye?

Tendûreke zimzimî,
Tijî nanê genimî.

Ew çîye?

îjûj

kryets

Hevokên jêrînda hoker hatine derxistin, hûn bi cîh bikin.

- | | |
|--|--------------------|
| 7- Birayê tesalîye? | sîbê zû |
| 2-Ew.....hate mala we? | çend |
| 3- Tuyî? | gelek |
| 4- K'itêba destê min xweşe. | k'îngê |
| 5- Ez..... derketim hewa temîz. | êvarê |
| 6-.....r'adibim û sportê dikim. | Ji k'î derê |

Hevokên jêrînda bersiva hokeran bidin.

- | | |
|---|-------------------------|
| 1- Tu çawayî? | Ez gelek p'akim. |
| 2- Wê wextê tu li k'ê derê bûyî? | |
| 3- K'ê tu birî mal? | |
| 4- K'îjan qelema teye? | |
| 5- Çend birayên te hene? | |
| 6- Çima naçî hundur? | |
| 7- Tu zûva li virayî? | |

Cûrê hokerên (zerf) pirsan

K'î? kê ?

- K'î hate mala we?
- K'ê ev k'itêba daye te?
- K'î li min gerîya?
- K'ê dîtîye?
- K'ê sêv xarin?

- K'ê xarin xarîye?
- Te ji k'ê pirsî?
- Emê herin mala k'ê?

- K'î li wira heye?
- K'î dibêje?
- K'î minra tê?

K'îngê?

- Tu k'îngê hatî?
- Ew k'îngê çû Astanayê?
- Ez k'îngê bêm mala we?
- Em k'îngê ji Moskvayê hatin?
- K'îngê gîha zer dibe?

- Newroz k'îngêye?
- Tu k'îngê ji dîya xwe bûyî?
- Bavê te k'îngê diçe?

- Hûn k'îngê diçin dibistanê?
- Tu k'îngê ji xewê radibî?
- E'î k'îngê tê mal?

Pirsên jêrîn bibersîvinin

- 1-Tu k'urê k'êyî?
- 2-Tu k'ê h'ez dikî?
- 3- Tu çîma diçî dibistanê?
- 4- Mamosteyê te k'îye?
- 5- Tu k'îngê malêra t'êlêfon dikî?
- 6- Tu k'îngê diçî cîyê sportê?
- 7-Tu k'îngê r'adzêyê?
- 8- Tu k'îngê muzîkê guhdarî dikî?

Pirs û bersîv

- Tu k'îyî?
- Ez dersdarim.
- Tu gundîyî?
- Na, ez ne gundîme. Ez ji bajêrim.
- Meh'med jî ji bajêre?
- Na, Meh'med gundîye.
- Çima ew jî dersdare?
- Erê, ew mamosteyê zimanê k'urdîye.
- Tu k'ark'irî?
- Erê, ez k'arkirim.



- Tu k'arsazî?
- Na, ez ne k'arsazim, ez muhendîsim. Ev jî cîgirê mine.
- Ewanê hanê k'îne?
- Ew qîzikin. Şagirtin, di dibistanêda dixûnin.
- Ew k'îye?
- Ew doxtire, doxtirê diranaye. Birayê wî jî awûqate (wek'île).

- Ev çîye?
- Ev bixêrîye.
- Vekirîye?
- Na, dadayîye.
- Çend p'encerê vê odê hene?
- Du p'encerê vê odê hene.
- Xwendek'ar, li k'êderêne?
- Xwendek'ar derk'etine hewa temîz.
- Tu k'îngê dest bi dersê dikî?
- A niha dest bi derse dikim.
- Dersdarê teyî zimanê k'urdî k'îye?
- Mamoste Seneme.
- Serwêrê dibistana we k'îye?
- Mamoste Selîmê Barîye.
- Hûn r'ojê çend dersa dikin?
- Em r'ojê şeş dersa dikin.
- Başe, ji wer'a sae't-qewatê dixwazim.
- Zor spas!





EZ Û T'EBÎYET

Min t'ebîyet h'emêz kir,
Warê kal û bava. P'aşilê da
r'azam, Mîna zar'a sava.
Û wextekî şevê, Stêrk k'etin
r'eqasê, Şemal dan e'rd û
e'zman, Wek şamdanê
tasê.

Her derê bû îşiq, Mêşe jî
hişyar bû, Belga hev
r'amûsa, E'ynî şaneşîn bû.
Bê ji nermik wiland, Beden
p'orê min maç kir, Bîhna
h'ezar û yek gol, Tijî qefesa
min kir. Gel t'ebîyet
hikîyate, Bedewî r'ewşa wê,
Her feslek t'erîqe, T'erîqa
emrê wê,

Carna dike serma, Carna
tirincê wê, Bi form û şûrê
xwe, Xemlê li xwe dike, Ji
k'esî napirse, Û hêvî jî nake.
Însan t'ebîyet birane,
T'ebîyet padîşahê dewra,
Însan wadelîye, Mîna belgê
dara, Bihara hêşîn dibe,
Payiza dadiweşe, Xema
tebîyetê nîne, Û xwera tim
dimeşe, Û min ji çend sala Li
wê rind mêze kir, P'ir-hindik
k'ed danî, Emrê min jî qol
kir...

**T'êmirê
H'ecîsadiqê Şamîlzade**

BERNAV (EDAT)

Bernav çîye?

Ji wan xeberanra dibêjin bernav (edat- daçek), yê ku li ber nava, li pêşîya navan têne xebitandinê û bi vî teherî h'alê navan nîşan dikin, kirin û bûyîna merivekî, yan jî tiştêkî li dor-ber cîyan nîşan dikin.

Mînak (mesele):

Ji çîyayên me baştir, çîya t'unenin.

Ji bo her k'esî welat şirîne.

Zimanê meda sê k'omên bernavan hene.

Bernavên kevn, bernavên nû (t'eze), bernavên bi cot.

Gora vê yeka hanê r'êzbûna van k'oman jî ahaye:

Bernavên kevn: **ji, li, bi, di, bo, bona, ba, bal, dû, pey, cem, gel.**

Bernavên nû: **ser, ber, nav, paš, pêş, r'ex, bin,** Bernavên bi cot: **li gel, berbi, li jêr, li jor.**

Mînak:

- Dîyarji_Silêman bilindtîre.*
- *Gulê jî_mal derk'et.*
- *LLçîyayê Agirîyê berf k'etîye.*
- Xwendek'ar di_dibistanêda rûniştine.*
- *Gulîzer li_bal dayika xweye.*
- *Miletê k urd bona azadiye şer dike.*
- *Mecîd li dû bavê xwe nihêrî û çû.*
- *Ez h'eta êvarê dixebitim.*

- *R'êwî li pey hev balafirê sîyarbûn.*
- *Usiv tabu ser_xwe û xeberda.*
- *K'ark'er nava gundda gerîyan.*

-*Welat li gel pîrozbe!*

-*Gel te (cem te) çend k'arker hene?*




” ”

rTF-h

wffb

—
чММВСД



Hevaltîya gur, r'ûvî û hirçê

Gur, r'ûvî û hirç hevra hevaltîyê dîkin. Goştê h'eywanekê dik'eve destê wan. Hirç dibêje:

- Gelfî bira, de bînin, em p'aravekin, çika hûnê çawa p'aravekin.

Gur dibêje:

-Çîye, emê çawa p'aravekin? H'eça bû goşt nîvî minra, nîvî hirçêra, ceger jî besî r'ûvîye. R'ûvî nikare haqas goşt bixwe.

Hirç gur hildide ser lepê xwe davêje h'erîyê, ji bedena wî tenê boçika wî tê k'ivşê.

Hirç îcar berê xwe dide r'ûvî:

-Birê r'ûvî, îcar tu were, çika tuyê çawa p'aravebikî?

R'ûvî bi fêlbazî dibêje:

-Bira, dewarek r'astî me hatîye, xwedê p'aravekirîye, nîvî taştêya te, nîvî firavîna te, nîvî jî şîva te...

Hirç li r'ûvîyê fêlbaz dinhêre û dibêje:

-Tu wê paravekirina baş û aqil ji kê hîn bûyî?

R'ûvî bi fêlbazî dik'ene:

- Ji hevalê xweyî nav h'erîyê!..

-Ha! ha! Te dêla gur h'erîyêda dîtîye, lema hatî ser h'eqîyê, minra dikî qencî û p'ak'îyê...

Sartin

Nivîsa jorînda hevaltîya **gur**, **r'ûvî** û **hirçê** hûn çawa serwaxt dibin, bi gilîyê xweva şirovekin.

Li jêrê çend hevok hene, van hevokanda k'îjan bernavê t'ezene binî xêz bikin.

Mînak: R'êya azadîyê pêş meye.

- 7- **Çî li ber çavê te k'et?**
- 2- **Bila ew ber min xeber nede.**
- 3- **K'î li pey me gotinên xirab dibêje?**
- 4- **Çima cîh nema tu hatî li pêş min r'ûniştî?**
- 5- **Qelem bin defderêdaye.**
- 6- **Dayê, ezê bêm hex te r'unêm.**

Hevokê jêrînda bernavên kevn hatine derxistinê, hûn bi cîh bikin.

bi, li, ji, bona, bal, pey

- 7- **Qaso li çepê nihêrî ût'ilîya xwe nişanda.**
- 2- **Em defterê gerîyan me nedît, paşê E'li got va.. ser k'ursiye..**
- 3- **Hûn..... avtoyê hatin bajêr?**
- 4- **Piştî ku ew gihîştine wira, E'lijî li..... wan hat.**
- 5- **Ez van gilîyan t'enê..... te dibêjim.**
- 6- **Qîza min, min bîra te kirîye, were min rune.**

Li jêrê çend hevok hene, bernavên t'ezê hatine derxistinê hûn bi cîh bikin.

- | | |
|--|-----|
| 7- Ezbaxçê gerîyam. | |
| 2- Çivîkek hat, lidarê danî. | ser |
| 3- H'esen jî li.....r'ûniştîbû. | ber |
| 4- Min kevir avît, li.....k'et. | paş |
| 5- Zozan çû ez da mam. | pêş |
| 6- Paşê min lezand k'etim Dewran. | bin |
| 7- Me bi hevra kevir avîtnê golê. | rex |
| | nav |



K'esera teyr

Nêçîrvanek r'okê diçe nêçîrê. K'êleka çêm r'ûdinê, dîna xwe didê t'eyrekî nexşînî bedew nava avêdaye. Teyr digre tîne malê, jêr'a qefeseke zer'în çêdike û çiqas tiştê baş hene dide ber. Teyr dîsa r'azî namîne, her dibêje:

- Ax welat! Wax welat!

Nêçîrvan gelekî difikire, dûr'a teyr dibe, davêje wî cîyî, ji k'u girtibû. Wexta teyr dik'eve nava avê dibê:

Ax welato! Xaş welato!.. Qefesa xelqêye zêrîn ji boy min tarî, zîndan û ne'leto!

***Bavê min, welat xweşe
Boy ger'ê Bexdat xweşe.
Ji bo r'ewşê, k'incên bedew
Boy mirine, welat xweşe.***



Pirs, Spartin

- 1- Nivîsara jorînda bijmêrin k'a çend bernav hene?.
- 2- Hûn jî fikra xwe bi mijara "Welat şîrîne" binîvsin.

Silêman û T'êlman

- Merh'eba ,T'êlman!
- R'ojbaş, birayê Silêman!
- Çawayî,başî?
- Zorspas, başim. Tu çawayî?
- Sipas, ez jî başim.
- Tu k'uda diçî?
- Ez ber bi ûnîvêrsîtête diçim.
- Tu li wira dixunî?
- Belê, sinifa (kûrsa) sisêyanda dixunim.
- K'îjan p'arêda?
- P'ara ziman û e'debîyatêda.
- Di wê p'arêda tu hînî çî dibî?
- Ez hînê ebebîyata cîhanê dibim.
- îro dersa te heye?
- Erê, nîv sae't şûnda, dersa min dest pê dive.
- Di dersêda hûn çî dikin.
- Em diroka e'debîyata çîhanê dixûnin.
- Tu k'îjan zimanan zanî?
- Ez zimanê k'urdî, ûrisî, qazaxî û îngilisî zanim.
- Piştî xilazkirina ûnîvêrsîtête çî k'arî bikî?
- Ezê ser ziman û e'debîyeta k'urda lêkolîna bikim.
- Zeh'f şame, bira.
- Oxirbe, qurba!
- De bi xatirê te, dersên ter'a serkeftinê dixwazim.
- Zor spas!



R'ENG DÊR (XEYSETNAV)

R'engdêr çîye?

R'engdêr bi navekî din **xesyetnav**, bi latinî **adjectîvume**.

Ji wan navanra dibêjin r'engdêr, yên ku cûrê r'eng û teherê navên heyînê nîşan dikin. R'engdêr r'engê tiştan û xeysetê merivan, h'eywanan nîşan dikin, tînin ber çavan û e'yan dikin. R'engdêr cawa van pîrsa didin: **Çawa? Çi cûreyî? K'îjan?**

Mesele: Bave min ji minra sae'teke zêr kirî. Zîne qîzikeke delale. Biraye te xortekî bejnbinde. Hespê Xosrovî k'umeyt pêşîyê tê.

Zimanê meda sê k'omên r'engdêran hene.

1- *R'engdêrên sade* 2- *R'engdêrên hevedudanî* 3- *R'engdêrên pêkhatî*.

Gora vê yeka hanê r'êzbûna van k'oman jî ahaye:

R'engdêrên sade: R'eng û h'alê tiştan dide k'ivşê.

R'engdêrên hevedudanî: Ji k'elijandina navan pêk tên, **R'engdêrên pêkhatî:** Ji k'elijandina nav û p'irtikekî(qertaf) pêk tê.

Mesele:

(R'engdêrên sade)

Berxa çê, ber k'ozêda çêye.

Xortê bilind. R'oja nû, Bajarê mezin.

Çemê gur. Merivê qenc.

Hespê k'umeyt em şa kirin. Miya sor du berx anîn.

(R'engdêrên hevedudanî)

Zarokên dilşêr. Tîremarê ber avê.

Jina k'ofî zêr'e nazdarî.

Malbeta ser bili nd.

Qîzika dêm qemer.. Qîza çavr'eş. Mêrxasê gundê me.

(R'engdêrên pêkhatî)

Kurê şîrh'elal.

Jina mêranî.

Xortê beyanî.

Çe'nîya nûzînî.

Lazime em bizanbin:

Firqîya r'engdêrên hevdudanî û r'engdêrên pêkhatî forma çêbûna wane.

Mesele, xebra **dilşêr** xebereke hevdudanîye. Ji **dil** û şer pêk hatiye.

Jina nandar

Carekê rêwîk diçe gundekî k'urdara derbaz dibe. Gelekî birçî dive, dadigere maleke, dinhêre mêrek dêw dik'ilê û digirî. R'êwî ji kevanîya malêra dibêje:

- Xûşkê, ez birçîme, parî nan nadî min?

Jinik ser wîda hêrs dik'eve, dibê:

- Ji vira derê here, ezê tera nan ji kû bînim?

R'êwî vedigere ser mêrê jinikê:

-Tu çira digirî?

Dibê:

-Jina min ez k'utame.

-Ê dibê, jina te dîsa başe, lê wexta jina min, min dik'ute, qet nahêle ez bigirîm jî. Jinik gava wan gilîyan dibhîze dibêje:

- Birango, vegere, welleh bê nan, bê av tu ji mala me naçî.

Jinik rêwî tîne mal, nan-xwarinê dide ber wî, mêrik nanê xwe t'êr dixwe, şikirbûna xwe ji xudê dike û r'edik'eve diçe.

Li jêrîn çend hevok hene, ji wan hevokan k'îjanada r'engdêrê sade hene bidin k'ivşê.

- 1- *Li dibistanê xwendek'arekî jêhati hebû.*
- 2- *Mamosteyê min gelekî zaneye.*
- 3- *Ew hevarekî devk'ene.*
- 4- *Em e'slê xweda arîne.*
- 5- *Mala Alan birca beleke.*

Li jêrîn çend hevok hene, ji wan hevokan k'îjanada r'engdêrê hevedudanî hene bidin k'ivşê.

- 1- *Bavê min zilamekî k'urdewarîye.*
- 2- *Ez zûva maşoqê çavê teye belekim.*
- 3- *Ew qîzeke bedewe.*
- 4- *Dayika min gelek mirovh'eze.*
- 5- *Gundê meda merivên qenc p'irin.*

Li jêrîn çend hevok hene, ji wan hevokan k'îjanada r'engdêrê pêkhatî hene bidin k'ivşê.

- 1- *Tu mehvekî dilvekirîyî.*
- 2- *Şemam qîzeka aqile.*
- 3- *Ew zarokeke delate.*
- 4- *Tu nazdarî, dilgeşî û xûnşirînî.*
- 5- *Hejarşaîrekî nav û denge.*

Sîr û hingiv hev nakin.

- R'ojekê yekî ixtîyar r'ûdinê, sîr û hingiv t'evî hev dike, dixwe.
Xortek tê bal wî, û dibê:
- R'ojxêra te, kalê!
Kalê dibê:
- Ser çava hatî, xortê delal.
Xort dibê:
- Kalê, tu çima sîr û hingiv t'ev hev dikî dixwî, ne ewana hev nakin.
Kalê dibê:
- Bira hev nekin, wê çi min bikin? Wê hevra r'ê herin.
Sae'tek derbazdibe, ew xort dîsa tê, wê r'êra derbaz dibe, dibîne kalê r'ûniştîye, ofe-ofa wîye:
- Hewar, hewar ez mirim! Hewar, ez mirim! Werin, werin!
Xort nêzîkî wî dive û dibêje:
- Kalê, ne min tera got, sîr û hingiv t'ev hev neke, ew hevra r'ê naçin, ew hev nakin...
Kalê dibê:
- Eh, kurê min, tu nizanî, ew baş hevra r'ê diçin, hev dîkin, şer'ê wan ewe ku, min ji ortê zû hilînin...

Spartin

Nivîsa jorînda çend r'engdêran bijbêrin û deftera xweda binvîsin.



E'liyê E'vdil'eh'man

R'ewşa jina k'urd

K'ofî, k'itan,
Qolê zêran,
Mêzer, k'avtî,
Xala movî,
Bisk û kezî,
Bejna nazî,
Birûyê qeytan,
Çe'vê adan,
Sûret sore,
Algeveze.
Navkelk zirav,
Gulî gulav,
Tilîyê mûmîn,
Levê medîn,
Gerden gazê,
Mîna qazê.
Xizêm, gustîl,
Poz qereffîl,
Bazin -xirxal,
K'enê cemal,
T'iving, qirme,
Halet, qeme -
Eve r'ewşa
Jina k'urda,
Mal li gundda,
Wek we t'une,
Li tu e'rda...

Spartin

Vê helbestêda r'engdêra bidin k'ivşê.



Cûreyê guhestina r'engdêran

Ji bo cinsê mê û nêr

- Qîza delale, bedewe bîaqil.
- Cînara başe, xêrxaze, mirovh'ez.
- Kevanîya destsivike, xweşbêje, jîr.
- Mamosteya r'inde, qence, dilovan.
- Dayika dilşewate, xêrxaze, qenc.
- Xortê bedewî, delalî, bîaqil.
- Zilamê jîrî, xweşmêrî, bie'sil.
- Peyayê çelengî, jêhatî, qewat.

Li jêrîn çend hevokhene, van hevokanda k'îjan r'engdêrin binê wan xêz bikin.

Mesele: Ew merivekî dilreh'me.

- 1- *Meh'mûd merivekî dilovane.*
- 2- *Şemam qîzeke p'orsore.*
- 3- *Şamil yekî simêl rieşe.*
- 4- *H'esen merivekî p'irzaneye.*
- 5- *Gulîzer qîzeka çilkezîye.*
- 6- *K'endal yekî aqilî, p'irzaneye.*
- 7- *Xudêda zilamekî devk'ene.*

Gotinên kal-bava

Xebat dur' û cewahirê bendaye.
Hesin germe-germ tê k'utanê.
Darî xare, lê hosteyî r'aste.
Kê dixebite, ew jî duxwe.
Şuxulk'arê xwebe, h'izkirîyê bendabe.
K'ar, arê naxwaze.

Li jêrîn çend hevok hene, k'îjanada r'engdêr tune, bidin k'ivşê û nîşanê (şixtik) daynin li ber.

- () 1- *R'efîk kurekî xebatk'are.*
- () 2- *Eylaz merivekî bînfireye.*
- () 3- *Narê qîzeke bedewe.*
- () 4- *Silêman dersê dixune.*
- () 5- *Tîtal xortekî şîrîne.*
- () 6- *Ewxortekî jîre.*

Çend mijûlîji boy xandin û r'astnivîsarê.

Îro hewa xweşe. Duh sarbû. Niha germe. Duh birayê T'êmir li mala me bû. Ew ze'f westîyayîbû. Me nan xar. Hundirê malê germbû. Devra jî germbû.

Xûşka min ne li malbû, çûbu mala cînar. Li gund p'ostexanê t'une, dibistan heye. E'îlî xwendek'are, bavê wî Ûsiv di nexweşxanêdaye. Birayê wî H'esen jî nexweşe. Le ez ne nexweşim. Ez serxweme.

Mecîd ne h'ek'îme, ew dersdare. Apê Cemîl li gunde, diçe ber pêz. Duh tu vala bûyî? Na xêr, ze'f k'ar û xebata min hebû. Ez h'etanî êvarê li xebatê bûm.

Meh'med duh êvarê hat mala we? Erê, hat mala me. Tu duh k'îderê bûyî? Duh çarşem bû, ez li fêrmê bûm. Nûrê li k'êderêbû? Ew li gundbû. Gelo Nûrê li gund dimîne? Na, Nûrê li gund namîne, qewmê wê li wirane, cama diçe û serîkî li wan dixê. Ewa li bajêr dimîne. Xanîyê wêyî e'rdê heye. Di baxçeda pamîdor û p'incar çandîye. Mirîşka jîxweyî dike, nevíyê xwera hêka dişîne.

Çima hûn duh ne li dibistanêbûn? Na, duh yekşem bû. R'oja yekşemê ji bo dibistanan tatîle (reh'etîye). Başe, hûn li kîderêbûn. Duh ez bi hevalên xwera li nav daristanê bûm. We li wira çi dikir? Em ji xwera gerîyan, hinekî lîstin, paşê em vegeîyane mal.

Wezîr jî li ba we bû? Na Wezîr got, ezê e'se bêm, lê nehat. Paşê têt kir got, biborînin, hinek mêvanên min ji Moskvayê hatine, ez nikarim bêm.

Ez niha li dibistanême. Ev ode, cîyê dersxana meye. Eva mamosteyê meye. Wexta dik'eve hundir em ji pêşva r'adibin. Ew mera dibê, zarno, r'ojbaş! Em jî bi dengekî bilind dibêjin, r'ojbaş mamoste!

Spartin

1. Nivîsara jorîn deftera xweda paqij û r'ast binvîsin, r'engdêra bijbêrin û binê wan xêz bikin.



Xwestek yek, ziman cûda...

R'ojeke payîzêye xweş bû. Çar heval bi hevra derdik'evine r'êwîtiyê. R'ojekê duda, sisya r'e diçin...

P'erê wan xilas dibin. Cem her çara sed t'enge p'ere dimîne.

Xortê ku pêşiyê d içe, bi zimanê qazaxî dibêje:

-Êy, **ciğîtter** (xortno), bi wan p'era emê k'îlok **juzim** (tirî) bik'irin, bixun.

Xortê k'urd dibêje:

-Na xer, emê k'îlok tirî bik'irin, bixun, paşe xudê k'erîme.

Yê ûris dibêje:

Nêt (na), emê k'îlok **vinograd** (tirî) bik'irin.

Xortê faris dibêje:

-Na xêr, emê k'îlok **engur** (tirî) bik'irin.

Bi vî awayî her çar xort hevdu nakin, dengê xwe bilind dikin. Hevra r'ê naçin. Vî dengê wan r'êwîk dibhîze, tê t'evî xeberdana wan dibe, wana diseqirîne û dibêje:

-K'a, p'erê xwe bidine min. Ezê bi wan p'erava xwestina we bînim cîh.

Kalê p'era hildide, diçe k'îlok tirî dik'ire. Ber wan datîne û dibêje:

-Niha k'eremkin bixun, xwestina we hate cîh. Fikr û xasteka we yeke, lê zimanê we cudaye.

Xort hevdu h'emez dikin, tiryê xwe duxun. Paşê dik'evine r'ê û diçin.



Mah'abad (R'ojhilatê welêt)



Qamûşlo (Başûrê r'ojavayê welêt)

Weten

Ji weten çiqas dûrk'evî,
Çiqasî bigerî li welatê der,
Bi h'esreta wê tuyê paşda bêyî,
Çawa teyîr-tu tên her bahar.

Bê weten meriv bêmale, êtîm,
Bê weten r'eşin r'ojê e'mrê wî,
Weten gişkara dayika miqîm,
Bê dayik zar birçîye û tî.

Ax weten, weten h'eyra dilê min,
Tu nefesa min her sae't û gav,
Bona navê te qet t'une mirin,
Bi navê te nizamim tu saw.

Mik'aêlê R'eşît




Hewlêr (Başûrê welêt)



Mîdyat (Bak'urê welêt)

Pirs

Helbesta jorînda çend hengdêr hene?
() heft () Çar () Deh () Yanzdeh () Neh



H'ezkirina çivîkan

Li ser dara h'ewşa me gelek çivîk hene. Wextê ku ez dertême devra, dibînim ku li ser şaxên darê cûre-cûre çivîk datînin.

Hinek ji wana r'eşin, hinek belek-belekîne û hinekjî r'engê zerînin. Ew çivîkên ku r'engereşin (r'eşbelekin) nukulê wan hinekî mezine. Ew hêîna xwe di dîwarên malada, di qulada çêdikin. Lê yê ku belek-belekîne, hêlînên xwe li ser şaxên darê, di cîyên asêda çêdikin.

Ez wana gelekî h'ez dikim, lema cama ceh, genim direşîname bin dara, ew jî tîn û bi nukulê xwe dixun. Carna jî naxun, t'enê di nukulê xweda digirin û difirin diçine hêlîna xwe. Wê wextê ez zanim, ku t'enê bona çêlîkên (cûcîkê) xwe dibin. Ez gelek şa dibim, wekî den direşînim ber wan, diçe û dik'eve devê çêlîkên wana jî. Ewê jî wextêda mezin bibin û bîn ser darê daynin û ji minra bixûnin. Ezê dengê wanî xweş guhdarî bikim û bextewarbim. Ew çivîkê r'engîn, baharê ji mera tînin mizgîn.

.....

S partin

Nivîsara jorînda r'engdêr hene. Çend ji wana binî xêz kirine, yên mayîn jî hûn bidine k'ivşê.

R'astrnivîsara jimaran

Bi saya jimaran em zanin meriv yan jî tişt çandin û çiqasin. Jimar him bi nivîsarê, him jî weke r'eqem tê nivîsandin. Jimar bi k'urdî aha têne nivîsandin û gotin:

0 sifir (nîn)	11 yanzdeh (yanzde)
1 yek	12 diwanzdeh (danzde)
2 du (dudu)	13 sêzdeh (sêzde)
3 sê (sisê)	14 çardeh
4 çar	15 panzdeh (panzde)
5 p'ênc	16 şanzdeh (şanzde)
6 şeş	17 h'eftdeh, h'ivde (h'evdeh)
7 h'eft	18 h'eştdeh (h'ejdeh) nozdeh
8 h'eşt (h'eyşt)	19 (nozde) bîst
9 Neh	20
10 deh	

100 sed	Yekem	1. Yekemîn
200 Dused (dusud)	Duyem	2. Duyemîn
300 Sêsed (sesid)	Sêyem	3. Sêyemîn
400 Çarsed (çarsid)	Çarem	4. Çaremîn
500 Pêncsed (pêncsid)	Pêncem	5. Pêncemîn
600 Şeşsed (şesid)	Şeşem	6. Şeşemîn
700 H'eftsed (h'evsid)	H'eftem	7. H'eftemîn
800 H'eştred (h'eysid)	H'eştem	8. H'eştemîn
900 Nehsed (nehsid)	Nehemîn	9. Nehemîn
1000 H'ezar	Dehemîn	10. Dehemîn

Jimarên dirêj aha têne nivîsarê:

789 Hefsed (h'evsid) h'eyştê neh.

4563 Çar h'ezar pêncsid (pêncsed) şêst û sê (sisê).

23445 Bîst sê h'ezar çarsid çil û pênc.

Spartin

Bi saya jimarên jorîn hevokan avakin û deftera xweda binvîsin. Mînak:

H'esenê piçûk yanzdeh salîye.

Hevnasî

Mecîd : Merh'eba!

Serdar: Merh'eba!

Mecîd: Navê min Mecîde, navê te çîye?

Serdar: Navê minjî Serdare.

Mecîd: Ez p'ir şabûm.

Serdar: Spas dikim, ezjî p'ir şabûm.

Mecîd: Tu li k'îjan ûnîversîtê dixûnî?


Serdar: Ez li ûnîversîtêta Abay dixûnim.

Mecîd: Ezjî li wê ûnîversîtê dixûnim,
p'ara ziman û e'debyatê (fîlologî).

Serdar: Ze'f başe, ez jî fakûltêya t'êk'ilîyên
navnetewîda hîn dibim. Wi çaxî emê
hev bibinin.

Mecîd: Dema xatirê te.

Serdar: Serçavanra hatî!



Sae't çende?

Merivayê bona zanebûna wext sae't îcat kirine. Her k'esîra girînge ku sae'tê, r'ojê bizanbin. Sae'tê dîwara û sae'tê desta hene. Nava bajêrda jî sae'tên qule hene. Em bi alîk'arîya wan dizanin k'a wext çîye.

Berê sae'tên qûmê, yê avê û r'ojê hebûne. Merivên berê, wext pê r'ojê tê derdixistin. (R'oj derk'et, bilind bû, çû ava) Wekî em bixwazin sae'tê hîn bibin, em aha bipirsin:

- Sae't çende?

Heger beri nîvro be, yê hember me dibê:

- Deha panzdeh deqîqe derbazbûye (10:15).

Lê heger piştî nîvro be aha tê gotinê:

-15:45 (panzdeh û çîlpence), yan jî şanzda panzdeh kême.

Heger sae't hatibe nîvî wê wextê aha tê gotin:

- Sae't sanzdeh û nîve (16:30). van îî h'evdeh û nîve (17:30).

rJjp.

MSJGM

w

SAE'T

Sae't yek	:(01:00)	Yek û nîv	: (01:30)
Sae't dudu	: (02:00)	Duduya 15 deqe derbazbûye	: (02:15)
Sae't sisê	: (03:00)	Sisêya bist derbazbûye	:(03:20)
Sae't çar	: (04:00)	Çara pênc derbazbûye	:(04:05)
Sae't pênc	: (05:00)	Penca deh derbazbûye	:(05:10)
Sae't şeş	: (06:00)	Şeşa çil derbazbûye	: (06:40)
Sae't h'eft	: (07:00)	H'efta pêncî derbazbûye	: (07:50)



Yekê h'eft kême	: (12:53)	Salek 365 r'oj û 52
Duduya hejdeh keme	: (01:42)	h'eftene.
Sisêya çarîkek kême	: (02:45)	R'ojek 24 sae'te.
Çara bîst keme Pênca	: (03:40)	Sae'tek 60 deqîqeye.
danzde kême Şeşa	: (04:48)	Deqîqeyek 60 saniyeye.
sêzdeh kême H'efta bîst	: (05:47)	
û çar keme	: (06:36)	




Bersiva van pîrsan bidin

- R'ojek çend sae'tin?
- Sae'tek çend deqîqene?
- Deqîqeyek çend saniyene?

Ciyên vala t'ijî bikin

- | | |
|----------------------------------|-----------------|
| -T'rên sae't..... da radibe. | Yanzdeh û nîvda |
| -Em piştî nîvdik'evin rê. | Sae'tî |
| -Günde me ji vira..... dûre. | Deh û nîvî |
| - Afto sae't hatîye vira. | Du sae't |
| - Êvarê sae't..... were mala me. | Heştanda |
| - Ez şeve sae't r'adizêm. | Çar û çilîda |



K'URDISTAN

***Welatê me K'urdistane, Cf-
miskenê me k'urdane, Welat
mera r'uh û cane, Milet teda
birane.***

***K'urdistana me zeynete,
Cime'ta we pir h'urmete,
T'emam qedre û qîmete,
Walat mera cinnete.***

***Welatê me p'ir şirine,
T'emam mêrgin û zevine,
Qiz-xortê ^{mrê} few cindîne,
E'slêd xweva arîne..!/
^***

***Welatê me K'urdistane, Cî-
miskenê me k'urdane Miletê
wê few birane, Sulh'edîn*
bavê k'urdane!***

fla 1



Mecîdê Silêman.

* Selah'edîn Eyûbî. ^

LÊKER (FÊL)

Ew xeberên r'abûn, r'ûniştin, çûyîn, hatin û kirina merîyan, bûyîna kirina nîşan dikin, li r'êzimanêda jêr'a dibêjin lêker.

Lêker bersîva van pirsê dide: **Çi dike? Çi kir? Çi kirye?**
Zîne k'itêbê dixûne. Narê baxçe paqij kir. H'eso sêv berav kirin.
Sê k'omên lêkeran hene, ew jî evin:

- 1- Lêkerên sade,
- 2- Lêkerên hevedudanî
- 3- Lêkerên pêkhatî.

Gora vê yekê hanê r'êzbûna van k'oman jî ahaye:

Lêkerên sade: Ji k'ok û paşpirtikekê ava dibin.

Mînak:

kir, ani, bir, xwar, k'et, bijart, xist.

Lêkerên hevedudanî: Ji pêşpirtikên hevedudanî ava dibin. Ev pêşpirtikjî evin: ***r'a, hil, wer, da, ve, jê, vê, tê, lê.***

Mînak:

R'akir, hilda, wergirt, dada, vekir, jêkir, vêxist, têderxist...

Lêkerên pêkhatî: Ji k'elijandina lêker û p'irtikekê(qertaf) ava dibin.

Mînak:

K'el-ijand, qel-and, fir'-and, ger'-and, bez-and...

Lazime em bizanbin:

Zimanê k'urdîda du p'arê lêk'eran hene. P'ara yekê lêkerên

derbazdarin, ya duda jî lêkerên **nederbazdarin.**

Lêkerên derbazdar bireserê (nesne) digirin: Te ***ez k'enandim...***

Lêkerên nederbazdar bireserê nagirin: ***Ez diçim, em hatin...***

Mar û r'ûvî

R'ojekê mar û r'ûvî dibin destbirakê hev. Gelekî hevra diğerin. Paşê dijmintayê hevra dik'işînin. Yek dixwaze ecêbekê bîne serê yê dinê. Yek, yekî nikare. Ewana wextekî diçin ber avekê, dixwazin derbazî wî berîbin.

R'ûvî dibêje:

-Bira, tuyê derbaz bibî, lê ez nikarim. Ez nayê. Tu derbaz dibî, derbazbe. Her'e, lê me gelek emek hevra k'işandîye, gelek şixul tev hev kirine, tev xwarîye, tev vexarîye. Were berî çûyîne em emekê xwe li hev h'elal bikin. Devê xwe bîne em hevdu paçkin, paşê diçî, h'ere, şuxulê teye, hemîn ez nayê.

Mar devê xwe dirêjî ber devê r'ûvî dike. R'ûvî serê mar dike nava diranê xwe diqetîne. Pey wê yekê'a çendek derbaz dibe, laşê mar r'ast dibe.

R'ûvî dibêje:

- Bira, a biratî awa r'astîyê dixwaze.

Li jêrîn çend hevok hene, ji wan hevokan k'îjanada lêkerê sade hene bidin k'ivşê.

- 1- *R'ojname derk'et.*
- 2- *Birayê min avto da k'irîne.*
- 3- *Şamil çar k'itêb da çapkirîne.*
- 4- *Mêvanên me hatin.*
- 5- *Ew piştî civîne çû.*

- 6- *Îro med a kovar (jûrnal) anîn.*
- 7- *Jîyana min çîroke.*
- 8- *Ez k'ilaman gelek h'ez dikim.*
- 9- *Minra p'aste (tort) hatîye çêkirîne.*
- 10- *Ordîxan diranê xwe daye çêkirîne.*

Hevokê jêrînda lêkerê derbazdar ji h'alê erênî bînin h'alê neyînî.

- | | |
|-------------------------------|-------------------------|
| -Cindî k'itêbê dinvîse. | Cindî k'itêbê nanivîse. |
| -Dewrêş sêv anîn. | |
| -E'hmed qîmetê xwe zane. | |
| -Fetî k'arê xwe h'ez dike. | |
| -E'tar laqirtîya dike. | |
| -Mûsa dibistanêda xwendîye. | |
| -E'zîz r'ênçberîyê dike. | |
| -E'gît serwêrîê dike. | |
| -Çerkez gelek bîranîn hiştine | |

Li jêrîn çend hevokên lêkerên nederbazdar hene. Hûn jî h'alê wan yê pirsê bi cûrê **çima** li hember binvîsin.

- | | |
|-------------------|----------------|
| -Gulê hat. | Çima Gulê hat? |
| -Gulîzerçû. | |
| -Gulbahar k'et. | |
| -Şemam r'ûnişt. | |
| -Besê difikire. | |
| -T'êlî hilkişîya. | |
| -Zerê r'azaye. | |
| -Êmîne digirî. | |
| -Medîne diçe. | |

Gotinên kal-bava

**Şixul bi aqil pêşda diçe.
Av r'êya xwe dibîne.
Aqil ne e'mirdaye, ew serîdaye.
Xeber hene zêr'in, xeber ji hene ava çêr'in.
Hesp sîyarê xwe nas dike.**

Çand û dîroka me hebûna meye

Fikra zanyara derheqa çand û dîroka k'urdada

Gelek zanyarên navdare e'yan û r'êwîyên bi nav û deng, yên sedsalêd derbazbûyî derheqa k'urdada, kûltûra wêye kevnar, zargotina wêye dewlemenda fikrên zêrîn gotine. Akademik û r'ojhilatzanê e'yan H. A. Orbelî pêşxebera berevoka «Derheqa heyk'elên dewrana R'ûstavêlîda» dinivîse, wekî k'urda ewledên xwe bin navê azerîya, farisa, t'irka, e'reba, ermenîyada hinda kirine, ewled, navê k'îjana çawa şaîr, zanyar, sazband, e'gît, serleşk'erê bi nav û deng dîroka gelan xemilandine û dixemilînin.

Ulumdarekî dinêyî e'yan N.Yak. Marr' bi dilovanî nivîsiye, wekî kûltûra k'urda nava çanda R'ojhilata Nêzik û Navînda gelekî kêrhatî û k'ardar bûye. Ew tê ser wê fikirê wekî me'na wê yekê.ew azayîh'ezîya k'urdane, ya ku zelal folklor, k'ilam û r'eçasên wêda tê k'ivşe.

H'îmdarê e'debîyata ermenîyayî nû X. Abovyan, yê ku p'ir caran bibû mêvanê k'urda û p'ak zanibû habûn-r'ûniştandina wê cimae'ta kevnar, heyne xweda nivîsiye, wekî folklor k'urda pêjda çûye û gihîştîye dereca herê bilind. V. F. Mînoriskî jî guhdarîya ulumdara dik'işande ser pirsê e'debîyata k'urdaye dewlemend û p'irjanr.

Ulumdar Blaû, ye ku gele wext pirsê çanda k'urdê îranêva mijul dibû, dinivîsî, wekî qebîla k'urdaye here pajdamayî jî bi k'ilam û bi miqamava dewlemende. Aha, ew bûye me'ne, wekî gele ulumdara heyne xweda cûrê zargotina k'urda beravkirine, nivîsîne û h'eyr-h'ejmek'arê wê mane. Beravkirê folklor ermenîyayî e'yan G. Sirvanstyan sala 1904-a nivîsiye, wekî merivê, ku zimanê k'urdî p'ak bizanibe û folklor k'urda beravke, ew dikare k'areke mezin bide ulm û zanîstê...

.....

Spartin

1. Nivîsara jorînda lêkerê hevdu danî bidin k'ivşê.

2.Л van lêkerên hanê (dadan, badan, vekirin, wergirtin, hildan, venîştin^abûn, lêkirin, jêkirin, çêkirin) hevokan ava bikin û deftera xweda binvîsin.

Li jêrîn çend hevok hene, van hevokanda k'îjan lêkerê pêkhatîne binê xêz bikin.

Mesele: Ev xwendek'ar baş dixûnin.

- 1- **Min bare giran fakir.**
- 2- **Ew berbi çiyê hilk'işya.**
- 3- **H'esen berjêr dak'et.**
- 4- **Ewî genim r'ijandin.**
- 5- **Aslîkê k'ilam gotin.**
- 6- **Qazî em sûcdar dîtin.**
- 7- **Ez dersê xwe dixûnim.**

Gotênên kal-bava

**Ez axa, tu axa, kê golika bibe nav baxa.
Masî be'rêda mezin dibin.
Ga bi cila nas nakin.
Ez zîkê wî dixim, ew dibêje wey li min pişt.
Werîsê derewa kine.
E'zabê cînarîyê ezabê girane.
Şêr şêre, çi jine, çi mêre.
Dirba ku nan dibire, şûr nabire.**

Li jêrîn çend hevok hene, k'îjanada lêkerê pêkhatî t'unenin, bidin k'ivşê û îşaret (xêzik) daynin li ber.

- 0 1- **Ji germa ez şewitîm.**
- () 2- **Çivîkên r'eş li vira qelîyan.**
- 3- **Osman bilûrvane.**
- 4- **Wî em betal kirin.**
- 5- **R'esûl hesp fevand.**
- () 6- **Wê xwarin çekir.**
- 0 7- **Ez r'ewîme.**

Têderxistinok

Bûzê dişkênim,
Zîv derdik'êve,
Zîv dişkênim,
Zêr' derdik'êve.



Berav dikî
barê gane,
datînî e'rdê
weke çîyane



Ew çî ye?

kêh

Ew çî ye?

nok

Hevokên jêrînda lêkerê sade hatine derxistinê, hûn bi cîh bikin.

- | | | | |
|--------------------------------------|----------|-------------------------------|----------|
| 1- Wî h'eywan | ? | Wî heywan <u>anîn</u>? | |
| 2- K'ê pamîdor | ? | | 7 |
| 3- Te ji bavê xwe dirav. | ? | | ? |
| 4- Dildar kurê xwera çî..... | ? | | ? |
| 5- K'ê li dîwanê | ? | | ? |
| 6- Ew li k'êderê jîyan..... | ? | | 7 |

Hevokên jêrînda lêkerên hevedudanî hatine derxistin, bi cîh bikin.

- | | |
|---------------------------------------|-----------------------------|
| 1- Dayikê lempe | Dayikê lempe vêxist. |
| 2- Emîne derî | |
| 3- Wî kurtikê xwe | |
| 4- T'êlman..... jorê. | |
| 5- Kevanî xwarinê | |
| 6- E'wrên tarî ji ser me | |
| 7- Min şiklê kevin | |

Îskender û Dîyogên

R'ojek ji

r'ojan îskenderê

Mezin meraq kirîye, ku filosofê e'yan Dîyogên (Dîyogên) bibîne, çimki navê wî di nav miletîda zâda e'yanbû. Peyayên xwe hildide û diçe, ku Dîyogên bibîne.



Wexta ku îskenderê Mezin t'evî peyayên xwe tê, wê gavê Dîyogên li k'êleka çemekî bûye. Li ber tavê r'ûniştîbûye. Îskender nêzikî wî dive. Lê ew ji cîyê xwe r'anabe. Îskender dibê:

- Ez îskenderê Mezinim!

Filozof Dîyogên qet beşera xwe naguhêze û dibêje:

- Ez jî Dîyogênim!

Îskender metêlmayî dimîne. Çimki h'etanî niha k'esî li nêşberî wî usa nekirîve. Ew r'astî

k'e hatiye, tewa r'êzdarî û h'urmet nîşanî wî kirine. Çimki her k'es ji îskender ditirsîya.

Îskender ji Dîyogên dipirse:

- Tu ji min natirsî?
- Na, çima tu zilamekî xedarî?
- Her k'es minr'a dibêje tu zilamekî başî.
- Wê wextê bona çi ezê ji te bitirsim?

Gunê îskender bi Dîyogên tê, dixaze alîk'arîyê bidê. Dibêje:

-Xuyaye (tê k'ivşê), tu zilamekî feqîrî, belengazî, tişteki te tune. Çi dixwazîji min bixwaze, ez hikumdarim, ezê bidim te.

Dîyogên lê dizivire û dibêje:

- **Sî neke**, wekî din tişteki ji te naxwazim!

Spartin

R'asthatina îskender û Dîyogên bi gilîyê xwe qîsekin, me'na wê şirovekin.

Bûk û stûn



R'ojekê xasîyê ji bûka xwera got:
- Qîzê, qîzê ca r'abe, hinek ar ji t'êr'ê
derxe bîne. T'êr jî danîbû pişt stûnê.

Bûk jî r'abû çû destekî xwe vî
alîyê stûnêr'a bir, destê din jî wî
alîyê stûnêr'a bir, stûn k'ete orta

herdu destên wê. K'ulma xwe tijî ar kir, xast, ku bîne, stûn herdu destê
wêva asê bû. Ne ew bû ku, ar valake, destê xwe ji stûnê berde, ne jî
destê wê ji stûnê derdik'et.

Xasî r'abû çû gazî navserê gund kir, got: - Werin, destê bûka min
stûnê asê bûye, venave.

Navser hatin. Aqil avêtin ser aqila gotin:

-Bînin em destê wê bibirin, ku bûk jê xilasbe.

Anîn bir'ek (xizer) danîn serzenda bûkê, ku destê wê bibirin, bûkê
nişkêva destê xwe r'evand, arê destê wê rijîya e'rdê û destê wê ji stûnê
derk'et. Navseran bi hevra kirin qîrîn:

-Wey, şikirxudê bûka me çi aqile...

Lo, lo, Bek'iro,

Lo, lo, Bek'iro, Çilke
qendo-şekiro, Min pey
diza war kiro, Diza tirê
keviro, Min hilda qendo-
şekiro.

Cafere

Cafere qelendere, Hespê
bozê zîn sere, Ca serê
Sîpanê Xelatê, Hewara
xûşka xwe werê.

Tiştonek

P'îşo, p'îşo nergîzo, Çu
ber avê dengîzo, Ne gur
dixwe, ne dizo.

Şev xemilî,
Ro betilî.

Ew çîye?

kîşip'

Hespê boz, Afirê
quloz, Pêbengê lê,
Çivta davê, Sor
dixwe, Spî davê. Ew
çîye?

şa û mineg

Ew çîye?

ariç

Tiştêkî min heye,
Dev dirêje, Xun
dirêje, Dest
davêjimê, Ber
davêje.

Ew çîye? _____

gnivit

Bahar

Quling k'îşyan, çîya h'esyan, Gelîyêd
k'ûrîn kirine xûşîn, Berf hilk'îşyan, av
r'ak'îşyan, Çem xulxulîn, e'wr
gimgimîn.

Kulîlk şîn bûn û dil şabûn, Der û
çîman gîşk bûn zozan, Kerî r'êzbûn
hevraz hêlbûn, Şivan, gavan çîyê bûn
mêvan.

Fêrikê Usiv

Pirs

P'erçê jorînda çend lêker hene?

() Çardeh () Neh () Deh

() Yanzdeh

() Sêzdeh



Zir'a k'erê, lota devê

Di mêrgê deve û k'er,
Diçêrîyan ser bi ser,
Goştê wan tev bûye bez,
Ne sewal û ne jî pez.

Mexel bûne ber li hev, Bi
ser wanda hatî şev, Devê
go: tira mi tê, K'erê go:
zira mi tê.

Devê zû göte k'erê, P'ir
nêzîkî meye rê, Dibî hebin
rêbiwar, Wê me bajone
bin bar.

Ez ne xurtim wek cara,
Pişt kul bûye ji bara, Ti jî
wek min bike tir, Nebî, bikî
zir'e-zir'.

Lê ew k'erê ter gîya, Sivik
r'abû ser p'îya, H'eta jê
hat kire zir', Ew çol ji deng
tije kir.

Kerwanek diçû di r'ê,
Çawa hat dengê k'erê,
Yekî ji nava kerwan, Barê
k'erê wî giran.

Go: wa, dengê k'erê tê,
Vaye li vê derê tê, Du k'es
derk'etin ji rê, Berê
xwedan cem k'erê.

Pirs

Şaîr bi serî devê û k'erê aqilbendî û beaqilîya meriva çawa
dide k'ivşê?

Cegerxwîn

Çawa gihane mêrgê, Dîn
ku k'er û deve lê, Ew
herdu dane ber xwe, Li
wan kirin bare xwe.

Xuyaye k'er nezan bû,
Barê wî p'ir giran bû, Xwe
avête ser qadê, Nema
diçim bi xwedê.

Çiqas lêdan wan bi dar,
K'erê xwe kirwek mirar,
Barê wî jî dan devê, Ma
wê çibkî wê şevê.

Demek dî jî r'aborî, Bû
firta-firta wî k'erî, Wê şevê
û wê revê, Ew jî danîn ser
devê.

R'ewşa devê bû nexweş,
Bu zirzira k'erê reş, Devê
jêre gazî kir, Go: te ya
xwe bi min kir.

Heta lota mijî bê, Tê
bibêhî wê ça bê...



Heqî wunda nabe!

Carekê gundîk çend peza dide pêşîya xwe, diçe bajêr wekî bifroşe. R'êva merîk r'astî wî tê dibêje:

-Oxirbe bira, tu k'ûda diçî? Gundî dibê:

-Pezê xwe dibime bajêr, wekî bifiroşim.

-Mêrik divêje:

-Welleh, ez bik'irçiyê pezê teme, ezê pezê te bik'irim. Hev qayîl dibin, mêrik gundîra dibe:

-Heqê pêz ez naha nikarim bidim, cem min haqas p'ere tune, hema em gihîştine şêher, ezê p'era bînim bidime te.

Çûn gihîştine şêher, gundî kir-nekir mêrik heqê pezê wî neda û got:

-Na û na, eva pezê mine, p'erê çi? Tiştê çi? Tu derewa dikî!

Çûn cem qazî. Qazî şikyatê gundî bihîst û got:

-Şe'dê (şeh'ed) te hene?

Gundî got:

- Na.

Qazî got:

- Wexta we bazar dikir kî hebû li bal we? Got:

- Qe t'u k'es tunebû. Lê got:

- Qe der-dora we çi hebûn?

- Xêncî zinarekî, tiştêk t'unebû.

- Dikarî herî wî zinarî bînî?

- Çima na? Gundî vegeyîya, kir ku her'e, mêrikê, ku pêz jê k'irîbû k'enîya.

Qazî vegeyîya û jê pirsî:

- Çima dik'enî?

- Qazî, ev bêaqilê ça her'e ewî zinarî barke bîne? Lema jî ez dik'enim.

Qazî got:

- Wekî usane, gilîyê gundî r'aste. Heger te ne dîtîye, lê ciyê zinar ji ku zanî?

Qazî wî berê jî wî berê dîtiye, dide wunda

Pirs û s part in

Qazî heqî û neheqî çawa safî kir?

Nivîsara jorînda çend lêker bini xêzkirîne, yê din hûn bini xêzkin.

RADER-MESTER

Ji wan xeberanra dibêjin **mester**, yên ku navê kirinê û bûyînê nîşan dikin. Mesele: **nivîsandin, xwendin, sitendin, strandin, hiştin, kuştin, hatin, mayîn, mirin, xwarin, k'etin, çûyîn, firotin, gotin, nalîn, zarîn, r'istin, r'êtin, xwestin, nihêrandin û yêd mayîn.**

Mester têne xebitandinê, mîna navê ser cinsê mê û cûrê xwe hevbendîda pirtika a distîne: Nivîsandina k'itêbê, strana k'ilama, gotina te, hatina xort, lîstika kurmancî, firotana nan, dotina pêz, xwestina min û yê dinê.

Mesele jorîn nîşan didin, ku mester di forma xweye dawîyêva tê gotin ser van pirtika: **in, n ,an, yîn, îin, ûin.**

in : kir-in, bir-in, hat-in, sitend-in, çand-in, lêxist-in...

n: stra-n, kota-n, hêra-n, k'ola-n...

yîn: bû-yîn, çû-yîn, da-yîn, ma-yîn...

îin: gir-îin, bir-îin, k'ir-îin, nal-îin, çin-îin, zar-îin, k'en-îin, rev-îin, fir-îin...

ûin: r'ab-ûin, p'evç-ûin, belab-ûin...

Di kurmancîda sê pirtikên afirandina demê hene. Ew hersê pirtik evin: di, bi û ê (yan jî wê).

1- Pirtika di didin xebitandinê bona çêkirina wexta niha û wexta berê dirêj.

Mesele:

a) Ji bo wexta niha

Ez dinivîsim. Tu dixûnî, Ew dixebite, Hûn dir'eqisin. Tav dibiriqe. Îro baran dibare. Îsal em rind pêşda diçin.

b) Bona wexta berê dirêj:

Duh min dinivîsî, Te dixwend, Ew dixebitî. Şevê dinê şagirta dilîst. Zarok direqisîn. Baran duh êvarda dibarî. Em rind pêşda diçûn.

2- Pirtikê **bi, û, ê**, (yan jî **wê**). Pirtikên **bi, û, ê**, didin k'ivuşê wextê wê bê û wexta berê şertî. Pirtik zêdeyî ser pêşîya fêla dibe. Lê pirtika ê yan jî wê ser xwedanfêl(cînavk û navan)da zêde dibe.

Mesele:

a) **Bona wexta wê bê:**

Ezê binîvsim. Tuyê bixûnî. Ewê bixebite. Emê binîvsin. Hûnê bireqisin. Baranê bibare. Sibê emê bişînin. Hunê k'itêban bixûnin.

b) **Bona wextê berê şertî:**

Duh minê binîvsîya. Teyê bixwenda. Ewê bixebtîya. Emê bihatana. Hûnê biçûna. Êvarê emê tev biçûyana. Weyê bilîsta. Baranê bibarîya. Meyê bişanda. Ewanayê bigota. Meyê bixwenda.

Xeberdana pê têtêfonê

-Alo, ew k'îye?

-Navê min E'zîze. Ez li mala E'vdile diçerim. Gelo ev t'êl ya wane?

- Erê, ez kurê E'vdile me, navê min Meh'mede.

- Kurê, bavê te li male?

- Erê apo, bavê min li male.

- Ca gazîkê, çira min!

- Ve gave, ezê gazîkim. Deqeyekê...

- Apê E'zîz, selamûaleyk'im, çawayî, başî?

- Kurê, ez zeh'f r'azîme, başim. Ber'ya niha wî kurke te têt hilda, welehî min dengê wî nas nekir.

- Ê, Apê E'zîz, ev çend salin te ew nedîtîye. Xort mezin bûye, bûye zilam.

- De înselâh, xwedê e'mrê direj bidê.

- Gelek spas, xwedê te ji me kême neke, apê minî delal.

- Kurê, ev çend cara ez têla we dixim, venabe, çima gelo?

- Apo, weleh ez nizanim, ez wekî dizanim têla me dixebite. Hinekî zarok p'ir diaxivin.

- De başe kurê, min zûda h'alê we nepirsîbû, min got k'a h'alê we çîye?

- Apê E'zîz, zor spas! H'alê me başe, qe meraq nekin, zarok jî mezin bûne, şikir diçine dibistanê.

- De şikir, şikir mer'a carna t'êlêxin.

-Ser çava.

- De bi xatirê te.

- Oxirbe, wek'ilê silavanbe.



Mijulîyê cimae'tê

Qencî

Yekîji aqilbendekî pirsî:

-Gelo merî çî bîra xweda xweyîke û çî bîr bike, wê başbe?

Aqilbend gotê:

-Eger yekî ter'a qencî kiribe, wê yekê bîr neke. Lê eger te yekîra qencî kirîye, wê yekê bîr bike.

Cudakirina qenc û xiraba

Yekî ji k'ûçkekî pirsî, go:

-Çir'a ser r'êya me k'etî?

Go:

-Wekî qenca û xiraba ji hev cuda bikim.

Go:

-Tuyê wana çawa ji hevdu cuda bikî?

Go:

-Ew merîyê qenc ji minra dengê xwe nakin, dihelin diçin, lê yê xirab ne ser tu, ne bertu kevira davêjine min.

Hevalê qenc

Yekî göte yekî:

-Çawa zanibin hevalê qence, yan xirabe?

Go:

-Eger serê rê be, eger malda be, ew hevalê ku şuxulê xwe nake, lê hîvîya hevalê xweva dihêle ew xirabe.

Ez ji bona xwe dibezim...

Nêçirvan te'jîyê berdide dû kewrîşkê. Te'jî nikare k'ewrîşkê bigre. Te'jî ji k'ewrîşkê dipirse:

-Ew çawane ez haqasî dibezim, dibevim, lê te nikarim bigrim.

K'ewrîşk dibêje:

-Çimkî ez ji boy xwe dir'evim, lê tu ji boy hineka...

Spartin

Wan mijûliya bixûnin, me'na wan şirovekin.

ÇARÎN

Bihare berf dih'ele,
Bedewe dil dih'ele,
Ji qîrîna e'rş û e'zmîn,
Hişyar dibin kulîlkên bîn.

Dinya şîrîn dinya jehrîn,
Hinek şane, hinek digrîn,
Gelo çima dilê însên,
Hêvîdare ji bo mizgîn?

Carna şa dike dilê însîn,
Cama dike kul û birîn,
Gelo k'engê wê azabe,
K'urdistana meye r'engîn?



Tu h'esreta dilê

bengî,
Tu melh'emî h'ezar r'engî,
Çavê m çavê te dik'eve,
Min ji tirê dinya eve...

T'ebyet sire, sira salan,
Ew e'cêbê sal û zeman,
T'u k'esîra nabin e'yan,
T'u k'es nizan jana dilan,
Xêncî Sîyabend, Memê Alan.



Dîyar ji xewê hişyar dibe



- R'ojbaş, dayê!
- R'ojbaş kurê min! T'êr r'azayî?
- Erê dayê. Xewa min p'ak bû, Ze'f baş r'azam.
- P'ake kur'ê min, ser-çavê xwe bişo, ez ter'a taştê daynim.
- Dayê, k'a bavê min û xûşka min?
- Kur'ê min, ew zû rabûn, çûne ser doxtor.
- Çima dayê?
- Diranê xûşka te dileqîya, dêşîya, çûn ser doxtor, wekî bik'şînin.
- Dayê, lê k'îngê diranê minê bileqe? Wekî ez jî bavê xwera herim doxtor?
- Her r'oj wextêda r'abe, sportêva mijûlbe, diranê xwe bişo û xarina xwe bixe, tuyê mezinbî, wî çaxî diranê teê bileqe, tuyê jî bavê xwera herî ser doxtor.
- Bû dayê, ezê her r'oj wextêda rabim, diranê xwe bişom, sportê bikim û paşê jî xarina xwe bixum, nolî xûşka xwe aqilbim.

Xeberên r'ojane*

- R'ojbaş! (sibexêr!) ----- ►** Ji bo serê sibê,
- Dembaş! (merheba, r'ojxêr) ----- >** Ji bo her wextê,
- Êvarbaş! (êvarxêr) ----- rji** bo êvaran,
- Şevbaş! (şevxaş) ----- >**Ji bo şevê tê gotinê.

*Li komarêd sovêta berêda, usa jî gelek herêmêd K'urdistanêda **xeberên r'ojane** bi awaye cuda-cuda jî têne gotinê.

ÎSMAÎL Û ÎBRAHÎM

Îsmaîl û Îbrahîm brayên cewîne. Ew p'ir ji hevdu h'ez dikin. Sibê zû r'adibin cîyê r'azana xwe berav dikin, ser-cavê xwe dişon, siportê dikin, dûr'a taştê dikin. K'itêb û defterê xwe berav dikin, diçine dibistanê. Herdû jî dersxana VI hîn dibin. Bi gotina mamosteya herdu jî baş hîn dibin.

Îsmaîl ji e'debîyat û zimanê k'urdî p'ir h'ez dike. Ew gelek şêr û helbestê kûrdî, qazaxî, ûrisî ezber zane. Bi xwe jî carna helbesta dinivîse. Mamosteyê wîyî e'debîyatê divêje: "Kurê min, wekî tu guhê xwe bidî ser zargotina cimae'tê û beşê wê bîra xweda xayîkî, tê bivî helbestvanekî baş".

Îsmaîl cem bapîr (kalik) û dapîrê (pîrik) xweye 80 salî r'ûdinê guh dide ser çîrok û stiranên wan.



Îbrahîm jî ji siportê p'ir h'ez dike. Dixaze bive werzençikî (werzişvan) baş. Xûşka wane mezin r'ojhilatzane: k'urdî, e'rebî, îngilîsî, qazaxî û ûrisî zane. Haha ewa ser wêjeye k'urdî lêkolîna dike. Birayê wanî mezin xendevane. Dê û bavê wana mamostene. Ewana ji zarokan p'ir h'ez dikin.

Forma daxwaznamê (erze)

**Serokê Çanda Navenda
K'urdên Qazaxistanêye «Berbangvra**

Daxwazname

Nevîyên min Îbrahîm û Îsmaîl k'oma şeşanda dixûnin. Herdu jîp'irji zimanê k'urdî h'ez dikin. Hîvî (tewaçe) dikim, ku hûn wana qebûlî Dibistana Zimanê K'urdîye Yekşemê bikin.

Bi h'urmet û sîyanet,

Silêmanê Meh'med

25. 08. 2005'ê salê.



Çemê gundê me

Gundê me fêza bajarê Almatêye, navê gundê me Janaturmise (R'îya nû). Wexta dibe bahar, her der hêşîn dibe. Di hewşa mala meda kanîk heye. Ava wê p'ir sare. Weke ava zozanaye. Ji ava kanîya me çem dik'işe.

Dayika min ji kanîyê avê tîne.


Dibê: «Ava vê kanîyê p'ir sare, bo sax'lemîya însên gelek başe.» Çawa bavê min piştî xwarinê t'ase ava sar vedixwe, minr'a jî dibêje: «Keça min, qîzka mine delal, tu jî piştî xwarinê k'ase av vexwe, bona ku zû mezin bibî, bedew bibî.» Ez gilîyê bavê xwe guhdarî dikim. Piştî xwarinê îskanek ava ne ewqasî sar vedixum.

Cama dayika min dibêje: «Keça min, were em herine ser kanîyê.» Ez gilîyê dayika xwe guhdarî dikim û tev dayika xwe diçime ser kanîyê. Alî dayika xwe dikim. Avê dadigirim. Seba piştî xwarinê ez û bavê xwe îsk'anek av vexun. Dayka min bi wê avê xarinê çedike, çayê dik'elîne, hêvîr distirê.

Li jêrîn çend hevokê sade hene, ji wan hevokan k'îjan hevokê pirsêne bidin k'ivşê.

- 1- *Ez diçim malê.*
- 2- *Şemam xwera dilîze.*
- 3- *K'î hate bal te?*
- 4- *Tu çima bêaqilîya dikî?*
- 5- *Werin, em herin parke.*

Masîyê qavanozê (akvaryûmê)



Du masîyê min hene. Herdu masî nava qavanozêda (akvaryûmêda) dijîn. Ez r'ojê sê caran xurek didim wan. Wexta ku ez nêzîkî wan dibim, dizanin ku ezê xarinê bidime wan, lema jî berê xwe didine min û devê xwe vedikin.

K'îngê xwarin dixun û t'êr dibin, xwera dilîzin, nava avêda melevanî dikin. Ez cama jî wanra gilî dikim. Lê ez dengê wan nabîzim.

Derheqa minda çi dibên, ez nabîzim, lê usa seh' dikim, wekî ez ji wan h'ez dikim, ew jî ji min h'ez dikin. H'eywan usane, tu ji wan h'ez bikî, xwarinê bidî wan, ewê jî ji te h'ez bikin.

Li wan hevokanda k'îjan hevokê erênîne bidin k'ivşê.

- 7- ***T'êmûr dersê xwe hazirdike.***
- 2- ***Meryem îro neçûye bal pîrika xwe.***
- 3- ***Ez alî dayika xwe dikim.***
- 4- ***Bavê min p'ir nedihete.***
- 5- ***Çira k'esek li min napirse?***

Li jêrîn çend hevokê sade hene, ji wan hevokan k'îjan hevokê neyinîne bidin k'ivşê.

- 1- ***Du masîyê min hene.***
- 2- ***Ez hojê sê caran xurek didim wan.***
- 3- ***Carna ji minra gilî dikin.***
- 4- ***Lê ez denge wan nabîzim.***
- 5- ***Derheqa minda çi dibên, ez nabîzim.***



Sivorî zarokan h'ez dikan

Sivorî h'eywanên biçûkin. Dêla wan dirêje. Diranê wane pêş tûjin. Sivorî hêlîna xwe kunên (qulçên) darêda çêdikan. Xwarina wan çereze, gûz, behîv, dendik û yêd dinin. H'eywanên p'ir zîrek û jêhatîne. Sivorî t'u caran k'edî nabin. Ew tim li ser darên gûzê dijîn.

Li baxçên bajarê Almatêda gelek sivorî hene û ji merivan natirsin. Merivên h'eywanh'ez gûz û dendikan didin wan. Lema ew hîn bûne û têne bal meriva.

Lê heger destê merivda gûz, yan jî dendik t'unebin, hema dir'evin û xwe dûr dikan. K'îngê hûn çûn parkê bal sivorîyan xwera gûza, yan jî dendikan bibin, ku sivorîyê bedew û xweşik ji we ner'evin.

Wexta hûn destê xwe dirêjî wan bikin, ewê gûz û dendikan bibînin û bi k'êfxweşîyeke mezin berbi we bîn.

Li jêrîn çend hevokê sade hene, ji wan hevokan k'îjan hevokê pirsêye erênîne bidin k'ivşê.

- 1- *Sivorî h'eywanên biçûkin, yan na?*
- 2- *Sivorî hêlîna xwe k'êdera darêda çêdikan?*
- 3- *Li wê parkêda sivorî gelek in?*
- 4- *Merivên heywanh'ez gûz û dendikan didin sivorîyan?*

Pirs

Hûn dizanin dawîya hevoka pirsêda k'îjan niqtenîs (îşaret) heye?

Hevalê min tê mala me mêvanî

Duh ji hevalekî xweyî nêzik min mek'tubek (namek) stand. Di mek'tubêda nivîsîye, ku piştî sê r'ojan şûnda wê bê bal me. Hevalê minê bi firindê (balafir) ji bajarê Astanê bê Almatê. Wê çend r'oja li mala me bimîne û hêsabe.

Min dê û bavê xwe'ra got, ew gelekî şa bûn. Dayika min got, lawê, ezê ji wer'a xarinên ze'f xweş çêkim.

Min ji bo hevalê xwe qeyder'ojek (p'rogramek) hazir kir. Ev bemame ji bo 5 r'ojane. Di nava van pênc r'ojanda ezê wî li k'îderê bigerînim, emê herine k'îderê, ezê wî bi k'îjan heval û hogirên xwera bikim nas, yeko-yeko min di bernamêda nivîsîne.

Di destpêkêda ezê wî bibim dibistana ku lê dixûnim. Bila wira nas bike. Paşê ezê heval û hogire xwe pêra bikim nas.

R'oja duda emê herine parka mezin, k'îjan ku nava bajarê Almatêda ya here nav û denge. Di hundirê parkêda her tişt heye.


R'oja sisya emê tevî dê û bavê min herine mala meye havîngehê. Ew mala me li bin çîyayê Alatûêye, dik'eve jora bajêr. Li wira hewa gelek temîze, hênike. Avên sar gelekin, hêşînayî ze'fin û cîyê seyrangê hêne. Paşê emê herin Mêdeoê û Çîmbulakê t'êr bigerin.

R'oja çara emê herine mûzêya Almatê. Li wira gelek tiştên dîrokî hene. Piştî nivro jî emê herine golên Almatê û li wira bikevine avê. R'oja pêncan jî bavê min gotîye, emê gazî qewmê xwe bikin, li malê emê xarinên xweşik çêbikin, bila hevalê te, qewmê te nas bike.

Bernama pênc r'ojan hazire, min deftera xweda nivîsîye. Paşê jî ezê, tevî dê û bavê xwe, hevalê xwe bibim aîroporta Almataê ver'êkim. Ewê firinda Almati-Astanê sîyarbe û her'e bajarê xweyî hezkirî -mala xwe.

Spartin

Deftera xweda derheqa hevaltî û biratîyêda nivîsarekê binvîsin.



Sersala we pîroz be!

Ez sersala we ji dil pîroz dikim, ji wera kêfxweşî
û dilgeşîê daxwaz dikim, silavên xwe yen germ
pêşkêş dikim.

Mizgîn

Cejna we pîroz be!

Ez cejna we ji dil pîroz dikim, ji wera kêfx, û veşî
dilgeşîê daxwaz dikim, silavên xwe yên germ
pêşkêş dikim.

R'ewşen

Pîrs

Hûn jî cejna heval û hogirên xwe pîroz dikin?

Min Newroz çawa nas kir

Di heyamê meda cejna Newrozê qedexe bû. Li gel ku ez bi e'mrê xwe ne biçûk bûm jî, le min nizanibû ku cejna Newrozê ya k'urdaye. Li gora xwendina xwe, tenê min dizanîbû ku ev tenê cejna biharêye. Heya r'ojekê hevalê minî Şêro ji minra got:

Sibê 21-ê adarêye. Tu jî naxwazî, bi mera bêy şeva Newrozê?

Çima bi şev? - min jê pirsî, - ya baş ewe ku em herin seyranê û r'oja xwe bi xweşî li çolê derbas bikin.

Şêro bersiva min da:

-Berê ez jî wek te bûm, min digot qey Newroz cejna biharêye. Lê ya rast, Newroz cejna k'urdaye.

Min carke din jê pirsî:

Tu ji ku pê dizanî ku Newroz cejna meye netewîye?

Îca wî, ji minra çiroka Newrozê ta bi derzî (hûr-gilî) vekir. Bi kurtî çirok ev bû:

Dibêjin ku h'akimekî stemk'ar (zulmk'ar) hebûye. Jê'r'a digotin Dehak. Nexweşiyeke wîye giran hebûye. Heger, wî r'ojê mejûyên du xortan di laşe (beden) xwe neda tebata wî nedihat. Ji ber vê yekê gelek xort hatine kuştin. Helbet, ev zulm her k'esî qebûl nekir. Ew k'esên ku li himberî zulma Dehak rabûn hilk'îşiyane serê çiya û xwe şkeftada veşartin. K'awayê kurçî (hesinkar), ew xortên ku ji ber zulme direviyan, li dora xwe civandin û bi hevra dest bi serhildanê kirin. Milet jî bi wanra bûne yek û bi mêrxasî zora h'akimê stemk'ar birin.

Li gora tê gotin K'awa û hevalên wî k'urd bûn. R'oja ku ew di şerê xwede bi ser k'etin, 21-ê adarê bû. Ji wê çaxê heya (h'etanî) niha, di vê r'ojêde, k'urd pîrozbahiya hev dikin. Ji ber ku ew vê r'ojê bi rizgarbûna netewa xweva girêdidin. Em jî Newroz wek cejna baharê. vektî û biratîva aelan oîroz dikin.





Kulîka min

Îro ez û birayê xwe çûne sûkê. Em gelekî gerîyan. Me ji bona malê p'incar, pamîdor, xeyal, îsot û sêv k'irin. Fêkî û p'incar li bazarê gelek erzanin û boy sax'lemîya meriva k'ardarin. Lema h'evtê carekê ez û birayê xwe diçin û dik'irin. Piştî ku me fêkî

û p'incar kirin, em k'etine r'ê, wekî herine mal. R'êda birayê min li bal jineke ixtîyar sekinî. Jinika ixtîyar kulîlk difirotin. Kulîlkên di nava kudikanda gelekî bedew û r'indbûn. Birayê min ji min pirsî:

- K'îjan kulîlk bedewe?

Min jî got:

- Eva hanê sosine, p'ir bedew û r'inde, hela gelek hêşîne, hê venebûye.

Birayê min bi sed tengeyî baqe sosin ji minra k'irî. Me hilda anî mal. Min danî ser masê (stolê). Naha ew kulîlk li ser masêye, lê kulîka here bedewe. Ez her r'oj avê didimê û pêra xeber didim, ç'a ku birayê min ji minra gotîye: Tu pêra xeber bidî, ewê gelek zû mezin bibe, ewe jî t'era xeber bide.

Li jêrîn çend hevokê t'êkel hene, ji wana k'îjan hevokê erênîne bidin k'ivşê.

- 1- *Îro ez û birayê xwe neçûne sûkê.*
- 2- *Em gelek gerîyan.*
- 3- *Naha ew kulîlk li ser masêne, xu jî kulîlkê here bedewin.*
- 4- *R'êda birayê min li bal jineke ixtîyar sekinî.*
- 5- *K'îjan kulîlk bedewe?*

Li jêrîn çend hevokê t'êkel hene, ji wan hevokan k'îjan hevokê pirsêne bidin k'ivşê.

- 1- *Ez gelekî dixwazim xeber bidim, lê k'es t'une.*
- 2- *Wexta min ew dît, ez k'elogirî bûm, lê çi bikim.*
- 3- *Tu zanî k'î li wir heye?*
- 4- *Başê, tu diçî wir, lê tuyê çi bikî?*
- 5- *Dinya him xweşe, him jî nexweşe.*

R'objûyîna te k'ingêye?

Dersdar: Fatma, tu çend salîyî?

Fatma: Ez 12 salîme.

Dersdar: R'objûyîna te k'ingêye?

Fatma: R'objûyîna min baharêye.

Desdar: K'ijan mehêdaye?

Fatma: Meha gulanêye.

Dersdar: Çendê meha gulanêye?

Fatma: 20-ê meha gulanêye.

Desdar: Ez tera, e'mrê baş dixazim.

Fatma: Spas dikim, mamoste.


Tiştonek

Tiştêk heye tiştônî,
Ne pê heye, ne penî
Her r'oj diçe kanî.
Ew ç'îye?



rêc

Odeke şûştî-mûştî
Axakî têda rûniştî.
Ew çiye?



rûş

Li jêrîn çend hevokê t'êkel hene, ji wana k'ijan hevokên neyenîne bidine k'ivşê.

- 1- *Kulîlkxemla malêne.*
- 2- *Ez ji kulîlkan h'ez dikim, lê xûşka min h'ez nake.*
- 3- *Her r'oj avê didim kulîlka.*
- 4- *Ez bi kulîlke xwera xeber didim.*
- 5- *Ew r'ê k'etin û çûne mal.*
- 6- *Emine bi k'urmancî baş diaxive.*



Spartin

Deftera xweda hevokê erênî û li hember wan ji hevokê neyini binvîsin.

Dîk, keresû (r'eşêlek), werdek û r'ûvî

Dîk, keresû û werdek bûne hevalê hev, gilîye xwe kime yek û gotin: -Emê herine h'ecê.

Çûn r'eda r'astî rûvî hatin. R'ûvî dêna xwe dayê, dîk, keresû û werdek wa d için. Got:

-Hûn k'ûda diçin, gelî xûşk û bira?

-Em diçine h'ecê.

-Ez jî dixazim wera bêm, hema ez hevala digerîyam.

R'ûvî ew birin, çûne ber çem û got:

-Wekî em ha herin r'ê dûr dik'eve, lê go, vira bin çiyê qulek heye, emê qulêr'a herin û zû bighîjin.

R'ûvî ew birin kirne qula xwe, dêla xweda ber sekinî. Wan tîna xwe dayê ku rûvî ew xapandine. R'ûvî gote dîk:

-Ezê te bixwim.

Dîk got:

-Çima?

R'ûvî got:

-Tu şev, r'oj, nîvro, êvarê ha bang didî, nahêlî xelq r'azê, xewa wan dih'erimînî, nahêlî hêsabin, ezê te bixwim.

Û dîk xar. R'ûvî gote werdekê:

-Tu diçî r'ex golê hêlîna xwe çêdikî, cûcîkê te dik'evine nav avê, zar' tîn, cûcîk xwe dikine binê avê, zar' lê diçerin, navînin, xu davêjine avê, dixeniqin, lema ezê te jî bixwim.

R'ûvî werdekê jî dixwe. Dor tê keresûyê. Keresûê digire dike devê xwe, dibêje:

-Tu berxelqêva r'adibî difirî dikî p'irînî, xelq ditirse e'rdê dik'eve, dest- p'îyê wan dişken. Îca keresû jê dipirse:

-Tu haqa merivekî serwextî, hemîn tê min bixwî, lê e'slê te çiyê? E'slê xwe minra bêje.

R'ûvî dibêje:

-E'slê min fêlbazîye.

Devê wî vedive, keresû ji dêv derdik'eve û difire diçe. Diçe ser darê datîne û dibêje:

© 2011 by the author. All rights reserved. No part of this publication may be reproduced, stored in a retrieval system, or transmitted, in any form or by any means, electronic, mechanical, photocopying, recording, or by any information storage and retrieval system, without the prior written permission of the author.

Spartin

R'ûvî sembola fêlbazîyeye. Hun derheqa hevaltîya hûvîda çî zanin, deftera xweda binvîsin.



Diz û melie

Li gûndeki yek diçe dizîya mirîşkê cînarê xwe û mirîşkê wî didize. Sibe r'on dibe, xayê mirîşka badibe, diçe derîyê k'olikê veke, dinihêre ku mirîşk di hundirê k'olikêda nînin.

Difikire, diçe tê, xwe-xwera dibê:

- Heye, tuneye diz k'etine k'olika mirîşka. R'oja înyê ew mesela dizîya mirîşkên xwe ji meleyê gundr'a dibêje:

- Tu melleyî, tu her tiştî zanî. Lazime tu bizanibî k'ê mirîşkê min dizîne'. Melle dibê:

- Temam, ezê dizê mirîşkê te bibînim. Xutbe (azan) xelaz dibe, melle bang dike û dibêje:

- Gundîno, beri ku hûn berav bibin, gotineke min ji wera heye, ezê bêjim.

Melle meselê dibêje, kê mirîşkên vî merivî birine bila bi camêrî r'abe bêje min birîye.

Lê ku nebêje, ez wî nas dikim û ezê wî derxim pêşîya cime'tê r'ezil û r'usa bikim. Mirovê ku mirîşk dizine dengê xwe nake.

Melle dinêre ku k'es dengê xwe nake û hema r'adibe ser lingan û tilîya xwe dirêjî nava civatê dike. Dibê filank'es, tu p'erikên wan mirîşkan ji ser serê xwe bavêje. Hingê dizê me hema destê xwe davêje ser serê xwe. Melle dibêje, binhêre te r'astî nedigot, lê destê te bê h'emdl xu got...

Li jêrîn çend hevokê r'êzik hene, ji wan hevokan k'îjan hevokên erênîne.k'îjan yê pirsêne bidin k'ivşê.

Li gundekî yek diçe dizîya mirîşkê cînarê xwe û mirîşkan didize.

Sibê zû xweyîyê mirîşkan r'adibe, diçe derîyê k'olikê veke, dinihêre ku mirîşk di hundirê k'olikêda nînin..

Temam, ezê dizê mirîşkên te bibînim.

Ew her'e k'ar, wê gelek baş be.

Germa îro em aciz kirin, lê çi dikarin bejin.



Axayê min bûye bostan

R'ojekê axa nexweş dik'eve, ji xulamê xwera dibê:
 -Kuro, here ba! h'ekîm, bêje zû were axayê min nexweşe.

Xulam:

-Başe, axa, lê h'ekîm nexweşîya te bipirse ez çi bejmê?

Axa:

-Hema bêje serê axayê min weke kundiran werimîye, pozê wî weke gizeran werimîye, destê wî weke xîyaran werimîne, lingê wî weke badimcana werimîne, zikê wî weke zebeşan werimîye....

Xulam:

-Axayê minî delal, ma ewqas tistî ezê çawa di hişê xweda xayîkim, hema gotina kurt, ezê ji h'ekîmra bêjim: «H'ekîm, ez bi gurba, zû were, axayê min bûye bostan!..»

Li jêrîn çend hevokê r'êzik hene, ji wan hevokân k'îjan neyênîne bidin k'ivşê.

1- *Wexta ez diçim mal, der-dorê xwe nanihêrim û wisa diçim.*

—

2- *Lê çaxê ji k'ar têm dilezînim.*

—

3- *T'êlêvîzyonê nanihêrim.*

=

4- *Ev çiqas wexte min tu nedîtibûy.*

k=

5- *Apo, wek'ilê silavanbe.*

[=

• ' -- iş

Spartin

Hûn jî pêkenînekê bikine bîra xwe û deftera xweda binvîsin.

HA GULGULÎ, GULGULÎ 36 a. 2@'

РАСЦВЕЛА

Allegro



Ha gul - gu - lî, gul - gu - lî,



Ha gul - gu - lî, gul - gu - lî, wey,



Keç' - kê fin - dê, gul - gu - lî.

© 6820 x

Ha gulgulî, gulgulî

Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî, K'esk
û sorda xemilî, gulgulî, Dinya kin û
k'emilî, gulgulî, Gulgulî ha bi gulgulî,
gulgulî. Xortê k'urda xalisin, gulgulî,

Ji e'lbeta fêrisin, gulgulî, Xwe
e'gîtin, natirsin, gulgulî, Gulgulî, ha
bi gulgulî, gulgulî. Keç'kê k'urda
dengbêjin, gulgulî, Ji ser dila dibêjin,
gulgulî.

Temam kezî direjin, gulgulî, Gulgulî, ha
bi gulgulî, gulgulî. Keç'kê k'urda delalin,
gulgulî, Dengbêjin, deng zelalin, gulgulî
T'ev yekin, t'ev hevalin, gulgulî,
Gulgulî, ha bi gulgulî, gulgulî.



K'osk û sera şagirta (Almati)

Ez zarbûm, min dersxana çaranda dixand. Carekê bavê min, ez u birayê minî mezin hildan birine k'osk û sera şagirta. Em k'etine hundur. Min der-dorê xwe nihêrî û e'cebmayî mam. Zala sporêye mezin, h'ewzê avêyî temîz, zala k'ilam û reqasê (ya folklore) zaroka govend girtibûn û diliştin. Dû wê yekêra ez û birayê xwe her gav piştî dersa diçûne sera şagirta, spor dikir û diliştin.

Hevala min ji min xeyîdî

Newroz hevala mine. Ez gelek jê h'ez dikim, ew jî min h'ez dike. Em bi hevra diçin k'oma sisya. Dibistanêda ew li r'ex min r'ûdinê.



Ez her tiştê xwe bi xweşik û cindî pêra p'arvedikim. Ew jî gava ku şokolata dik'ire, tîne dide min. Ez li vêlika wî sîyarbim ku xwera bigerim. R'objûna minda bavê min aftoyeke xweşik minra k'irî. Duh wexta em ji dibistanê
vegerîyan, ew hate bal min û got: «K'a

aftoya xwe bide min, ez hinekî bajom.» Min deyn nekir. Berxwe k'et û çû. Lê min nizanibû ku wê ji min bixeyde. Ezê naha herim bal wî bêjim: «Bibaxşîne, min fe'mnekir tu çi dixazî, min bêh'emdfî xwe usa kirîye»...

Sparûn

Derheqa hevaltîya başda qîsekin û deftera xweda binvîsin.

SÎNTAKSÎS (R'ÎSTESAZÎ)

Sîntaksîs (r'istesazî) zanîsta sazkirin û çêkirina hevokane. Ew şirovedike bi çî teherî hevok ji xeberean çêdibin, çawan bendên xeberean li hev tîn, çawa hevok bi hevra tîne girêdanê û çend cûrê hevokê di xebereanêda hene.

Hevok (cumle) çîye?

Hevok fik'rekê, xastekekê, bûyîn û nebûyîneke bi t'emamî û t'omerî dide k'ivşe. Ji xeberekê, yan jî ji çend xeberean tê avakirinê û me'neke tam dide. Bi alîk'arîya hevokan mirov fikrên xwe dîyar dikin, pirs û daxwazê xwe didin k'ivşê.

Di dawîya hevokêda niqtênîşan tê danînê. Hevok bi tîpa girdek (girva) tê nivîsandinê.

Mînak:

Bahare. E'wravîye. Şeve. Ji azadîye xweştir li dinê tişteke t'une. K'urdê Çimk'endê welatparêzin, çand û hunerê xwe peşda divin.

Nava hevokêda navên taybet (mexsûs), welat û bajaran bi tîpên gir tîne nivîsarê.

Mînak:

îro H'esen îmtîhana xweda pênc sitand. (H'esen navekî taybete, lema bi tîpa gir tê nivîsarê.)

Xûşka min li Girgizistanê dimîne. (Girgizistanê navê welatekîye, lema bi tîpa gir tê nivîsarê.)

Em bi neferê mala xweva li Almatê dijîn. (Almati navê bajarekîye, lema bi tîpa gir tê nivîsarê.)

Çîyayê Agirî (Ararat) havîngeha k'urdaye. (Navê çîyayê **Agirî** bi herfa gir tê nivîsarê.)

Navê beh'ra, okîyana û matêrîka, (qita) jî bi h'erfê gir têne nivîsarê.

Mînak:

Beh'ra r'eş, Okîyana Hînda, Amêrîka, Avrasiya û yêd din.

Hevokên jêr bi xeberên hanê tamam bikin

we, bajarê, te, k'oma, Almatê, dibistanê, heftan, mêze, destê
xwe, 10, nîvro, Qasim

- 1- *Li mala..... k'î heye?*
- 2- *Almate..... Qazaxistanêye.*
- 3- *Mala me li bajarê ye.*
- 4- *Ez sibê r'adibim û diçime.....*
- 5- *Ez û birayê min piştî têne mal.*
- 6- *Navê bavê min..... e.*
- 7- *Ez li barûniştîme.*
- 8- *Ez diçime sîsya.*
- 9- *Birayê min T'êmir diçe koma.....*
- 10- *Em li malê t'êlêvîzyonê..... dikin.*
- 11- *Em bejiya xwahnê..... dişon.*
- 12- *Ez salî me.*

Çend hevok

Bahare. Belekîyê berfê li r'asta tek'-t'ûka mabûn. Bengîn êvarê t'evî
Mîrze çû mal. Welat. Xasteka her mirovî azaya welate.

Spartin

Derheqa bahar, havîn, paîz û zivistanêda çend hevoka deftera xweda binîvisin.

Hevoka navdêrî (nav)

Ji wan hevokanr'a dibêjin hevoka navdêrî, yên ku axirîya xweda navekî yan jî r'engdêrekî peyda dike. K'îjan hevok axirîya wêda fêl tunene û navek, yan jî r'engdêrek heye, ewa hevoka navdêrîyêye.

Hevokên navan bi alîk'arîya pirtikê hevbendî **a, e, en** yan jî **et (êt)** çedibin.

Mînak (Mesele):

P'erwerde taca zenne.
Xwendek'arên me aqilin, p'irzanene.
Ev bajarê Almatêye.
Şevê payîza dirêj û sayîne.
K'itêb hevalên meye jîyanêne.
Hejar helbesvanê k'urdane.
Heryek ji wan nolî şêranin.
Gurçikê wî, gurçikê guranin.

Hevoka lêkerî (fêl)

Ji wan hevokanr'a tê gotin hevoka fêlî (lêkerî), yên ku axirîya xweda fêlekê (lêkerekê) p'eyda dike.

Mînak (Mesele):

Ez k'itêbê dixûnim.
T'êmir sêvan dixwe.
Tu teşîye dir'êsî.
Ezê herim dibistanê.
Silêman hînî zimanê k'urdî dibe.
Ew berbi malê diçe.

Spartin

Ji bo hevokên navdêrî û lêk'erî çend meselan bik'şînin.

R'ast û çewt

Li jêrîn 20 hevok hene. Hinek ji wana r'astin, hinek jî çewtin(şaşin). Yê ku r'astin li hember wan (R') û yê ku çewtin li hember wan jî (Ç') binvîsin.

Mesele: Di zimanê meda tîpên dengder 8-in

- Meriv wexta berê xwe dide r'ojhilatê, milê r'astê başûre.
- Zozan cîyê havîngeh û çêrê pêze.
- E'hmed ava sar vexarîye, gewrîya wî dêşe.
- Mîrze bejinbilinde, lema nikare bi rêva biçê.
- Silêman gelek dewletîye, lê xwarina wî tune.
- Li çîya tu caran berf nabare.
- Baran her tim baharê dibare.
- Di salêda 12 meh û çar rozgar hene.
- Meriv nikare zimanê k'urdî hîn bibe.
- E'mrê min ji e'mre dayika min zêdetire.
- Almati bajarê Qazaxistanêye.
- Li Qazaxistanê t'enê qazax dijîn.
- Bakûrê îraqê K'urdistane.
- Yê ku gotinên kal-bava gotine, r'ûspîye berêne.
- Zargotina k'urdan gelek dewlemende.
- Çîrok weke çarînan tê nivîsarê.
- Tîpên zimanê k'urdî 34 livin.
- Şeş û çar tevayî dikin panzdeh.
- Meriv t'êlêfonêda tenê dengê însana dibihîse.
- Di be'hranda t'enê masî hene.

R'

Xwendina ji dersxanê der

MERIV Û MAR

(Qisa cimae'tê)

Merivek bi r'êva diçû, r'astî mar'ekî hat. Mark'etibû bin kevirê mezîn. Ne dikaribû derk'eve, ne jî bilive. Gunê meriv bi mar hat, xwe da ber kêvir, kevir r'akir û mar xilas kir. Mar xwe r'akişand, r'abû ser zikê xwe û xwe dirêjî wî kir. Xwest pê vede. Meriv got:

-Maro, h'eyran, ha nabe! Min tu ji mirinê xilaskirî, tu dixwazî min bukujî?

Mar got:

-Çima, ji vir hada em ne dijminê hevin? Ezê te vedim.

Meriv kir û nekir mar jê venegerîya. Paşê gotê:

-Nabe, em herin ji aqilbendekî bipirsîn.

Mar qayîl bû û dane ser r'ê çûn. Çend gava çûn r'astî sîyarekî hatin. Mesela xwe jêr'a gotin. Sîyar li meriv nihêrî û k'enîya, paşê gote wan: -Dibe ez jî wî cîyî bibînim? Dûr'a ezê qirarê xwe bidim.

Şûnda vegeşîyan û hatin berbi kêvir. Sîyar ji merivra got:

-Tu kêvir r'ake.

Ewî kevir hakim. Sîyar marr'a got:

-Tu jî bik'eve binî.

Mar k'ete bin kevir û mêrik kevir berda ser. Bîstek derbaz bû, sîyar qe deng nedikir. Mar got:

-Sîyaro, k'anî qirarê te? Ne ez bin kêvirda p'elixîm.

Sîyar got:

-Tu hele hê nizanî çîye qencî, çîye r'eşî, çi xweşe û çi nexweşe, bin kevirda van gilîyan hînbe p'aşê ezê qirarê xwe bidim.

Meriv xwest ku her'e, sîyar jêr'a got:

-Careke din vî kevirî ji cîyê wî hanekî.

Siyar gilîyê xwe berdewam kir:

-Ew çîye li ber te?

-Mare.

-Ew çîye dest te?

-Dare.

-Bê aqilo, lêxe, çima tu nizanî ew neyare.



K'ulma melle

Kalekî ixtîyar r'ojekê, xwe-xwer'a difikire û dibêje:

-Ez bûme h'êştê salî, h'eta niha min qet k'esekîra şer nekirîye. Îro k'î r'astî min bê, ezê lêxim.

Derdik'eva nava gund. R'astî mellê gund tê. Dighîje melle û h'eta qewata wî heye k'ulmekê li bin guhê wî dixê.

Melle dibê:

-Bira, te çima li min xist?

Gundî dibê:

-Hema dilê min usa xwest.

Melle dibê :

-De were, em herin bajêr, cem gazî.

Gundî dibê :

-Bira, em herin.

Dîk'evin ser r'ê û dîçin bajêr. Mesela xwe ji qazîra dibêjin.

Qazî dibêje gundî:

-Lazime tu çend zêran bidî melle.

Gundî dibê:

-Niha li bal min zêr tûnenin. Ezê herim ji wîra bînim.

We'dek derbazbû, gundî nehat. Xewa melle hat. Qazî jî k'itêba xwe dixwend. Melle ji cîyê xwe, r'adibe, diçe k'ulmekê li bin guhê qazî dixê. Qazî bi hêrs r'adibe û dibêje:

-Melle, te çima li min xist.

Melle dibêje:

-Ma k'ulmek ne bi çend zêrane. Niha li bal min t'uneye. Ezê herim, gava, ku gundî zêrên min anîn, tu p'ara xwe jê hilde. R'astî bêjim, ez gihîştîme heqê xwe. De bi xatirê te, ez çum...



Biratîya quling û r'ûvî

R'ojekê r'ûvî quling gazî mala xwe mêvanî dike û jêr'a şorbeke nîska çêdike. Paşê şorbê valayî taseke tenîsk dike û dibê:

-K'eremke, birayê quling.

Quling çend caran nuklê xwe li tasê dixwe, dike-nake nikare şorbê bixwe. Mejîyê quling ji hêrsa diheje. Wê r'ojê quling birçî dimîne. Lê çawa bike, şerm dike ku bibêje: «Ez birçî mame, di dilê xweda dibêje: Lazime ez tola (heyfa) xwe ji r'ûvî hilînim.»

Quling dibêje r'ûvî:

-Bira, tu jî sibê mêvanê minî.

R'ûvî dilxweş dibe. R'oja din berê xwe dide mala quling.

«Destebirakê» wî quling te pêşîya wî û dibêje:

-Bi xêr hatî, ser sera, ser çavar'a hatî, birayê minî delal!

R'ûvî gelek dilxweş bû. Xwe-xwer'a digot: «Niha quling xwarineke gelexweş minra çekirîye.»

Quling jî hazirîyên xwe, bona heyfhilanînê pêjda dîtibû. Şorba şîr çêkiribû û xistibû k'ûzikekî qulp dirêj.

Quling xarina mêvanê xwe anî û da berwî. Lê belê, xwarin di k'ûzîkê dirêjda bû. R'ûvî kir, nekir devê wî ne gihîjte xwarinê.

Quling gotê:

-Birayê r'ûvî, k'eremke bixwe.

R'ûvî xwe da pêş. Li dora k'uzîk çû, hat, lê nihêrî, bînkir, evraz kir, berjer kir, tu çare nekir.

Quling nukulê xweyî direj kire k'uzîk, k'ete ser xwarinê û xwar. R'ûvî nêhirî û ji «brayê» xwera got:

-Çima ez pêk'enîyê teme, te ha kir? Biratîya haya h'erame...

Spartin

“Bratiya” quling û r'ûvî bi gilyê xweva şirovekin.

JI ZARGOTINA GELE ME

(Têderxistinok)

Berav dikim bare gane,
Datînim erdê wek çîyane. Ew
çîye?

(muq)

Qulçê tarî, Dû lê barî. Ew
çîye?

(gnivit')

Cot birane, Du dirane. Ew çîye
(seqem)

Şekir şîrîntire, Hêsin girantire.
Ew çîye?

(wex)

Sêsid şêst û şeş r'eşêle,
Duwanzdeh hêlûn hêkele. Ew
çîye?

(las)

Hespa çê, Bazda hewşê. Ew
çîye?

(çek)

Du xûşkê cînar, Ji hevdu nakin
bawer. Ew çîye?

(vaç')

Ez mîyê naxum, Bexê dixum.
Ew çîye?

(zûg)

Aşe, aşe, Çend xeraşe, Dudu
paşe, Dudu pêşe. Ew çîye?
(êkelêç ênahug)

Qesr'êke sipî, Glover û bê
derî. Ew çîye?

(kêh)

Li vira go kişt, Li wira go mişt
Çû ber derî kulê kuşt. Ew
çîye? (îzêg)

Çar çarix, Bîst û çar bençarix.
Ew çîye?

(apseh ê ramzib û lan)

Pêk'enok'

Ceh jî r'adixin

Hebû, tunebû du cînar hebûn. Ji wana yekî çî dixwest, dibir, lê venediger'and. Nav gundda jêr'a digotin H'eqneda. Carekê ew tê bal cînarê xwe derî dik'ute û dibêje:

- Apo, ca werîsê xwe bide, ezê gaveke şûnda vegefnim.

Cînar dibêje:

-Ser çava, tu vir bisekine, ezê niha bînim.

Disekine, xêleke şûnda cînar tê û dibê:

-Bibexşîne birao, weleh pîreka min li serwêrîs genim r'axistîye. K'îngê vala bû, were bibe.

Cînar ecêbmayî dimîne û dipirse:

-Apo, ew çî gilîye dibêjî, k'a li ser werîs genim çawa tê r'axistinê?

Cînar cawê dide:

- Çawa nabe birao? Çaxê naxwazî bidî, dikarî ceh jî r'axî!

Êşa diran

Bi gotina gotîyan, diranê Apê H'esen zû-zû dêşîyan. Bi r'oja wî serê xwe dipêça, dikire ofe-of, inte-int, nale-nal diçû û dihat. R'ojekê dîsa ser çavê xwe desmaleke qalimva dipêçe û dertê devra. R'êva r'astî xortekî tê, xort dipirse:

-Apo, te çira ser çavê xwe girêdaye?

- Lawo, diranê min dêşe, ditirsim, herim bik'şînim.

- Ê, apo, diranek çîye ewqas ditirsî û nikarî bidî k'işandinê? Wekî ew diran devê minda bûya, vê gavê minê ew bik'işanda û bavîta.

- Ê, lawo wekî ev diran devê teda bûya, minê jî vê gavê bida k'işandinê, hûr-hûrîkîra bavîta. Bela ewe ku diran devê mindaye...

Çima em ne gunene?

R'ojekê mûxtarê gund civînekêda berê xwe dide gundîya, xwe dipesine û dibêje: "Gotî hûn şev û r'oj dua li min bikin, wekî gundê meda nexweşîya t'aê tune". Ji gundîya yek bi k'en dîbêje: "E, muxtarê e'zîz, çima qe însafa xwedê tune, wekî du bela carekêva bide me, çima em ne gunene?.."

K'ûsî û r'ûvî

(Zargotina cimae'tê)

K'ûsî û r'ûvî xwestin cîhanê nava xweda p'ara vekin. Lê li ser zevîyekê hev nekirin. R'ûvî got:

-Zevî p'ara mine.

K'ûsî got:

-Na, zevî p'ara mine.

Gotin:

-Başe, emê şert û qirarekî nava xweda daynin, yê bê k'ivşê, çika zevî wê ji k'êr'a bik'eve.

R'ûvî got:

-K'a, tu bêje.

K'ûsî jî got:

-Na welleh, tu bêje, k'î ji me e'mirda mezine.

R'ûvî got:

- Sala qal û belayê tê bîra min. Ji vê kevintir tişt tune. Belê, sala qal û belayê xweş tê bîra min.

K'ûsî rûnişt û dest bi girînê kir. R'ûvî got:

- Bira, tu çima digirî?

K'ûsî caw da:

- Bira, birînên min qalîk (gaysax') girtibûn, min bîra kiribû. Te dîsa anî bîra min. Sala qal û belayê du kurê mine bermiraz (li berzewacê) nava h'effîyekêda hatin kuştinê. Te ew anîn bîra min.

R'ûvî bi gazin got:

-Welleh, min dizanibû ku, ev qermoçekên li ser piştê te, ne yên van salanin.

Zevî bû p'ara k'ûsî.



Bizin û karikê wê (Çiroka zaroka)

Wextekê bizinek ji kerîyê pêz diqete, diçe çîyê... Binê zinarekî dik'ole, cîyê xwe çêdike. Bizin li wê derê jî dizê. Sê kara tîne. Navê yekê datîne Şengulo, navê ya dua Mengulo, navê ya dinê jî datîne Qalîçengulo.

Çaxê karik mezin dibin, maka wan dibêje:

- K'engê min got;

Şengulo, Mengulo,

Qalîçengulo,

Ez çûme zozana, Şîr k'ete gihana. Werne dana.

Den vekin, ez bê mê.

Hûn paşê werin, derî vekin.

Çend r'oj usa derbaz dibin.

R'ojekê gur dengê bizinê seh' dike. Xwe lê ditelîne. Sibetirê wextê bizin diçe zozana, gur berî hatina wê tê li ber derî disekine û bi dengê bizineva gazî dike:

Şengulo, Mengulo,

Qalîçengulo,

Ez çûme zozana, Şîr k'ete gihana. Werne dana, Derî vekin.

Şengulo dibêje: - Mengulo, Qalîçengulo, derî venekin, ew dengê dîya me nîne, wextê dana nîne.

Qalîçengulo jî dibêje: - R'aste, eva dîya me nîne, dengê vê qalime, denge dîya me zirav û şîrîne.

Lê Mengulo xebera wan pake, dibêje:

-Na, dîya meye.

Derî vedike.

Gur dik'eve hundûr. Şengulo, Mengulo û Qalîçengulo dadqurtîne (duxe), lê dixê diçe.

Bizin vedigere, tê dinhêre ne Şengulo, ne Mengulo û ne jî Qalîçengulo hene. Dike mike-mik, gelekî gazî vana dike, lê ke'sek cewa wê nade... Ewîdî li wê derê nasekine, r'adibe diçe cem teyr, dibêje:

Teyro, gelo, te her sê karikê min nedîtine? Teyr dibê: - Min ne dîtine.

Bizin r'adibe diçe cem leglegê, dibê:

Te gelo, her sê karikê min nedîtine?


Dibê: - Min ne dîtine.

Bizin r'adibe diçe cem hirçê, dibê:

Gidî, ez bextê terne, gelo te, her sê karikê min ne dîtine?

Dibê: - Min ne dîtine.

Bizin hew dinhêre gur r'astêra diçe, dibê:



- Hebe, tunebe, vî gurê har karê min xwarine.

Diçe pêşîya gur dibê:

Guro, rîya teva k'ivşe, wekî te karê min xwerine, were, şerê min tera şere! Dibe: «Te Şengulo, Mengulo, Qalîçengulo xwarîye. Tû dranê xwe tujke, ez jî stûrîyê xwe tuj bikim».

Gur şadibe: «Ewa pak bû, ezê wê jî bixum», - û r'adibe diçe cem gelekî şerdikin. Berî êvarê bizin sturîyê xweyî tuj zikê gur'a dike, diqelişîne, Şengulo, Mengulo, Qalîçengulo ji zikê wî derdik'evin.

Bizin bi karê xwe şadibe. **Karê wê jî fe'm dikin, wekî careke din derî ji her k'esîra venekin.**

hedadk'ar, (hoste) wekî dranê xwe tûj bike. Lê hedadk'ar dewsa tujkirinê, dranê wî ko dike.

Bizin jî diçe cem hedadk'ar, dibêje: «Heqê te çiçase ezê bidime te, stûrîyê min rind tujke, eze h'eyfa karikê xwe ji gur hilînim».

Gur û bizin

Çend r'oj û bûyerên girîng ji dîroka k'urd û K'urdistanê

- Sala 631 -ê (Berî Miladê) Damezrandina împaratorîya k'urda Mîdya
- Sala 637-a - Pevgirêdanê e'rebaya îslamî cara yekemîn t'evî k'urda hatin k'ivşê.
- Sala 653-a - Serhildana k'urda li Dînavarê destpê bû.
- Sala 907-a - Serhildana k'urdê Celalî li herêma Mûsilê.
- Salê 951-1088-a - H'ukumdarîya malbeta k'urdaye Şedadîya li Gencê.
- Salê 969-1015-a - H'ukumdarîya malbeta H'esenvahîdîyan.
- Salê 985-1085-a - H'ukumdarîya malbeta Mervanîyan.
- Salê 1010-1061-a - H'ukumdarîya E'hmed îbin Mervanî (Nesr ed-Doûle)
- Sala 1138-a - Serokê malbeta Eyûbîya Selah'edîn (Saladîn) ji dîya xwe bûye.
- Salê 1169-1193-a - H'ukumdarîya Selah'edîne li Misrê, Sûrîyayê, Dîyarbekirê û Yemenê.
- Sala 1193-a - Selah'edîn Eyûbî çûye serdilovanîya xwe.
- Salê 1258-1401 - Êrîşa Mongol-tetera li K'urdistanê.
- Sala 1514-a - 23 Tebaxê Serhildana Çaldiranê, destpêkirina p'arevekirina K'urdistanê navbera împêrîya Osmanîya û îranê.
- Sala 1555-a - Peymana navbera împêrîya Osmanîya û îranêda hate girêdanê: E'rdê K'urdistanê kirin du p'erça.
- Salê 1566-1578-a - Serhildana k'urdaye li Behdînanê.
- Sala 1743-1744-a - Serhildana k'urdê Dimilî (Zaza) li Xoê u Selmasê.
- Salê 1756-1791-a - H'ukumdarîya Xosravxan li Erdelanê (K'urdistana R'ojhilat).
- Salê 1854-1855-a - Serhildana Yêzdanşer.
- Sala 1880-a - Serhildana şêyx Obêydullayê Nêhrî.
- Sala 1898-a - 22 nîsanê li bajarê Qahîrê r'ojnama k'urdayê e'wfln «K'urdistan» r'onahî dîtye. Ew r'oj tê h'esabe r'oja çapamenîya k'urda.
- Sala 1909-a - 13 nîsanê Dewleta Osmaniye r'ojnama «K'urdistan» dada.
- Sala 1909-1910-a - Serhildana bi serk'arvanîya E'bdilselam Barzanî û qebîlê Bazîdê û Bitlîsê bi serk'arîya K'orHusêyn paşê û Mûsa begê.
- Sala 1913-a - Li îranê (K'urdistana R'ojhilat) 'Komela K'urdistan" hate damezrandinê. Kovara "R'ojê K'urd" r'onahî dit.
- Salê 1915-1916-a - Zeftkirina K'urdistana îranêji alîyên eskerê ûrisêtêda.
- Sala 1917-a - Havîn, payîz - T'evgirêdana yekîtiya orta Rûssîyayê û serokên k'urdê îranê.
- Sala 1918-a - 1-e çilê h'ukumeta Îngilîstanê Şêx Meh'mûd Berzencî naskir çawa h'ukumdarê Silêmanîyê.

- Sala 1919-a - 21 -ê gulanê serhildana Şêx Meh'mûd Berzencî destpêbû.
- Sala 1919-a - 23 gulanê - Şêx Meh'mûd Berzancî K'urdistanê Başûr e'lam kir herêmeke serbixwe.
- Sala 1920-a - 10-ê tebaxê bi peymanê Sevrê serxwebûna K'urdistanê û mafê k'urda hate naskirinê.
- Sala 1922-a - Îsmâil axa Simko hat e'lamkirinê çawa ku kralê K'urdistanê.
- Sala 1922-a - 11-ê h'ezîranê li K'urdistanê Îraqê, bajarê Silêmanîyê Şêx Meh'mûd xwe e'lam kir mîrê K'urdistanê.
- Sala 1923-a - 24-ê tîrmehê peymanê Lozanê hat qebûlkirinê k'îjanê qîrarê p'eymana Sevrê înkâr kir, mafê k'urdayî serxwebûnê bînpê kir.
- Sala 1923-1929-a - Damezrandina herêma K'urdistanê (K'urdistanê sor) li Azerbaycana Sovetî.
- Salê 1927-1931-a- Serhildana k'urdayê li herêma Araratê (Şerê Girîdax'ê).
- Sala 1929-30-a şoreşa k'urdê îranê bi serk'arîya Îsmâil axaê Şîkafî (Simko) hatê belakirinê.
- Sala 1930-a - Cara yekemîn li bajarê Yêrevanê r'ojname k'urdayê «R'ya t'eze» weşankir.
- Sala 1931-1932-a - Serhildana şêx Eh'med Barzanî.
- Salê 1936-1938-a- Serhildana k'urdê Dersimê bi serokatîya Sêyîd Rîza.
- Sala 1937-a - Sirgûnkirina p'areke k'urda ji Zakavkazîyayê, Asîya Navîn û Qazaxistanê.
- Sala 1937-a - 1-ê nîsanê Yılmaz Guney ji dîya xwe bûye.
- Sala 1939-a - Serhildana k'urdaye li Serdeşte (Iran).
- Sala 1940-a - 2-ê gulanê helbestvanê k'urdayî e'yan Şêrko Bêk'es ji dîya xwe bûye.
- Sala 1942-a - 1 nîsanê kovara «R'onahî» cara yekemîn r'onahî dît.
- Sala 1944-a - Nefîkirina k'urda ji Kafkazê destpêbu (cara duyemîn).
- Sala 1946-a 16 tebaxê -damezrandina Partîya Demokratîyê K'urdistanê (PDK) li Îraqê.
- Sala 1946-a - Damezrandina Komara Mah'abadê.
- Sala 1947-a 30 adarê -Dardakirina Qazî Meh'med, Seyf Qazî, Sedir Qazî û serokê Komara Meh'ebadêye din.
- Sala 1959-a -21 gulanê r'ojname «Azadî» r'onahî dît.
- Sala 1961-a îlonê - Bi serokatîya Mistefa Barzanî serhildana k'urdê Îraqê destpêbû.
- Sala 1962-a - Ji 120 h'ezar k'urdê Sûrîyayê heqê bajarvanîyê û mafê civakîyê hatin standinê.
- Sala 1968-a - 1-ê nîsanê bi amedek'arîya Cegerxwîn kovara «Gûlistan» r'onahî dît.
- Sala 1976-a - 1-ê h'ezîranê Partîya Yekîye Niştîmanê K'urdistan (YNK) ji alîyê Celal Telebanîda hate avakirinê.

Sala 1978-a - 27-ê Mijdarê Partiya K'arkerên Kurdistan (PKK) bi serk'arîya E'vdille Ocalan hatê sazkin.

Sala 1984-a - 15 T'ebaxê li Bak'urê K'urdistanê bi rêberîya PKK şerê çektarî destpêbû.

Sala 1988-a - 16-ê adarê - K'omkujîya bajarê H'elebceyê bi sîliha kîmyewî ji aliyê Seddam Husêynda.

Salêd 1988-1989-a - p'areke k'urdê Sovyetê ji Ermenistanê hatin koçberkirinê (Rûsya û Qazaxistanê).

Sala 1989-a - Assosîasiya K'urdên Sovîetêye hemtifaqiyê hatê sazkinê.

Sala 1991-a - 19 îlon - R'onahîdîtina r'ojnama «K'urdistan» paşwextiyê ("Jfîyana k'urd") li komara Qazaxistanê.

Sala 1992-a - Hilbijartina parlamênta K'urdistan Başûr.

Sala 1992-a - Li bajarê Almatê kovara k'urdaye "Kurd", paşwextiyê "Nûbar" hate weşandinê.

Sala 1993-a - 17 nîsanê şaîr û dengbêjê k'urdî navdar Meh'emed Emîn Mûk'rfanî dinya xwe guhest.

Sala 1995-a - 12 nîsanê cara yekemîn televizyona k'urdaye MED-TV weşanên xwe destpêkirin.

Sala 1995-a - 12 nîsanê Parlamênta Kurdistanê dervayî welêt hate sazkinê.

Sala 1998-a - 9-ê Cotmehê serokê giştî PKK E'bdulle Öcalan ji Sûrîyaê hat derxistin.

Sala 1999-a - li bajarê Amstêrdamê Kongrêya Netewîye K'urdistan hate sazkinê.

Sala 2001-ê - 10 h'ezîranê cara yekemîn întêrnet r'ojnama «R'ojev»ê weşan kir.

Sala 2003-a - 10-13 nîsanê azabûna bajarê Kerkuk û Mûsilê ji ordîya Seddam Hûsêyn.

Sala 2004-a - 22 mijdarê li bajarê Almatê Navenda Çanda K'urdê Qazaxitanê 60 salîya nafîkirina k'urda ji Kafkasîyayê derbazkir.

Sala 2004-a - 1-ê mijdarê li bajarê Hewlêrê (Erbîl) kanala t'êlêvîzîyona k'urda «Zagros TV» weşankir.

Sala 2005-a - 20 gulanê helbestvan û nivîskarê k'urdayê navdar Şamil Eskerov (1929-2005) çû ser dilovanîya xwe.

Sala 2005-a - 12 t'ebaxê li Dîyarbek'irê serokwezîrê T'irkîyayê R'ecep T'ayip Erdogan di axavtina xweda got: «Li Tirkîyeyê pirsgirêka k'urda heye!»

Sala 2005-a - mijdar, II Qazaxistanê 10 salîya sazkirina Assablêya Gelên Qazaxistanê hate pîroz kirinê.

Sala 2005-a - 6-ê nîsanê wekilên Parlamênta îraqê Celal T'elebanî jibartin çawa ku serokkomarê dewleta îraqêye Fêdêral.

Sala 2005-a - 12 tîrmehê Mesûd Barzanî hat bijartin çawa, ku serokkomarê herêma Kurdistanê.

Sala 2005-a - gulan cara yekemîn II bajarê Bazîdê pêykelê filsof û helbestvanê k'urdî e'yan E'h'medê Xanî hate vekirinê.

Sala 2006-a - T'êlêvîzîyona k'urda "R'ojhelat TV" destbi weşana xwe kir.

Sala 2006-a - Nêcîrvan Barzanî hat bijartin serok wezîrê herêma K'urdistanê.

FERHENGOKA PEYVÊN RÊZÎMANÎYÊ

Antonîm: xeberên me'na wan dijî heve, yê dijpêyv, xeberên, ku mêna wan berovajîye.

Axaftin: qisekirin, gilîkirin, xeberdan

Bang: k'irde, heca. Xeber anegorî dengdêra parevedibin. Mesele: di-bis-tan, ma-mos-te (di çend hevokan çêdibin).

Bargiranî: mûrekkeb. **Hevokên bargiranî. Xeberên bargiranî Bersiv:** Caw, cewab.

Bir: beş, qisim, p'ar (beşek, qismek, p'arek).

Bireser: Yê ku hevokêda kardibe sêrî, objekt.

Bernav: edat, daçek, yê ku li ber û pêşîya navan têne xebitandinê.

Cînav: pronav, zamîr, yê ku çîyê navan digire.

Cins: Zayend, mêbûn yan jî nêrbûna meriv, heywanan dide k'ivşê.

Daçek: binêre **bernav**.

Dem: Wext, zeman, e'wil (dema buhurî, demsal).

Deng: sewt, yê ku bi bankirinê yek derbîda devê meriva dertê.

Dengdêr: bideng, saît. Dengên ku bi serê xweva devê me dertên.

Dengdar: samît, bêteng. Dengên ku alîkarîya hinek dengan têne gotinê.

Derbdayîn: t'eqil, derbên li ser dengên xeberane.

Erênî: pozîtîf. H'alê kirinê.

Fonetîk, fonetîka: dengzanî: zanîsta dengane. Ulmê bilêvkirina tîp û dengê xeberdanêye.

Hoker: zerf, advêrb. Hevokada wext, cîh û hal dide kivşê.

Hevok: cumle. Ji xebera tê avarkirinê.

K'irde: binhêre **bang**.

K'iryar: fêlker, sûbjekt, faîl, fêlgotî.,

K'ok: r'ec, qurm, e'sil. Mesele: **bir-in**, ki-rîn, xas-tin.

Lêker: fêl, kirin, vêrb. H'alê kirin û bûyîna tiştekîra tê gotin

Morfolojî, morfologîya: ulmê avakirina bêjeyê, ulma avakirina xeberan.

Mester: binhêre **fader**.

Mêjer: hejmar, jimar.

Mêzayîn: Yê ku ji cinsa mêye, mê.

Navdêr: nav, îsim

Nêrzayîn: yê ku ji cinsa nêre, nêr

Neyinî: Nêgatif, h'alê berovajîyê erênî, halê nekirinê.

Omonîm: xeberên, ku nivîsandin wan yeke, lê me'na wan cudaye.
Xeberên hemtip.

R'astenivîs: îmla. Wexta nivîsarê h'emû derecê rêzimanîyê t'êne xayîkirinê.

Pirtik: yên ku li pêş, paş yan jî nava xeberêda peyda dibe. Binhêre paşpirtik û pêşpirtik.

Pêveber: fêlgotî.

Paşpirtik: paşkok, paşgir, sûfîks. P'irtikên ku dawiya xeberanda p'eyda dibin, paşpirtikên çekirina xeberan.

Pêşpirtik: pêşkok, pêşgir, prêfîks. P'irtikên ku pêşîya xeberanda p'eyda dibin, pêşpirtikên çekirina xeberan.

P'eyv: gilî, bêje, k'elime, xeber.

P'îranî: h'alê cem, k'are ku hevra tê kirine.

Pronav: binhêre *cînav*.

Qertaf: binhêre *p'irtik*

R'ader: mester, h'alê lêkerayî bi awayê sade.

R'engdêr: sifet, adjectîfûm. Xeysete nav, sifet, k'ijan curê r'enga nîşan dikin.

Rêziman: giramêr, gramatîka. Zanîsta derh'eqa zimanda.

R'uh'ber/ ner'uh'ber: zindi, nezindi.

Sînonim: xeberên nivîsandin û axaftina wan ne yekin, lê me'na wan yekin.
Xeberê hemwatê.

Sintak'sîs: beşa rêzimana derheqa avakirina hevokaye.

Tewange: guhertina bêjeyêda.

Wate: me'na. Me'na gotinekê, k'arekî, jiyaneke.

Wêje: e'debiyat; e'debîyata nivîsî û zargotî.

Yekanî: h'alê t'ek, karê ku ji alîyê k'esekîda tê kirinê.

Ferh'enga k'urdî-ûrisî

(Xeberên ku k'itêbêda cîh girtine)

A

aborî - экономика
adar - март
adil - честный, благородный
agirvês - пожарник
agir- огонь
agirp'arêz - огнепоклонник
aqlbend - мудрый
al - флаг
amin - надежный
amojin, jînar - жена дяди со стороны отца
ar - дядя (со стороны отца)
aran - местность с жарким и сухим климатом, зимовка
ardu - топливо, хворост
armanc, merem - цель, желания
arşîn - мерительный
aso - заря
asteng - препятствие
aş - мельница
aşîfî - мир
aşvan - мельник
av - вода
avak'ar, çekirçî - строитель
avhewa - климат
avk'ês - водопровод
avr'êj - водопад
awuqat, ragêzger - адвокат
ax - земля
аха - помещик, барин
axaftin - разговор
axîn - стон
aza - свободный, вольный
azadar - освободитель
azaуî - свобода

B

ba - ветер
badî - лохань (ковш)
bajar - город
bager-буран
bahar - весна
bak'ûr- север
balafir- samolyot
balafirgeh - аэропорі
ban, serxanî - крыша
bandor- влияние
bang — слог (*грамм.*)
barîg - дедушка со стороны баq - букет, пучок
отца
bardar - плодоносный
başûr- юг
bav - отец
bawer- верить
bahçe, bah - сад
bahvan - садовник
bayloz - посол
baylozxane - посольство
bazin - браслет
belg - лист
bend - веревка
Ber - грудь
beran - баран
berhem - произведение
berkanê qalim - теплые вещи (одежда)
bernav, daçek (edat) - частицы
berxvan - пастух (пасущий ягнят)
best - простор, поле
beş - часть
beştar - участие

В

bexşîn, bexşandin, e'fûkirin-
прощение, извинение
beybûn, babirc - ромашка
bêbext - несчастный,
невезучий
bêdeng - беззвучный,
безмолвный
bêgumanî - безнадежность
bêheq - бесплатный,
безвозмездный, даровой
bêjîng - решето
bêr - деревянная лопата
bêxîret - бездарный,
неусердный, неприлежный
bêxwedê - безбожник bihust -
мера (равная расстоянию
между кончиками большого
пальца и мизинца)
bijare - избранный,
отборочный
bilêtgeh - касса bingeh -
основа birazî - сын брата
birêser (teyîn) - определение
bin - бровь
birîyar- решение,
постановление
bixerî, dûkêş, k'ulfik- дымоход
bîhnok, vêrgul - запятая bûk -
невеста
bûra - шурин
büroya m'elûmatê, agahîyê -
справочное бюро
bûyer - событие

С

cabdar -ответственность
cahil -юный, молодой
camêr- благородный человек
canfîda -партизан caq, carek - раз
caw, bersiv -ответ
ceger-печень
cejîn - праздник
celeb -способ, образ, форма ce'nî -
жеребенок
sewahîr-драгоценный камень cêb -
карман cênik - висок
cêg-большой глиняный кувшин cê
где - ряд
cil - одежда
cîmae't- народ
cîndî - красивый
cîns, zayend, mêbûn yan jî nêrbûna
meriv tiştan - пол, род, жен.род.
муж. род
cîvak - общество
cîxarek'eş, merivê ku cîx'arê dik'işîne
- курящий, человек cîhan - мир
cînar- сосед
cînavk - местоимение
cînavêd k'esan (deman) - личное
местоимение
cînavêd nîşankirinê - указательное
местоимение
cînavêd reyvendîyê - местоимение
civat - собрание
cûmle, hevok, rêza xebirdanê -
предложение
cûmleye rezik (giran) - сложное
предложение
cûge-вид, разновидность

Ç

çadır -палатка çakûç -молоток çalekî
- акция çand - культура çaramenî -
СМИ (средство массовой
информации) çarîk-быстрый,
проворный çar'xane - типография
çardax - навес, (шалаш), палатка
çağîn - четверостишие çağîyek -
четверть çeltik - сумка
çene - подбородок çengeh -
челюсть çengel - крючок, вилка
çer'eg - забор
çerez - сласти, сушеные фрукты
çerm - кожа
çerx -колесо, точильное колесо
çetin -трудный, сложный çewt,
nerast, şaş, yan jî qelet -
неправильно
çir'a - почему?
çirûsk - блеск, сияние, проблеск çîr
- голень
çîrok - рассказ çok -колено çolax -
хромой, калека çûr - рыжий

Ç'

ç'ek - оружия ç'eî -яма ç'êlekdoş -
доярка ç'em - река
ç'emîl - ручка (двери, чемодана
и.т.д)

ç'ер - левый ç'ev - глаза ç'evê
ronî - светлые глаза ç'evr'eş -
болезнь глаз - черные глаза
ç'evkanî -исток, начало родника
ç'ilk -капля
ç'ivîk -птичка, воробей ç'îrok -
сказка

D

daçek - частицы dadger- юрист
dager- поворот, спуск dagirtin -
заполнять dane - курдюк dapîr-
бабушка darçîn - корица darik -
палочка daristan - лес daw (dûv) -
курдюк dawî - конец dawîyêda - в
конце daxistin - спускать daxwez
- желание, мечта daxwezname -
заявление dayîk - мать, мама
dem - пора, момент, время deng,
sewt - голос, звук (*грамм.*)
dengdêr- гласные dengdar -
согласные dengzanîn, zanîsta
denga - фонетика
derbdayîn, teqil - ударение
(*грамм.*)
derdan - емкость
derfet - возможность derman -
лекарство der-mank'ar -
фармацевт

D

dermanxane - аптека
dersdar- преподаватель, учитель
derûnî, psîkolojî - психология
despêk- начало dev - рот dew - айран
dewlet, komar - государство
dewlet, mal-h'al, hebûn - богатство
dêlegur - волчица dêm - лицо
dêr-монастырь, церковь
dêw - див, вес di bistan - школа dijî - против dijreyv, yan jî berovajîya xeberekê - антоним
dil - сердце
dilketî - любленный
dirav - деньги dîl - плен dîrok - история don, nexîçîray - масло, жир
dor-ber - вокруг
dotmam, qîzar - дочь дяди со стороны отца
doxtîrxane - поликлиника dûnik — кавычка
dûmeqesq - ласточка

E

elek - сито
eleqetî - связь, отношение emenî - старинный ковер endam, organ, neferê tiştêkî - член, орган
erênî - совершенный (положительное) eşkele - явный, очевидный

eşq, şabûn - радость evîn - любовь
evîndar - влюбленный
ezber-устный, наизусть

E'

e'det- обычай, традиция
e'firandin - творчество e'gît,
e'fat, qeh'raman, merxas - герой
e'lok - индюк
e'mir, jiyan, jin - жизнь e'nî - лоб
e'rş, e'rşê, ezmin - трон, небо
e'rd, ax-земля
e'vdal - бедный, нищий e'yan - известный, популярный
e'zîz-дорогой, милый e'zîng (dar) - дрова

Ê

êl - племя
êmîş - фрукты êriş - нападение
êtîm (sexîl)- сирота êş - боль
êvar- вечер

F

fars - перс
fater'eşk - слезинка felek - судьба, рок fem - сознание, разум ferman - приказ, указ
ferz-срочный, важный, обязательный
fetlonok - поворот

F

fêkî - плод, фрукт fêl (lêker) - глагол
 fêl (felbazî) - хитрость fêlbaz - хитрец
 fêlnîş - наречие fêlxwaz- дополнение
 fêrbûn: изучать fêz - верх
 findiq - лесной орех firaq - посуда
 firavîn - обед
 firinde, firoq - самолет firingeh -
 аэропорт firok - самолет
 formzanîn - морфология (*грамм.*)

G

да - бык
 gameş - буйвол garis - перловка gav -
 шаг gavan - пастух gavanoz -
 аквариум gazî - зов, призыв gazin -
 жалобы gebez - ярко-красный gede,
 zarok - мальчишка, ребенок genim -
 зерно gewrî - горло gewzik, tele -
 капкан gezgezk - крапива
 gêj, dîn, bê aqil - сумасшедший, не
 нормальный gêlaz - вишня gêzî -
 веник gilover, (girover) - круглый girav
 - остров girik - бугор

giring - важный, нужный gizêr-
 морковь gore - чулки, носки guh -
 ухо gulan - май guhestin -
 изменение gulî - коса (жен.
 волос) gurç'ik - почки gûz - орех

H

hacet-инструмент
 hale rast - именительный падеж
 (*грамм.*) havîn - лето
 hejar- бедный hejmar- номер
 helbest - стихотворение
 helbestvan - поэт hemwate, gotin
 û me'nawan wekhevin, nivîsar
 cûda - синоним hemtîp - омоним
 heqîqîyê - настоящий herêm -
 регион
 heval, hogir-товарищ, друг hevân
 - кожаная сумка hevîr -тесто
 hevirmûş -шелк hevnasî -
 знакомство
 hevok (cûmle) - предложение
 hevreyvîn - репортаж hevraz -
 подъем heyk'el - памятник
 heyk'elger' - скульптор hêdî -
 тихо, тише hêjîr - инжир hêlek'an
 - колыбель
 hêlan, hêlançûk - качели hênik,
 hewa henik - свежий,
 прохладный hêsa - легкий

Н

hêsîr — сироты, беженцы hêşîn - голубой hîlbijartin - выбор hinar-гранат hirî - шерсть hiş - мозг hoker, fêlnîş - наречие (*грамм.*) horî - русалка hurmî - груша

Н'

h'ebs, zindan - тюрьма h'edadxane - кузница, кузнечный цех h'ekîm, loxman - врач, лекарь h'el - положение h'elal - чистый, халал h'elandî - топленный h'emam - баня h'erî - грязь h'eyr - забота, хлопоты h'euf-жаль h'euyan - дорогой h'euyan - животное, скот h'ezîran - июнь

Î

îdare - учреждение, заведение, офис Нас - средство, выход из положения îlahî - бог, господь îlon - сентябрь îmtahan - экзамен îngilîsî - английский înk'ar-отрекаться, отрицать îşaret - знак îşiq (nûr, r'onahî) - свет îzbat - доказательство, подтверждение îzin - разрешение

Ј

jan - острая боль jar-худой jêr - низ, нижняя часть jimar-число, количество jin - женщина jîr — живой, энергичный jîyan, jîn, e'mîr - жизнь

К

ka - соломенная сечка, мякина kadîn - сеновал, где хранится соломенная сечка, сено, солома kal - старик kalbûn - старость kalemêr - старик, старый человек kanî - родник, источник kar, karik - козленок karî - гриб kavin¹ - двухгодовалый баран kavû - разрушенный keç, keçê, keçik - девочка kedxwarî - угнетение kelem - капуста kendav, kendal - залив kereng - колючка keştî- корабль kevnar - антиквариат, старина kevanok - скобка kezev - печень kêr - мало, немного kêr-нужный, годный kiras - рубашка k'irde, k'iryar (fêlker) - подлежащий K'itêbxane - библиотека

К

komar - республика, государство
 kovar - журнал
 kuç, hît, kevir- камень
 kulîlkdan - рассвело, цветшие
 kulîn - место на кухне, куня kundir -
 тыква
 kurçî, hesink'ar- кузнец
 kur'o, lolo, ого - парень (в
 разговорной речи)
 kurtedem - кратковременный kûçik -
 собака, щенок

К'

к'а - где?
 k'afir- неверующий, безбожник
 k'al - незрелый, неспелый
 к'аг- польза, выгода, прибыль k'arîbar-
 янтарь
 к'агк'ег- рабочий
 k'armend - работодатель k'arsaz -
 бизнесмен k'as - чаша
 k'aş - вес
 k'atib - секретарь k'aw - гордость
 k'axaz - бумага k'ed - труд
 k'eder - душевная боль
 k'elb - собака
 k'elefe - разрушенный дом
 k'elîme (bêje-gotin) - слова k'ewrîşk -
 заяц k'êlm - речь k'êr - нож
 k'êzik-жук, жучок
 k'omel - кружок
 k'ulfik (k'ulfika tendurê) - дымоход k'ursî
 - стул

L

lal - немой, немой человек laş,
 beden - тело
 lawê beyanî - иностранец layîq -
 достойный leker (fêl) - глагол ler -
 лапа
 letîf-красив, прелестный lewaş -
 тонкая лепешка leyilan - мираж
 lez-скорый, спешный lêv - губы
 lêyî - поток, наводнение, потоп lod
 - копна, стог, накапливать lorik -
 ребенок
 lûle - труба, дуло

M

ma, çima - почему mal - дом
 malbet- семья
 malhebûn-хозяйство, имущество
 malik-домик mam - дядя
 mamoste - учитель
 maqul - морально-нравственный
 mast - кислое молоко meh'k'eme -
 суд
 mex'ber - могила, кладбище
 meydan - площадь
 me'de - аппетит
 me'în - кобыла me'r, mar - змея
 mêlavan - водолаз mêlevanî kirin -
 плавать mêrg, çîman - луг (поляна)
 mêrxas - мужественный, храбрый
 mêvan - гость
 mêvandarî - гостеприимство
 mêvanxane - гостиница mêzayîn -
 женский род mêzîn - весы
 mijar - содержание (тема) mijûlî -
 занятость mil - рука
 mizgîn - благая весть mîfte - ключ

N

па - нет nalfînî (axîfînî) - стон name -
письмо naprêj - пекарь nas -
знакомый
nav - имя
naver'ok - содержание navçê, qeza
yan jî bajarok - область, регион,
городок navbir- перерыв
navder (îsîm) - имя существительное
navend - центр navnîş - список
nav û deng - знаменитый, известный
nazdar-кокетливый, капризный nazik
- нежный, тонкий nebawarî -
неверие, недоверие neh'î, qeza -
район ner'uh'ber - неодушевленное
newroz, sejna Newrozê - новый день,
праздник весны neyinî -
несовершенный, отрицательное
neynik (neynikê t'ilîya) - ногти Neynik
(e'yunik) - зеркало pêçîrvan - охотник
pêrzaûn - мужской род pêzik -
близкий nimêj - молитва niqte - точка
nişana pirsê - вопросительный знак
nivîskî - письменный nok - горох nîsk
- чечевица
nîşana behg - восклицательный знак
noşîsanbe - на здоровье nûçe -
новости

O

osax - очаг
ode - комната ol, dîn -
религия otonîm - омоним
once - клевер ordî - армия
orte - центр oghap - ватное
одеяло oghê - иноходь oxig -
благополучие

P

paç - поцелуй
paqij - чистить, расчищать
par - прошлый год
paş - зад, назад paşê - потом
paşîv - поздний ужин, ночная
еда во время рамадана
paşpirtik, paşkok, paşgir-
окончание, суффикс
paşwextî - последнее время
patik - затылок
payîz - осень penbû - хлопок
penîr-брынза pesn -
хвала, похвала, восхваление
pevgirêk - союзы, связь pêç'î
- палец
pêlik, pêpelûk-лестница
pênûs - ручка
pêsmat, pismat -
родственник
Pêşvan (pêşeng) - передовик
pêşgotin - предисловие
pêşîk'ar - руководитель
pêşîvan - гений pêşpirtik -
префикс

P

pêveber (fêlgotî), хебер-
сказуемое
pêvede - жалить pêwistî -
нужный piling - тигр pirs -
вопрос
pirtik-окончание, кусок
p'irtûk - книга
pispor-знаток, специалист
pişik-легкие pişt- спина
pî, pê, nig, ling - нога
pîrozbahî - поздравление
pîrtî - старость
pîvaz - лук рог - волос
porteqeş - апельсин roz -
нос
rûng - мята

P'

p'ale - рабочий
p'ag - часть, доля p'incar-
зелень p'îne - тряпка

Q

qasid -ганец, вестовой
qawin - дыня
qaz -гусь
qazanc -заработок
qazî -судья
qedir -уважение qelem -
карандаш qelew -жирный
qencî - доброта qertaf, pirtik
- приставка qewm-lêzim -
родственники qeyd -
кандалы qeysî (zerdele) -
урюк qeytan -шнур, лента
qîmet-цена, оценка

R

raman - мысль, раздумье
rasthatin - встреча
rawestgeh - станция, остановка ref -
стая
r'eng - цвет
r'engdêr (sifet) - имя прилагательное
gehpe - критика g'ewş - состояние
gê - дорога
rih'an - базилик
ristesazî - синтаксис
ronakbîr, - просветитель
rozgar, heyam, demsal - времена года
rû - лицо
rûnê h'elandî -топленое масло rûnê
nivîşk - сливочное масло rûpel -
страница rûvî - лиса
rûvîya kor - слепая кишка
rûvîyê meşîya - кишки

R'

fa - смиряться
fast - прямой, ровный, гладкий f azî -
согласие
fazîbûn - соглашение
fe'h'm - милость, милосердие
fesmî - официальный fez - плоды,
фрукты fezil - безобразный,
позорный fêber- руководитель fêbif -
бандит, разбойник fêz - ряд
rêziman - грамматика
f ojava - запад fojhilat- восток fojname
- газета fuh'ber - одушевленное fuh' -
душа

S

sabûn - мыло
sae't, demjmêr, seh'et, sie't - час,
часы sala t'eze - Новый год salname,
r'ojmêr - календарь sancû - коликы,
острые боли sar-холодный sarîne -
холодильник savar' - пшеничная
крупа sax - целый, живой, здоровый
saz - саз (струнный музыкальный
инструмент) sazband - музыкант
sebet - корзина sebir-терпение
sedsalî - столетие serbajar-столица
sergîn, qirş - трава serhatî, serpêhatî -
рассказ, повесть seresema харинê -
меню serî - голова sermil - плечо
sermîyan - руководитель рода
serxwebûn - независимость sewt,
deng - голос, звук (*грамм.*) sewtêd
bêdenganî - согласные буквы sewtêd
denganî - гласные буквы seyran -
прогулка seyrangeh - пикник se'w-
испуг, боязнь, страх sêfil - бедный
sêgoşe - треугольник sêl - форма для
выпечки хлеба sêlav - горный
бурный поток после дождя sêwî -
сирота sifir - ноль sifir - мед
silqok, îspanax - шпинат sîr- чеснок
sîvorî - белка
sorsorik - пищевод spartin -
упражнение sûk - базар

Ş

şa - радостный şagirt - ученик
şahnazî — гордость şaîr
(helbestvan) - поэт şam (dara
şamê) - сосна Şam (mûm) —
свеча Şam - Дамаск, столица
Сирии şano - театр şaneşîn -
балкон şarûg-соловей şaş -
раскосый, ошибочный şe -
расческа şe'ed - свидетель
şekir - сахар şemdan -
подсвечник, маяк şev - ночь
şeveq - утренняя заря şever'eş -
темная ночь şewl-newal —
ущелье şêr- лев şêwr - совет
şêwrdağ - советник şimik-
тапочки şirovekirin - объяснение
şîn, heşîn (r'eng) - голубой цвет
şîn - горе şîr- молоко şîret-
совет, воспитание, назидание
şîrê xav - не кипяченное молоко
şîrê xêç - парное молоко

T

ta - нитка
tamzîv, zîv - серебро
taştî, taştê, xarina sivê - завтрак
tav, r'oç, şems - солнце taybetî-
особенно tenî - сажа

T

tewle - коровник, сарай
teyr - крупная птица, орел
teyrê sîmir - сказочная птица,
Симург teyrok - град te'jî - гончая
собака
te't - плита, плоский камень
têderxistinok - загадка
têker - дополнение
tirî - виноград
tivir - редька
tî, tîyê bûkê - брат мужа
tîr - буква
tîr- стрела
to, toê şîr, toê qatix - сливки tomast
- кислое молоко tûrik-труба,
торбочка, пакет

T'

t'a - малярия (тиф) t'ab - терпение
t'abût- гроб falan - грабеж, разбой
t'as - миска
fac - корона
t'aqet-сила, мощь
f eбах - август
tebîyet, хweza - природа
t'ek'oşîn - борьба t'elik - ловушка
telîm-t ore - учебное - воспитание
temam - целый, полный
tembel - лентяй, лодырь temsil -
басня terazi, mêzin - весы t'eref -
сторона teze - новый tiren - поезд

U

ulm - наука ulimdar-ученный ulmî -
научный unda - терять undabûn -
потеря usa-так
uzv - член

V

vala - пустой, свободный
Vala kirin - высыпание, выливание
varik - цыпленок, курочка veqer -
возвращение, возврат vedan -
копать vexwarin - пить, выпивать
veçêkirin - перестройка vêxist -
зажигать vêderê - здесь, тут vir —
здесь

W

war - место занимаемое на кочевке
жителями одного села wekehevûn
-уравнивание wek'îl -
представитель welat-родина,
отчизна, отчество werdek -утка
welatp'arêz - патриот werger-
перевод weten, - см. *welat wext*, *çax*
- время wextê berê - прошедшее
время wextê naha - настоящее
время wextê wê bê - будущее
время weşanxane - издательство
wezir - министр wezîret -
министерство we'de -время wêje -
литература wênekêş - художник
wêran -разоренный, разрушенный

Х

xal - родинка, родимое пятно
xalî - чистая
xalîçe - ковер
xaltî, xatî - тетя (по материнской линии)
хат - новь, новичок, целина
xanim - госпожа
xarinxane - кафе, столовая, ресторан
xas - отборный, лучший
xav - сырой, не вареный
xebat - работа
heber, peyv, gilî - слово
xezd - обида
xeysset, taybetmendî - характер
xeyssetnav - имя прилагательное
hez, xêzik - тире
xeza - уничтожение
hezal - олень
hezine - сокровище, клад
xêr- поминки
xêr (k'ar û şuxulê xêr) - добро
xêrxwaz - доброжелатель
xîyar - огурец
xizm - родственник
hort - парень
xurme - хурма
xurt-сильный
xwendek'ar- студент, учащийся
xwendevan - см. xwendek'ar
xweşik - красивое
xwestek - желание

Ү

ya bext - на счастье, на авось
yanzdeh - одиннадцать
yar - возлюбленный
yekanî, yekem - единица, единственный
yekbang - односложный, состоящий
из одного слога

yekbûn- объединение,
единение
yekcûre - однородный
yekdeng - единоголасный
yekser - сразу, разом
yekti - единство
yeman - отчаянный, смелый

Z

zabit - офицер
zalim - насильник, пират
zanyar-ученный
zar - говор, наречие
zarav - диалект
zargotin - устное творчество
zar'-zêrç - ребенок
zava - зять
zeh'metk'êş, k'edk'ar-
трудящийся, труженик
zeman - время
zengîn, dewlemend - богатый
zerdele - персик, абрикос
zerî - девушка, невестка
zeveş, zebeş - арбуз
zevî - зерновое поле,
урожайное поле
zeytûn - маслина, олива
zêde - лишний
zên - память
zêr' - золото
ziman - язык
zimanê k'urdî - курдский язык
zimanzan - языковед
zimanzanî - языковедение,
языкознание
zivistan - зима
zor - сила
zozan - пастбище

Nav û nîşanên cawkanîd ku me jê qinyat hildanê
(Список использованной литературы)

1. Balî Awê. Alfabe ya k'urdî.- "K'omk'ar".- 1982. (kurmançî).
2. Balî A. Kürtçe dilbilgisi. (Rêzimana k'urdî).- Alan yayıncılık.-1992 (birinçî baskı).
3. Balî A. Kürt atalar sözü.-1988.
4. Qanatê K'urdo. Zimanê K'urdî (rêziman). K'têba dersê bona k'omêd 3-4 a. Lûys. Yerevan. 1979.
5. Qanatê K'urdo. Tarîxa edebiyeta k'urdî. K'itêba I-ê, Stokholm. 1983. Ya duda. Stokholm- 1985.
6. Bavê Nazê. Rêzimana zimanê k'urdî (zaravê kurmançî).- Ji bo sinifê III- VIII-an,- Weşanên "Axîna welat".- Moskova. 1996.
7. Kamûran Bedirxan. Kolay Kürtçe (ikinci baskı), 1994, İstanbul.
8. Wezîrê Nadiri. Zimannama kurmançî. -Yêrêvan. 1947.
9. Amed Tigris, Nasir Rezazî, Fahad Gardawan. Coğrafya K'urdistanê (ji bo pêngava navîn û bilind). Stokholm, 1993.
10. Amed Tîgrîs, B. Weltevîn. Kurterastî (ji bo cogratyaê). Stokholm. -1991.
11. Mîroê Esed. Qaçaxê Mirad. Lîtêratûra wetenîê. (Bona dersxanêd VII-VIII. Neşîreta "Lûys".-Yêrêvan. 1996.
12. Hogir E'h'med. Gülistana zarokan. Hejmar 2. max str.50-52, 5300 Bonn1/BDR.
13. Nûrettin K'aracadag. Zimanê K'urdî. Doguş matbacılık ve Tic.1991.
14. Ordîxanê Celîl. Mesele û metelokê cimae'ta k'urda. -Yêrêvan. 1969.
15. Ordîxanê Celîl. Zimanê k'urdî. Bona dersxana IV-a. Yêrêvan. 1969.
16. Emînê E'vdal. K'itêba zimanê k'urdî. Bona dersxana IV. Yêrêvan, 1960.
17. Zimanê dê (k'itêba xwendinê) - Yêrêvan.-1955.
18. K'itêba zimanê k'urmançî. (bona dersxana VII-a). -Yêrêvan. -Haypêthirat. -1937.
19. K'itêba edebîyata xwendinê. (bona dersxana V-VI -a). -Yêrêvan. Haypêthirat. -1961.
20. Nadiri W. Weten û h'ezkirin. -Yêrêvan. Hayastan, 1961.
21. Casimê Celîl. Lîtêratûra. Bona dersxana 5-6). "Lûys". Yêrêvan. 1985.
22. H. Cindî, E.E'vdal. Folklor kurmanca.-Yêrêvan. -1936.
23. E'.Şemîlov/E'rebê Şemo/. Bervok. -Yêrêvan. Hayastan. -1969.
24. Cewarî Nûrê. K'îlamê cimae'ta k'urda. -Yêrêvan-Heypethirat, 1960.
25. Melayê Cizirî. Dîwan. "R'oja nû". Stokholm, 1987.
26. E. Xemgîn. İslamiyetten Osmanlılara kadar Kürdistan tarihi. 1 .cilt, 1 ,baskı.-1989.
27. Mehmet Hengirmen. Türkçe öğreniyoruz I.II.III. IV.V.VI. Türkisch Aktiv, Ankara, 1998.
28. Nivîsk'arê k'urdaye sovêtîê. Hazirkir: Casimê Celîl. Yêrêvan, 1957.
29. M. Emîn Bozarslan. Alfaba. Çapa sisyan, Uppsala-Şwêd. 1988.
30. Seîdê Nûrsî. Peyvên biçuk, Nubihar, İstanbul. 1992.
31. E'îfê E'vdilr'eh'man. Hesreta min". Yêrêvan, 1983.
32. Şikoê H'esen. P'erwaza weten. Yerevan, 1977.
33. Türkiye Türkçesi. (hazırlayanlar: C.Şafak, G.Kayhan, L.Batı, N.Albay) 1. baskı. Ankara, 1999.
34. "Nûbar" (kovar) № 1. Almati, (06) 2005.
35. Şamîl Esgerov. Ferhenga K'urdî-azerbaycanî, Azerbaycanî-k'urdî. Bakû, 1999.

36. Ладыженская А.Т. Детская риторика (Программы для общеобразовательных учреждений: начальные классы (1-4)).- Москва, Просвещение.- 1998.
37. Бондаренко А.А., Гуркова И.В. Учимся говорить правильно. Новосибирск, 1993.
38. Горелов И.Н., Житников В.Ф. Умеете ли Вы общаться. Москва, 1991.
39. Новоторцева Н.В. Развитие речи детей. (Популярное пособие для родителей и педагогов).- Ярославль, - 1997.
40. Кедайтене Е.И.. Курдистан Мукриани. В.И.Митрохина. Учебный русско-курдский, (словарь для изучающих русский язык). Москва, Русский язык. -1977.
41. Ядоллах Самарех Ф.Д. Учебник по персидскому языку, книга 1 .изд. «Алхудо», 2004 г.
42. Синицын В.А. Путь к слову (пособие по развитию речи). Москва, 1996.
43. Узорова О.В. Нефедова Е.А. Практическое пособие по развитию речи. -Москва, 1997.
44. Джамил Джалил. Курдские народные песни и инструментальные мелодии. Москва, 1986.
45. Садыкова Р.К. Парыша- Казахша, Казахша- Парыша. Тілаша. Алматы. -2005.
46. Кунакова К.У., ИсаковаЗ.Ж., Кадырбаева Р.А.. Русская речь, для 7 класса. Алматы.-2000.
47. Ахмед Хани. Мам и Зин. Москва, 1962.
48. Руденко М.Б. Курдская обрядовая поэзия, Москва, «Наука», 1982.
49. Бакаев Ч.Х. Роль языковых контактов в развитии языка курдов СССР. Москва, «Наука», 1977.
50. Цукерман И.И. Очерк курдской грамматики. Москва, 1962.
51. Цаболев Л.Р. Очерк исторической грамматики. Москва, 1962
52. Мирзоев К.И.. Курды малая энциклопедия. Алматы, 2001.
53. Абай Кунанбаев. Книга слов. Алматы, 1992.
54. Надиров Н.К. Мы, Курды казахстанцы. Алматы, 2003.
55. История Курдистана. М.С.Лазарев, Ш.Х. Мгои, Е.И.Васильева, М.А.Гасратян, О.И. Жигалина. Москва, 1994.
56. Шамилов А.Ш. Латинизация курдского алфавита. «Заря Востока», 1929, №1928.
57. Курдско-русский словарь (составитель Ч.Х.Бакаев). Москва, 1957.

Naverok

Pêşgotin.....	3
Предисловие	6
Hîmnê Komara Qazaxistanêye Dewletê.....	9
Qazaxistan welatê meye	10
Alfaba k'urdî.....	11
Nivîsandina tîpan.....	12
Ev şiklên hanê çîne	14
Em dinivîsin û dixûnin.....	15
Dengzanîn (Sewtzanistî, fonêtîka).....	20
K'oma sewtan	21
Bang (k'irde, hêca)	26
Derbdayîn (teqil).....	27
R'ojen h'eftê bi k'urdî.....	28
Navên meha	29
Rozgarên (heyamên, demsal) salê.....	30
Ber (qulbe) bi zimanê dê	31
Dersdarê min	32
K'urdên Girgizistanê	33
Morfologîya (formzanîn)	34
Pêşpirtikên çêkirina xeberan (pirêfîks)	35
R'eng bi zimanê dê.....	36
K'îlamê zarokan	37
Navdêr (îsim)	38
Li dersa zimanê k'urdî	39
Fatê û T'êmir	41
Li baxçê kulîlka	42
Li ber t'êlêvîzyonê.....	43
Cîsê (zayenda) navdêran	44
Formên h'alê navan.....	47
H'alê tewandî (tewangî-civane)	48
H'alê cî-war (lokatîf).....	49
Malbeta me.....	50
Ez xwendek'arim	51
Xidirnevi	53
Gotinên hemtîp (omonîm).....	54
Gotinên wekhev (sînonîm).....	54
Gotinên dijraber (antonîm).....	55
Cînav (pronav).....	56
Cînavên k'esan.....	57
Du heval	60
Zivistan	63
Dilê dayîkê.....	64
K'îlamên govendê	65
Cixare merivan dikuje	67
Cînavkên nîşanî.....	68
Name	71
3- Cînavkên pirsîyarî.....	72
4- Cînavkên nebinavkirî.....	74
5- Cînavkên eleqetîyê	75

Hoker (zerf).....	76
Almati.....	77
R'asthatin.....	80
E'îf û Fatê fêkîyan dik'irin	81
Kur'ê bêxiret	82
Pirs û bersiv.....	85
Ez û t'ebîyet.....	86
Bernav (edat).....	87
Hevaltîya gur, r'ûvî û hirçê.....	88
K'esera teyr	90
R'engdêr (xeysetnav, sifet).....	92
R'ewşa jina k'urd	95
Çend mijûlîji boy xandin û rastnivîsarê	97
Xwestek yek, ziman cuda	98
Weten	99
H'ezkirina çivîkan.....	100
Rast nivîsîna jimarên	101
Hevnasî	102
Sae't	103
K'urdistan	104
Lêker (Fêl), Cûreyê lêkeran.....	105
Mar û r'uvî	106
Fikra zanyara derheqa çand û dîroka k'urdada	108
Îskender û Dîyogên	111
Bûk û stûn.....	112
Zir'a k'erê, lota devê Cegerxwîn	114
Heqî wunda nabel!	115
Mester.....	116
Xeberdana pê têtêfonê	117
Mijulîyê cimae'tê	118
Çarin	119
Forma daxwaznamê (erze)	121
Çemê gundê me	122
Hevalê min tê mala me mêvanî	125
Min Newroz çawa nas kir	127
Kulîlka min	128
Dîk, keresû (reşêlek), werdek û r'ûvî	130
Diz û melle.....	131
Ha gulgulî, gulgulî.....	133
Hevala min ji min xeyidî.....	134
Hevok	135
Hevoka navdêrî (nav)	137
Hevoka lêkerî (fêl)	137
Rast û çewt	138
Xwendina ji dersxanê der	139
Bizin û karikê wê.....	145
Ferhengoka peyvên rêzmanîyê	150
Ferhengok (k'urdî-rusî).....	152
Nav û nîşanên cawkanîdê ku me jê qinyat hildanê	164

К.И. МИРЗОЕВ

ZIMANÊ K'URDÎ

Редактор Гасане Хаджисулейман

Сдано в печать с готовых диапозитивов 14.08.2006 г. Подписано в печать 21.08.2006 г. Гарнитура "Arial". Формат 70x100¹/₁₆, Печать офсетная. Усл печ. л. 10. Уч. изд. л. 10. Тираж 2000 экз. Заказ N 705

Издательство "Сөздік-Словарь" Республики Казахстан, 480124, г. Алматы, пр. Гагарина 83, тел: 77-68-51,42-09-26

ТОО «Типография оперативной печати»,
480016, г. Алматы, ул. Д. Кунаева, 15/1.

ISBN 9965-409-94-3

9 789965 09943

Knyazê İbrahim Mîrzoyêv yekê gulanê, sala 1947'a li Ermenistanê ji diya xwe bûye. Di ûnîvêrsîtêya Yêrêvanêda xwendina bilind standîye. Ser dîrok, ziman, e'debîyat û çanda k'urda gelek lêk'olîn kirîye, k'îjan usa jî bûne t'êzê wîye doktorîyê.

Sala 1978-a bûye doçent, sala 1988-a bi mijara (têma) "Têk'îlîyê e'debîyata k'urdaye navnetewî" xebata doktorîye nivîsandîye û navê doktotê ulmê filologîyê standîye. Sala 1989-a ew bûye profesor.

Di salêd cuda-cudada p'irtûk û berhemên wîye zanîstî: "Ji dîroka tek'îlîyê e'debîyata k'urda û azerîyan", "E'debîyatên netewî û tek'îlîyên edebî", "Asoyê (horîzont) e'debîyatê" (derheqa pêşdaçûyîn û dewlemendiya e'debîyata k'urdîda), "P'ira biratîyê", "Bext û qedera e'debîyata k'urdaye dîrokîyê", "K'urd: ênsîklopêdîya piçûk" (*bi ûrisî, îngilîzî, qazaxî, holandî*), "K'urdê Qazaxistanê", "E'debîyata k'urda" û yêd din çap bûne. Xencî k'îtêbê ulmî, ew usa jî xebata e'frandarîyê dike, helbest, serhatî û çîrokan dinivîse, k'arê wergerê dike. Ji sala 1985-a endamê yekîtiya nivîsk'arên Sovyêta berê, ji sala 1991'ê virva endamê yekîtiya nivîsk'arên Qazaxistanê û ji 2005-ê salêda endamê PEN-a Kurd-a navnetewîyê. Salêd 1984-1990-î bûye amedek'arê k'ovara "Edebîyata Ermenistanê", serokê p'ara e'debîyata Azerbaycanêye rex yekîtiya nivîsk'arê Ermenistanê. Ji sala 1992'anda amadek'arê kovara "K'urd"e, (paşwextîyê "Nûbar"), ku h'etanî naha bi k'urdî, ûrisî û qazaxî li Almatê dertê.

Knyazê İbrahim di ûnîvêrsîtêya Qazaxistanêye dewletîye ser navê Abayda serokê Navenda Zimanê cîhanêye. Akademîkê Akadêmîya Ulmîye Xwendina Bilînde Navnetewîye. Ji sala 2003'da prêzîdêntê Yekîtiya K'urdên Qazaxistanêye "Berbang"e. Mamoste 30 salî zêdetire, ku di ûnîvêrsîtêyê cuda-cudada k'ar dike. Di dereca dersdayîna ziman û e'debîyata k'urdada, ya rojhilatêda gelek p'irtûk u bernamê dersan hazir kirîye, k'îjan îro jî wek k'îtêbên dersan têne qebûlkinên. Knyazê İbrahim cara yekemîn li Qazaxistanê û Asîya Navînda "K'îtêba zimanê k'urdî", "Bernamê û mêtodîka hînbûna zimanê k'urdî" ji bo dersxanên II-V-a, VI-IX-a nivîsîye, k'îjan bexşîşne mezinin ji boy zarok û xwendek'arên me. Ew k'eda mamosteye p'irsalene û berhema tecrubê wîye pêdagogîyê. Ji ber van xebatê wîye mezin, ya di milê zanyarî û civakîyêda ew ji alîyê serokkomarê Qazaxistanê bi Ordêna "**Kûrmê**" (Şeref) hatîye rewakirinê.